T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Adem BALTA

# KÜRTÇE HABER YAZIM VE TEKNİKLERİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ-2017

**T.C.**
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Adem BALTA**

# KÜRTÇE HABER YAZIM VE TEKNİKLERİ

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ YÖNETİCİSİ**
**Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ**

**MUŞ-2017**

**K.T.**
**ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN**
**ENSTÎTÛYA ZANISTÊN CIVAKÎ**
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Adem BALTA**

# RÊ Û RÊBAZÊN NIVÎSANDINA NÛÇEYÊN KURDÎ

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊVEBIRÊ TEZÊ**
**Alk. Doç. Dr. Canser KARDAŞ**

**MÛŞ-2017**

**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum "Kürtçe Haber Yazım Ve Teknikleri" adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

☐ Tezimin/Raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

☐ Tezim/Raporum sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

☒ Tezimin/Raporumun …3… yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

**24/03/2017**

**Adem BALTA**

## TEZ KABUL TUTANAĞI

## SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ danışmanlığında, Adem BALTA tarafından hazırlanan bu çalışma .../.../2017 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

| | | |
|---|---|---|
| Başkan | :Yrd. Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU | İmza: ..................... |
| Jüri Üyesi | : Yrd. Doç. Dr. İ. Sami YUCA | İmza: ..................... |
| Jüri Üyesi | : Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ | İmza: ..................... |

# NAVEROK


**NAVEROK** .......... **I**

**KURTE** .......... **V**

**ÖZET** .......... **VI**

**ABSTRACT** .......... **VII**

**KURTEBÊJE** .......... **IX**

**PÊŞGOTIN** .......... **X**

**DESTPÊK** .......... **1**

**BEŞA YEKEMÎN**

**RAGIHANDIN Û NÛÇE**

**1.1. RAGIHANDIN** .......... 8

1.1.1. Ragihandina Devkî .......... 9

1.1.2. Ragihandina Nivîskî .......... 9

1.1.3. Ragihandina ne Devkî û ne jî Nivîskî .......... 9

1.1.4. Ragihandina Rûbirû û Biamûran .......... 10

**1.2. NÛÇEGIHAN Û NÛÇE** .......... 10

1.2.1. Nûçegihan Kî ye? .......... 10

1.2.2. Nûçe Çi ye? .......... 12

**1.3. NIRXA NÛÇEYÊ Û HÊMANÊN NIRXA NÛÇEYÊ** .......... 13

1.3.1. Hêmana Demî .......... 13

1.3.2. Dûrbûn û Nêzikbûn .......... 14

1.3.3. Girîngî .......... 15

1.3.4. Encam û Balkêşî .......... 15

**1.4. LI GOR NAVEROKÊ CÛREYÊN NÛÇEYAN** .......... 15

1.4.1. Nûçeyên Partiyên Siyasî .......... 16

1.4.2. Nûçeyên Aboriyê ........ 17
1.4.3. Nûçeyên Polîs û Dadgehê ........ 18
1.4.4. Nûçeyên Derve ........ 19
1.4.5. Nûçeyên Dîplomasiyê ........ 20
1.4.6. Nûçeyên Perwerdehiyê ........ 21
1.4.7. Nûçeyên Tenduristiyê ........ 22
1.4.8. Nûçeyên Herêmî ........ 24
1.4.9. Nûçeyên Werzîşê ........ 25
1.4.10. Nûçeyên Çand û Hunerê ........ 26
1.4.11. Nûçeyên Magazînê ........ 27
1.4.12. Nûçeyên Hawirdorê ........ 28
1.4.13. Nûçeyên Teknolojî û Vejenê ........ 30

**BEŞA DUYEMÎN**

**SERNAV Û BERHEVKIRINA NÛÇEYAN**

**2.1. DI NÛÇEYAN DE BIKARANÎNA SERNAVAN**

2.1.1. Sernavê Sereke ........ 33
2.1.2. Jorsernav ........ 33
2.1.3. Jêrsernav ........ 33
2.1.4. Sernavê Spot ........ 33
2.1.5. Navsernav ........ 33

**2.2. BERHEVKIRINA NÛÇEYAN** ........ 34

2.2.1. Hilbijartin ........ 34
2.2.2. Lêkolîn ........ 35
2.2.3. Jinûve Hilbijartin ........ 35
2.2.4. Vebijartin ........ 35

2.2.5. Danîna Nûçeyê ............ 36

2.2.6. Weşandin ............ 36

**2.3. DI NÛÇEYAN DE ÇAVKANÎ** ............ 36

**BEŞA SÊYEMÎN**

**BIKARANÎNA DEMÊ Û RÊZIKÊN NÛÇEYAN**

**3.1. DI NÛÇEYAN DE BIKARANÎNA DEMÊ** ............ 39

3.1.1. Di Nûçeyên Tirkî de Dem ............ 39

3.1.2. Di Nûçeyên Îngîlîzî de Dem ............ 40

3.1.3. Di Nûçeyên Frensî de Bikaranîna Demê ............ 41

3.1.4. Di Nûçeyên Kurdî de Bikaranîna Demê û Hin Xeletî ............ 43

**3.2. RÊZIKÊN NIVÎSANDINA NÛÇEYAN** ............ 48

3.2.1. Teknîka Pîramîta Vajî ............ 48

3.2.2. Teknîka Pîramîta Rast ............ 50

3.2.3. Teknîka Çarkoşe ............ 52

**3.3. DI NÛÇEYAN DE GIRÎNGIYA BEKRAUNDÊ** ............ 58

**3.4. RÊBAZA 3 Ç 3 Kyê** ............ 61

**BEŞA ÇAREMÎN**

**4.1. LÊKERÊN NÛÇEYAN** ............ 63

4.1.1. Di Nûçeyan de Tebatî ............ 71

**4.2. DI NÛÇEYAN DE BIKARANÎNA HEJMAR, DÎROK Û SAETAN** ............ 72

**4.3. DI NÛÇEYAN DE STANDARDÎZEKIRINA ZIMAN Û PEYVAN** ............ 73

**4.4. JI NÛÇEYAN HIN MÎNAK** ............ 76

**ENCAM Û PÊŞNIYARÎ** ............ 80

**ÇAVKANÎ** ............ 82

**KURTEJIYAN** .......................................................................................................... **88**

**ÖZGEÇMİŞ**............................................................................................................ **89**

**KURTE**

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊ Û RÊBAZÊN NIVÎSANDINA NÛÇEYÊN KURDÎ**

**BALTA, Adem**

**Şêwirmend: Alk. Doç. Dr. Canser KARDAŞ**

**2017, 88 Rûpel**

Her çiqas ku nûçegihanî roj bi roj pêş ve dikeve, li gorî beşên din ên zanistî qadeke nû be jî bi ligel vê yekê di her warê jiyanê de çi bazirganî dibe, çi teknolojî çi ji aliyê sermayeyê û çi jî ji aliyê kesên gihîştî yên di vî warî de sektora herî biha û bimaliyet e. Pêşveçûyîna teknolojiyê, berbelavbûn û veguherîna tor û amûrên ragihandina girseyî rasterast tesîrê li xwegihandina nûçeyan û pêvajoya veguhezînê dikin. Di vê heyama bilez a ragihandinê de ku berberî jî zêde ye, rastnivîsa nûçeyan û nivîsîna wan a li gorî rêbazên gerdûnî gelekî girîng e.

Îro di serî de li Tirkiye, Iraq, Îran û Sûriyeyê dema di çarçoveya geşedanên siyasî de li bûyeran bê nêrin, wê bê dîtin ku Kurdî di her warê jiyanê de ye û piranî jî ev di qada medyayê de berbiçav e. Lewra ev geşedan û bûyer bi riya torên çapemeniyê tên ragihandin. Di van salên dawîn de li erdnîgariya Kurdan rêjeya televîzyon û rojnameyên bi Kurdî gelekî zêde bûye û li ser vê yekê tê sekinîn. Ev yek jî qîmeta xebatên li ser vê qadê zêde dike û dibe wesîle ku zêdetir bal bê kişand ser ragihandina Kurdî. Her çiqas li ser, nûçegihanî û medyayê zêde xebatên bi Kurdî nehatibin kirin jî him di nav Kurdan de him jî di bazara navneteweyî de bicihbûn û belavbûna vê sektorê dê bi awayekî xwezayî tesîrê li xebatên ku dê bên kirin jî bike.

Di vê xebatê de ji bo ku ji nûçegihaniya zaravayê kurmanciya Kurdî re çarçoveyeke gerdûnî û rêbazên zanistî bê danîn û jê re yekgirtîbûneke diyarkirî were pêkanîn, di asta têgehî de nûçe û rê û rêbazên nûçeyan hatine lêkolînkirin. Di bin sernavên bingehîn ên wekî ragihandin, cureyên ragihandinê, rojname û rojnameger, li gorî naverokê cureyên nûçeyan, cureyên sernavên nûçeyan, rê û rêbazên nivîsîna nûçeyan, pêvajoya berhevkirina nûçeyan de rê û rêbazên nivîsîna nûçeyên Kurdî hatiye nirxandin û lêkolînkirin. Di vê xebatê de hem bi mînakan rêbazên rastnivîsîna nûçeyan hatiye vegotin hem nûçeyên hin saziyên çapemenî û weşanê jî hatine analîzkirin.

**Peyvên Sereke:** Nûçe, Medya, Nûçegihanî, Rojnamegerî, Rojnamegeriya Kurdî

# ÖZET


**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**KÜRTÇE HABER YAZIM VE TEKNİKLERİ**

**Adem BALTA**

**Tez Danışmanı: Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ**

**2017, 88 Sayfa**

Diğer bilim dallarına göre daha genç olan, buna mukabil hayatın her alanında hem ticari, hem teknolojik hem de sermaye ve yetişmiş eleman açısından en pahalı sektörler arasında yer alan habercilik üzerindeki çalışmalar gelişerek devam etmektedir. Teknolojinin gelişmesi, kitle iletişim araçlarının başdöndürücü hızı ve dönüşümü haber alma ve bunu kitlelere aktarma sürecini de doğrudan etkilemektedir. Bu hız ve rekabet koşulları içerisinde haberin doğru yazımı ve mesleki kriterlere uyumu da son derece önemlidir. Bugün Türkiye, Irak, İran, Suriye başta olmak üzere gelişen siyasi olaylara bağlı olarak Kürtçe, hayatın her alanına girmekte ve bu akış en hızlı şekilde medya kanalıyla sağlanmaktadır.

Son yıllarda Kürtlerin yaşadığı coğrafyalarda ana dillerinde televizyon ve gazete çıkarması ve medya alanına ağırlık vermesi Kürtçe habercilik üzerine yapılan çalışmaları daha da önemli hale getirmektedir. Gazetecilik, habercilik ve medya üzerinde Kürtçe yapılan çalışmaların sayısı çok az olsa da, sektörün hem Kürtler içinde hem de uluslararası alandaki pazarda kendine bir yer edinme sürecine girmesi, doğal olarak bu alanda yapılacak araştırmaları da etkileyecektir. Bu çalışmada da Kürtçenin Kurmanci Lehçesi ile yapılan haberciliğin bilimsel kriterlere uyumunun sağlanması ve belli bir standarta oturtulması açısından kavramsal düzeyde haber ve haber yazım teknikleri incelenmiştir. İletişim, iletişim çeşitleri, gazete ve gazeteci tanımı, içeriğine göre haber çeşitleri, haber başlık çeşitleri, haber yazım teknikleri, haber toplama süreci gibi temel başlıklar altında Kürtçe haber yazım ve teknikleri ele alınmıştır.

Örneklerle doğru haber yazma kurallarının anlatıldığı bu çalışmada çeşitli basın yayın kuruluşlarından aktarılan haberler de analiz edilmiştir.



**Anahtar Kelimeler**: Haber, Medya, Habercilik, Gazetecilik, Kürtçe Habercilik

# ABSTRACT

## MASTER'S THESİS

## KURDISH NEWS WRITING AND TECHNIQUES

**Adem BALTA**

**Advisor: Assistant Professor Canser KARDAŞ**

**2017, Pages: 88**

Journalism is one of the most expensive sectors in terms of its commercial and technological aspects, and the capital and trained employees it needs. Although it is younger when compared to other scientific branches, journalism sees numerous studies worldwide. Advancement of technology and amazing speed of mass media directly influence news taking process and conveying the information to public. It is also important to write a proper news report and abide by occupational standards in an environment where speed and competition are highlighted.

Today, Kurdish language has become part of life, based on political developments in countries such as Turkey, Iraq, Iran and Syria, and has profoundly been used in media.

In recent years, Kurds have opened TV channels and published newspapers in their language, which make researches on journalism in Kurdish language more important. There are few Kurdish researches on journalism, reporting and media, but the sector will enter into a process of acquiring a place in the market within the Kurds and international arena, and it will naturally affect the researches that will be carried out in this field.

In this research, news and news writing techniques are studied at a conceptual level to ensure compliance of journalism in Kurdish language's Kurmanji dialect with scientific criteria and to put it in a particular standard.

Kurdish news writing and techniques are covered under main titles such as communication, types of communication, definition of newspaper and journalist, types of news according to content, news title types, news writing techniques, and news gathering process.

In this study, which explains the rules of writing the proper news with examples, news from various media has also been analyzed.

**Key Words:** News, Media, Reporting, Journalism, Kurdish Journalism

## KURTEBÊJE

| | | |
|---|---|---|
| b.n.b. | : | Berhema Navborî |
| b.n.r. | : | Binêrin |
| Dr. | : | Doktor |
| g.n.b. | : | Gotora Navborî |
| hwd | : | Her Wekî Din |
| r. | : | Rûpel |
| s. | : | Sayfa |

# PÊŞGOTIN

Dema mirov bala xwe dide qada rojnamegeriya Kurdî û xebatên ku bi Kurdî hatine kirin, dibîne ku rêjeya wan gelekî kêm e mixabin, bi taybetî jî di warê ragihandinê de ev yek berbiçav e. Helbet gelek sedemên vê hene, lê li gorî min, a herî girîng di zanîngehan de tunebûna beşên ragihandinê yên bi Kurdî ye. Dema hal ev hal be peydakarina zanyariyan, dîtina mînakan an jî bi awayekî lihevkirî zanîna hin têgehên derbarê nûçegihaniya Kurdî de jî ew çend zor û zehmet dibe. Loma destpêkirina xebateke wiha ku hêj tu mînakên wê yên bi vî awayî tune ne, wê di vî warî de bibe çavkaniyek. Bi rastî qet ne hêsan bû. Lê dîsa jî min xwest ez mijareke wiha hilbijêrim û ji bilî ku bibe qedandina mastirê di heman demê de bibe xizmetek ji bo qada nûçegihaniya Kurdî.

Di vê xebatê de ji ber ku em li ser standardîzasyonê jî sekinîn, me di metnên ku wek çavkanî bi kar anîn de him ji aliyê nivîsê him jî ji aliyê wateyê ve hin guhertin kirin. Apostrofên hin kurtebêjeyên di metnan de hatin rakirin. Her wiha ji bo ku di nivîsîna daçekan de yekdengî û standardîzasyonek pêk were daçekên ku wek “di/da”yê hatine nivîsîn wek “di/de”yê hatin guhertin. Mijareke din jî nivîsîna kurtebêjeya “DAIŞ, DEAŞ an jî İŞİT”ê ye ku bi taybetî di Çapemeniya Kurdî gelek varyantên wê hene. Ji ber heman hincetên li jor me ew kurtebêje jî wek “DAIŞ”ê verast kir.

Di amadekirina xebateke wiha bimeşaqet de di serî de mamosteyê min ê ezîz Alk. Doç. Dr. Canser KARDAŞ ku bi rastî ji mamosteyekî wêdetir ji min re wekî dostekî bû, di danîna çarçoveya xebateke wiha de ji nêz ve bi min re eleqedar bû û di her şert û mercî de alîkariya min kir. Ev yek cihê rêzê ye û ez sipasiya wî dikim. Mamoste Prof. Dr. Abdullah KIRAN di warê têgeh û termên nûçegihaniyê de gelekî alîkarî da min. Ji bo eleqe, hewl û xîreta wî ez gelekî sipasiya wî dikim. Dîsa ez sipasiya mamoste Ramazan PERTEV dikim ku bi nirxandin û diyarkirina çavkaniyan gelekî ji min re bû alîkar. Herwiha ez spasiya hemû mamosteyên xwe yên din û dost û hevalan dikim ku ew jî çi di warê çavkanî û nivîsan de be çi jî bi awayekî manevî her li bal min bûn. Dîsa ez sipasiya Ramazan BADEM dikim ku di warê redaksiyonê de ji min re bû alîkar. Bi teşvîqkirina hemû dost û hewalan, rê û rêbaza nûçeyên Kurdî cara yekemîn li Tirkiyeyê di zanîngehekê de bû mijara tezekê û ji ber vê jî ez pir dilşadim.

**Muş – 2017** **Adem BALTA**

**DESTPÊK**

Xebatên rojnamegeriyê ji aliyê Romayiyan ve di BZ sala 59an de bi nivîsên “Akta Diyara”yê dest pê kirin û ji bo nûçeyên rojane derxistin. Ji bilî wan Çîniyan jî di hezarsala yekemîn de ji bo ku karmendan ji giştinameyên serayê ahgahdar bikin wek rojnameyan weşan dikirin.

Li rojava bi wateya îro çapemeniyê, di sedsalên XII û XIII de bi “nameyên nûçeyan” ve dest pê kiriye. Cara herî pêşî em nameyên nûçeyan li Venedîkê dibînin ku di wê demê de navenda çand û bazirganiyê bû. Ev nameyên nûçeyan bi destan dihatin nivîsîn û ji aliyê dewlemandan, zadeganan ve bi bihayên bilind dahatin sitandin.[1]

Ji destpêkê heta niha rojnamegerî bi piranî li dewletên rojava pêş ketiye. Li Fransayê rojnameya ewil a ku dişibe rojnameyên îroyîn û modern di sedsala 17mîn de hatiye çapkirin. Rojnameya Théophraste Renaudê pêşiyê bi 1200 nusxeyî ve derketiye pêşberî xwendevanên xwe. Şoreşa 1789an ji bo çapemeniya Fransayê bûye qonaxeke nû û hejmara rojname û kovaran jî her roj zêde bûye. Di Çileya Paşîn a 1789an de bi tenê 6 rojname hebûne, lê di Tebaxa 1979an de ev jimar derketiye 124an.[2]

Der barê dîroka rojnameyên Îngîlistanê de jî fikrên ji hev cûda hene. Hin kes dibêjin rojnameya herî ewil di sala 1622yan de hatiye derxistin ku navê wê The News Fran İtaly and Germany ye.[3]

Hin kes jî dibêjin li Îngîlistanê cara pêşin di sala 1625an de rojnameya Mercurius Biritannicusê hatiye çapkirin.[4]

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) di sektora medyayê de li gor dewletên din welatekî pêşketî ye. Li DYAyê di sala 1638an de jî cara ewil rojnameya “Public Occurrences Both Foreign and Domestic”ê hatiye çapkirin.[5]

Îro tîrajên rojnameyên Amerîkayê gihîştiye milyonan. Li welêt di sala 2005an de lêkolînek hat kirin da ku sed rojnameyên Amerîkayê yên herî xwedan hêz tespît bikin.

---

[1] Murat Aktaş û Mehmet Yonat, **Dîroka Çapemeniya Kurdî Dema Osmaniyan**, İstanbul: Berdan Matbaacılık, (Dîroka çapê nediyare) r. 18.
[2] Özgür Gönenç, **Dünya Medyası**, İstanbul: Truva Yayınları, 2010, r. 15. ( ji pirtûka Fabrizio Tonello, Elisa Giomi II Giornalismo Francese, Carocci Yayınları, roma: 2006, r. 11ê hatiye hildan).
[3] Aktaş û Yonat,**b.n.b.**, r. 19.
[4] İsmet Bozdağ**, Basın Kurt mu? Kuzu mu?**, İstanbul: Emre Yayınları, 2006, r. 42.
[5] Gönenç, **b.n.b.**, r. 168.

Li gor wê lêkolînê tîrajên rojnameyên li Amerîkayê yên herî bihêz wiha ne; USA Today 2.281831, The Wall Street Journal, 2.070.498, The New York Times 1.121.623, Washington Post jî 740.947.[6]

CNNa ku li dinyayê televîzyona herî navdar e jî li DYAyê weşanê dike. CNNê (Cable News Network) di Hizîrana 1980î de dest bi weşanê kir û di demeke kurt de bû televîzyona herî navdar a dinyayê. CNNê di dinyayê de cara ewil 24 saetan bi tenê weşana nûçeyan kir û ji bo kanalên nûçeyan bû nûmûneyek. Piştî CNNê li her derên dinyayê kanalên nûçeyan hatin damezrandin.

CNN li 212 welatan ji aliyê zêdetirî 1,5 milyar însanî ve tê temaşekirin û li dinyayê 42 buroyên wê hene.[7]

Gava ku em li rojnameyên Tirkî dinêrin em dibinin ku li ser mijara rojnameya ewil ya bi Tirkî nîqaş hene. Hin kes dibêjin rojnameya Tirkî ya ewil rojnameya Taqvîm-î Weqayî ye û di sala 1831ê de hatiye çapkirin.[8]

Lê hin lêkolîner jî wê fikrê qebûl nakin û dibêjin 3 sal beriya Taqvîm-î Weqayî yanê di sala 1828an de li Misirê rojnameya Weqay-î Misriye ji aliyê Mehmet Elî Paşayê Kavalayê ve bi Tirkî û Erebî wek rojnameyeke heftane hatiye çapkirin.[9]

Em dikarin bibêjin li Stenbolê rojnameya ewil Taqvîm-î Weqayî ye ku bi Tirkî hatiye derxistin.

Çapemeniya Kurdan di heyama Ebdulhemîdê Duyemîn de di sala 1898an de bi derxistina rojnameya Kurdistanê dest pê kir. Rojnemeya Kurdistanê yekemîn rojnameya Kurdî ye û di 22yê Nîsana 1898an de ji aliyê Mîqdad Mîdhed Bedirxan ve li Qahireyê hat derxistin. Rojname carna pênc rojan carekê, carna jî mehê carekê hatiye derxistin. Mîqtad Beg di pêveka Fransî ya jimara yekemîn ya rojnameyê de ji bo armanca derxistin û peywira rojnameyê wiha gotibû: *"Di roja me de rojname hemû bûyerên ku li cîhanê diqewimin, dinivîsînin. Em gelek tiştan ji rojnameyan hîn dibin. Lê mixabin Kurdên ku ew qas wêrek, egîd û merd in, ji tiştekî bi vî awayî mehrûm in. Ez jî ji bo ku*

[6] Gönenç, **b.n.b.**, r. 174.
[7] Gönenç, **b.n.b.**, r. 185.
[8] Aktaş û Yonat, **b.n.b.**, r. 24. (Ji pirtûka Grolier İnternational Americana Aneyclopedia, Cilt 3, r. 94.)
[9] Hıfzı Topuz, **II. Mamut'tan Holdinglere Türk Basın Tarihi**, İstanbul: Remzi Kitabevi, Kasım 2012, r.13. (Orhan Koloğlu, Osmanlı'dan günümüze Türkiye'de Basın: Orhan Koloğlu, İlk Gazete, İlk Polemik, Vakay-i Misiriye'nin Öyküsü ve Takvim-i Vakayi'de tartışma)

*we Kurdan ji cîhanê agahdar bikim, riya îlim û merîfetê nîşan bidim û xwendin û nivîsandina Kurdî teşwîq bikim vê rojnameyê derdixînim."*[10]

Ji heyama Ebdulhemîdê Duyemîn heta damezrandina Komara Tirkiyeyê rojnameya Kurdistan [1898], Kurd Teawun we Teraqî [1908], Şarq we Kurdistan [1908], Kurdistan [1908], Peyman [1909], Amîdî Sewda [1909], Jîn [1918], Gazî [1918] û Bangî Kurdistan [1922] derketin û ev rojname ji bo dîroka çapemeniya Kurdan gelekî girîng in.[*]

Gava em li kar û xebatên rojnamegeriyê mêze dikin em dibînin ku Kurd di warê medyayê de gelekî li paş mane. Di salên dawîn de bêtir haya Kurdan ji rola medyayê çêbûye. Îro di dewletên demokratîk de saziyên çapemeniyê li cem dezgehên daraz, yasadanîn û birêvebirinê wek hêza çaremîn tên qebûlkirin. Ji ber vê hêza çapemeniyê, li hemû welatên demokratîk, pêşveçûyî û dewlemend rola rojnamegeriyê zehf girîng e. Lê mixabin ji ber şert û mercên siyasî, aborî û sedemên din xebat û tezgehên Kurdî yên li ser rojnamegerî û nûçegihaniyê pir kêmin.

Di deh salên dawîn de di nav Kurdan de hejmara dezgehên nûçegihaniyê zêde dibin. Ji ber vê jî lazim e li ser nûçegihanî û rojnamegeriyê bi taybetî jî kar û xabatên akademîk bên kirin.

Ragihandin çi ye? Nûçe û nûçegihanî çi ye? Ji kê re dibêjin nûçegihan? Berhevkirin û gihandina nûçeyan çawa dibe? Cûreyên nûçeyan çi ne? Pirsgirêkên nûçeyên bi Kurdî û nûçegihanên Kurdan çi ne? Ev pirs û mijar ji hin sernavên serekene ku divê lêkolîner li ser bisekinin û bi têgehên Kurdî binivîsînin.

Di bingeha nûçegihaniyê de ragihandin heye û ragihandin jî bi afirandina însanan û bi destpêka dîroka mirovahiyê derketiye holê. Yanê em dikarin bibêjin ragihandin bi însanîyetê çêbûyê lê bi hîşmendî û pêşveçûna şaristaniyê amûrên wê guherîne û heta niha hatiye.

---

[10] Ercan Çağlayan, *"Ji Osmaniyan Heta Roja Me Çapemeniya Kurdî*", (Gotora ku nehatiye weşandin), **Komxebata Pirsgirêkên Nûçegihaniya Kurdî û Pêşniyarên Çareseriyê**, Ankara, 29.05.2014.

[*] Ji bo hûrguliyên derbarê rojnameyên navborî bnr. Çağlayan Ercan, Ji Osmaniyan Heta Roja Me Çapemeniya Kurdî, Komxebata Pirsgirêkên Nûçegihaniya Kurdî û Pêşniyarên Çareseriyê, Ankara, 29ê Îlona 2014an, Malmîsanij & Mahmûd Lewendî, Li Kurdistana Bakur û Li Tirkiyê Rojnamegeriya Kurdî [1908-1981], Weşanên Jina Nû, Uppsala 1989, r. 15-91; Fetullah Kaya, Osmanlı Döneminde Kürt Basını, [Teza Lîsansa Bilind a ku nehatiye weşandin], Marmara Unîversîtesî Sosyal Bilimler Enstîtusu, Îstanbûl 2008; Mesûd Serfiraz, "Osmanlı Dönemi Kürt basın Tarihine Genel Bir Bakış", Kürt Tarihi, (Ağustos-Eylül 2013), jimar: 8, r. 30-37.

Çawa ku her tişt li gor dewr û dewrana xwe pêşve diçe, ragihandin jî li gor amûr û teknolojiya ku hatiye bikaranîn çêbûye. Ji ber vê çendê jî ragihandin di serdemên ewil de bi gotinan yanê bi çandeke devkî hatiye kirin. Di vê heyamê de ne bi tenê devkî hin riyên din jî hatine bikaranîn û ji wan yek jî agir e. Di wê heyamê de ku hovane tê bi navkirin kesên li nêzî hev bi gotinan, yên dûrî hev jî bi dû û agir ji hev agahdar bûne.

Ragihandina bi vî şiklî heta kifşkirina nivîs û nivîsandinê dewam kiriye. Di vê heyamê de ragihandina devkî ji aliyê kes an kesên di vê heyamê de hatiye bikaranîn. Kifşkirina nivîs û nivîsandinê ji bo ragihandinê merhaleyeke girînge û ji vir şûnde çanda nivîskî derketiye pêş. Paşê bi îcatkirina çapxaneyê êdî ragihandin ketiye seredemeke nûjen û bûye hûnereke biqedir û qiymet.

Ragihandin di sedsala 19mîn de wek têgehekê hatiye bikaranîn û bi gotin, telefon û amûrên din bi danûstandina peyaman çêdibe. Zanyararan bi vî şiklî û bi awayekî hêsan ragihandin terîf kiriye.[11] Derbarê wateya ragihandinê de nêzî 200 terîf hatine kirin. Li gor xebatên ku E.X. Dance û Carl E. Larson di sala 1972an de kirine 126 wateyên ragihandinê hatine berhevkirin.[12] Ji ber vê em nikarin bi tenê maneyekê bidin têgeha ragihandinê. Lê em dikarin bi kurtasî wateya ragihandinê wiha rêz bikin;

- Bi şandina enformasyona ku hewcedariya bersivekê ferz dike.[13]
- Ew bandora bi wate ye ku di navbera kesekî/ê û guhdaran de pêk tê.[14]
- Fikir, raman û nêrînen ku tên parvekirin.[15]
- Enformasyona ku bi riya nîşaneyan ji aliyê kesekî an komekê ve tê parvekirin e.[16]

Di encama wateya ragihandinê de hin cûre jî derketine holê. Yanê ragihandin;

Devkî.

[11] Nazife Güngör, **İletişime Giriş,** Ankara: Siyasal Kitabevi, 2015, r. 20. (Ji pirtuka İrfan Erdoğan, Erk Yayınları, 2002, r.11an hatiye hildan)
[12] Aysel Aziz, **Televizyon ve Radyo Yayıncılığı,** Ankara: Turhan Yayınevi, 2006, r. 3.
[13] Emir Turam, **Medyanın Siyasi Hayata Etkileri**, İstanbul: İrfan Yayımcılık, 1994, r. 43. (Ji pirtuka J. L. Aranguren, Human Communication, New York, McGraw-Hill, 1967, r. 11an hatiye hildan)
[14] Turam**, b.n.b**., r. 43. (Ji pirtûka Melvin L. Defleur, Theories of Mass Communication, çapa 2mîn, New York, David MeKay, 1970, r. 91.)
[15] Turam, **b.n.b**., r. 43. (Ji pirtûka Wilbur Schramm, How Communication Works, Jean M. Civikli (der). Mssages, New York, Random House, 1974, r. 6.)
[16] Turam, **b.n.b**., r. 43. (Ji pirtûka George A. Thedorson û Achilles G. Theodorson, A Modern Dictionary of Sociology, New York, Thomas Y. Crowell, 1969, r. 62.)

Nivîskî.

Ne devkî û ne jî nivîskî.

Rûbirû û bi amûrên ragihandinê tê kirin.

Nûçe jî li ser daxwaz û ferziyata ragihandinê derketiye û rûdanên ku li cihanê diqewimin, hemû nûçe ne. Lê her kes li gor mereq û çanda xwe bala xwe dide nûçeyan. Di vir de têgeha "nirxa nûçeyê" derdikeve pêş. Nirxa nûçeyê di rojnamegeriyê de mijareke girîng û sereke ye. Lê ewil divê em bizanibin bê ka nûçe ji aliyê zanyaran ve çawa hatiye terîfkirin.

- Tiştên ku me bihîstiye û em jê agahdar bûn.[17]
- Agahiya ku derbarê tiştekî tê bidestxistin an jî agahiya ku bi amrazên ragihandinê tê weşandin.[18]
- Derbarê bûyerekî de parvekirina agahiyan.[19]
- Tiştên ku duh agahiya me jê tunebû nûçe ye.[20]
- Mijarên ku mîrov li ser xeber didin nûçe ye.[21]
- Tiştên ku balkêş e û em dixwazin hîn bibin, bibihîzin û bixwînin.[22]

Nûçe; ji mijarên werzîşê, heta siyaset, aborî, magazîn, huner, tendurustî, dîplomasî û vejenê yanê di her mijarê de tesîrê li jiyana însanan dike. Ji ber vê çendê jî nûçe di nav xwe de ji hev vediqetin û li gor pisporiyê agahiyên ji hev cûda tên berhevkirin.

Di encama vê pisporiyê de edîtoriyên servîsên cûda yên mîna nûçeyên partiyên siyasî, nûçeyên aboriyê, nûçeyên polîs û dadgehê, nûçeyên derve, nûçeyên dîplomasiyê, nûçeyên perwerdehiyê, nûçeyên tenduristiyê, nûçeyên herêmî, nûçeyên werzîşê, nûçeyên çand û hunerê, nûçeyên magazînê, nûçeyên hawirdorê, nûçeyên teknolojiyê, nûçeyên vejenê, nûçeyên bajaran derketine holê.

---

[17] Atilla Girgin û Seçil Özay, **Haber Yazmak,** İstanbul: Der Yayınları, 2003, r. 4.
[18] Zana Farqînî, **Ferhenga Mezin aTirkî-Kurdî** "Nûçe", Stenbol: Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, 2000, r. 508.
[19] Girgin û Özay, **b.n.b.,** r. 4. (Ji **Büyük Larousse Sözlük ve Ansiklopedisi**, İstanbul, Milliyet Gazetecilik A.Ş. hatiye hildan)
[20] Oya Tokgöz, **Temel Gazetecilik**, Ankara: İmge Kitabevi, 2013, r. 237.
[21] Tokgöz, **b.n.b**. r. 237.
[22] Cemil Oğuz, **Rojnamegerî û Pîvanên Wê Yên Sereke**, İstanbul: weşanên Pêrî, 2002, r. 32.

Di warê nûçegihaniyê de rojnameger di navenda hemû agahiyan de ye û li gor çavkaniyên xwe nûçeyan dinivîse. Nûçegihan ew kes e ku agahdar dike û ji bo dezgeheke amûrên ragihandinê yên girseyî agahiyan berhev dike û dinivîse.[23] Nûçegihan ji aliyê çavkaniyên xwe ve îstîxbaratên bûyeran hildide; paşê diçe dibîne, dibihîzê, fêm dike, qeyd dike û bi awayekî objektîf radigihînê gel. Îro li hemû dinyayê nûçegihan li ser mijarên ku pisporên wê ne disekinin, lêkolînan dikin û nûçeyan dinivîsîn.

Ji bo ku nûçegihan bi serkeve lazim e xwediyê hin şert û qabiliyetan be. Di sêrî de divê nûçegihan bimereq be. Heke mereq tune be rojnamegerî nabe an jî dê xeletî û kêmasî çêbibin. Rojnameger gava ku dest bi nivîsandina nûçeyan dike divê di hin waran de baldar be û bi taybetî jî ji bo ku nûçe ji aliyê her kesî ve bê xwendin sernavên balkêş derxe pêş. Di nûçeyan de sernav ji bo tesîra agahiyê (Nûçeyê) pir girîng e û ji ber vê çendê jî Sernavê Sereke, Jorsernav, Jêrsernav, Sernavê spot û Navsernav divê di cih de bên bikaranîn.

Beriya weşandina nûçeyan hin merhale hene ku ev jî di berhevkirina agahiyan de derdikevin pêş û ev merhale di nûçegihaniyê de xeteke sereke ye. Pêvajoya berhevkirina nûçeyan bi lêkolîn, jinûvehilbijartin, vebijartin, danîna nûçeyê û weşandinê pêk tê. Piştî temambûna wan agahî û materyalan divê nûçe bê weşandin.

Ji bilî van di nûçeyan de bikaranîna demê jî pir girînge. Di nûçeyan de bêtir dema boriya têdeyî tê bikaranîn. Lê ji bo bekraunda nûçeyê em dikarin dema boriya çîrokî bikarbînin. Di zimanên nûçeyan de ev rêgez ne bi tenê ji bo Kurdî, di Îngîlîzî, Fransî û Tirkî de jî hatiye qebûlkirin. Ji bo tesîra nûçeyê divê dema boriya têdeyî bê bikaranîn.

Mînak: Serokwezîr Nêçîrvan Barzanî çû Stenbolê.

Mînak: Serokwezîr Nêçîrvan Barzanî çûye Stenbolê.

Di mînakên jorîn de ya rast Serokwezîr çû Stenbolê ye. Yanê hevoka bi dema boriya têdeyî ye.

Di nûçeyan de rêbaza 3 Ç 3 Kyê jî yek ji rêzikên sereke ye û divê bersiva 3 Ç û 3 Kyê diyar be. Di nûçeyan de lazime ku nûçegihan bersiva 3 Ç û 3 Kyê bide (Çi? Çima? Çawan? Kî? Kîngê? (Li) Ku derê?) û paşê dest bi nivîsandina nûçeyê bike. Rojname û

[23] Girgin û Özay, **b.n.b.**, r. 297.

rojnamegerên cidî giringiyê didin rêgeza 3 Ç û 3 Kyê û xwendekar û temaşevanên xwe ji rûdan û bûyeran agahdar dikin. Heke bersiva 3 Ç û 3 Kyê neyê dayîn ev dibe sedema kêmasiyan.

Nûçe piştî berhevkirin û amedekirina agahiyan li ser hin teknîkan tên danîn. Nûçe bi taybetî li ser Teknîka Pîramîta Vajî, Teknîka Pîramîta Rast û Teknîka Çargoşe tên danîn. Rêbaza Pîramîta Vajî di nav teknîkên nivîsandina nûçeyan de teknîka herî kevn e û îro jî herî zêde ev teknîk di nûçeyan de tê bikaranîn.

Teknîka Pîramîta Rast, bereksê teknîka Pîramîta Vajî bi hûrgiliyan dest pêdike û di dawiya nûçeyê de xala herî girîng û balkêş di nûçeyê de cih digre. Piştî Teknîka Pîramîta Vajî, rêgeza ku herî zêde tê bikaranîn Teknîka Çargoşe ye. Ev rêgez ji bo nûçeyên analîzê an jî nûçeyên ku tê de şîrove hene hatiye bikaranîn û derketiye pêş.

Ji bo rojnameger û nûçeyên kûrdî hin pirsgirêkên mezin jî hene. Lê mixabin çareserkirina wan probleman ne bi tenê di destê dezgeh û rojnamegerên Kurdan de ye û ev mesele jî tunebûna standardizasyona rê û rêbazên nivîsandina Kurdî ye. Ji bo ku meseleya standardîzayonê baş bê fêmkirin em dikarin hin mînakan bidin.

Tekilî- Têkilî, Awahî- Avahî,  Xristyan- Xristiyan, Lire- Lîre, Wasaît- Vesaît- Wesayît,  Jehrê- Jehrî, Erîş- Êrîş, Stendin- Standin, Hefs- Heps, Trafîq- Trafîk- Hatûçûy-Hatinçûyin, Otobus- Otobês, Gihaşt- Gihîşt- Gihêşt, Xaz- Gaz, Dinihêrin- Dinêrin, Cigare-Cixare.

Di mînakên jorîn de jî diyar e ku peyvek bi dehan telefûzan tê nivîsandin. Ji ber vê jî nivîskar û rojnamegerên Kurdan dê bi kîjan telefûz û varyantê binivîsin? Helbet herkes dikare li gor xwe bersivekê bide. Lê ew çareserî nîn e.

## BEŞA YEKEMÎN

## RAGIHANDIN Û NÛÇE

### 1.1. RAGIHANDIN

Ragihandinê ji destpêka dîroka mîrovahiyê heta niha wek pêwistiyeke sereke ya rojane dewam kiriye û roj bi roj jî pêşve çûye. Ragihandin di serdemên ewil de bi gotinan yanê bi çandake devkî ji aliyê kes an civakê ve hatiye kirin. Di vê heyamê de ne bi tenê devkî hin riyên din jî hatine bikaranîn û ji wan yek jî agir e. Di wê heyamê de ku wek hovane tê bi navkirin kesên li nêzî hev bi gotinan, yên dûrî hev jî bi dû û agir ji hev agahdar bûne. Ragihandina bi vî şiklî heta kifşkirina nivîs û nivîsandinê dewam kiriye û şûna çanda devkî çanda nivîskî derketiye pêş. Paşê bi îcatkirina çapxaneyê êdî ragihandin ketiye merhaleyeke nûjen û bûye hûnereke biqedir û qîmet.

Îro ragihandin bi riya teknolojiyê bi rojname, kovar, televîzyon, radyo, CD, DVD hwd. tê kirin û wek beşeke zanistê li dinyayê hatiye qebûlkirin û her roj jî li ser lêkolîn tên kirin. Derbarê wateya ragihandinê de nêzî 200 terîf hatine kirin. Li gor xebatên ku E.X. Dance û Carl E. Larson di sala 1972an de kirine 126 wateyên ragihandinê hatine berhevkirin.[24]

Ji ber vê em nikarin bi tenê maneyekê bidin têgeha ragihandinê. Di encamên xebatên lêkolîneran û nêrînên ji hev cûda de mirov dikare wateya ragihandinê wiha terif bike: ”Bi alîkariya hin amûran, parvekirina agahî, fikir û tevgeran e.” [25] Ragihandin wek têgehekê di sedsala 19mîn de hatiye bikaranîn û bi gotin, telefon û amûrên din bi danûstandina peyaman çêdibe. Zanyararan bi vî şiklî û bi awayekî hêsan ragihandin terîf kirine.[26]

Ji bilî wan nêrînan, wateyên din jî dane têgeha ragihandinê û ji wan hin mînak wiha ne:

- Şandina enformasyona ku hewcedariya bersivekê ferz dike.[27]
- Bandora bi mane ya ku di navbera kesekî/ê û guhdaran de derdikeve.[28]

---

[24] Aziz, **b.n.b.**, r. 3.
[25] Aziz, **b.n.b.**, r. 5.
[26] Güngör, **b.n.b**., r. 20. (Ji pirtuka İrfan Erdoğan, Erk Yayınları, 2002, r.11an hatiye hildan)
[27] Turam, **b.n.b.,** r. 43. (Ji pirtuka J. L. Aranguren, Human Communication, New York, McGraw-Hill, 1967, r. 11an hatiye hildan)

- Fikir, raman û nêrînen ku tên parvekirin.[29]
- Enformasyona ku bi riya nîşaneyan ji aliyê kes an komekê ve tê parvekirin.[30]

Ragihandin; devkî, nivîskî, ne devkî û ne nivîskî, rûbirû û bi amûrên ragihandinê tê kirin.

### 1.1.1. Ragihandina Devkî

Ragihandin di navbera şandiyar û girtiyar de bi devkî tê kirin. Ev cûre ji destpêka însaniyetê hatiye bikaranîn û cûreya herî kevn a ragahindinê ye.[31] Zanyar dibêjin ji ber ku nivîs û alfabe nehatiye kifşkirin bingeha vê ragihandinê axaftin e û vê heyamê wek çanda bi devkî qebûl dikin. Lê di pirtûkên pîroz ên mîna Qûrana Misilmanan û zanyarên Îslamiyetê de ev nêrîn nayê qebûlkirin û dibêjin bavê hemû însanan Hz.Adem e û Xaliqê Alemîn jê re 10 rûpel wahiy şandiye û ji ber vê jî ji destpêka însaniyetê heta niha çanda nivîskî hebûye. Lê dibe ku hin kesan nikarûbûye binivîse û bixwîne. Ji ber ku ev mesele ne mijara me ya sereke ye ne lazim e ku em li ser vê zêde bisekinin û ji bo vê jî em nakevin ser hûrgiliyan.

### 1.1.2. Ragihandina Nivîskî

Ev cûre ragihandin di navbera şandiyar û girtiyar de bi nivîskî pêk tê. Dîroka vê ragihandinê heta 4000 hezar sal beriya zayîna Îsa diçe. Di vê heyamê de him bi nivîsan him jî bi nîgarên ku di kewştan de ji aliyê mîrovên hov ve hatine bikaranîn ragihandin çêbûye.[32]

### 1.1.3. Ragihandina ne Devkî û ne jî Nivîskî

Ragihandin ne bi gotinan û ne jî bi nivîsan tê kirin. Kesên ku dixwazin ji hev re tiştekî bibêjin bi mîmîkan ango bi tilî, dest û çavan bi hev re diaxivin. Tê qebûlkirin ku ev cûre ragihandin di dîrokê de ya herî kevn e û bi vî awayî peyama di navbera girtiyar

---

[28] Turam**, b.n.b**., r. 43. (Ji pirtûka Melvin L. Defleur, Theories of Mass Communication, çapa 2mîn, New York, David MeKay, 1970, r. 91.)
[29] Turam, **b.n.b**., r. 43. (Ji pirtûka Wilbur Schramm, How Communication Works, Jean M. Civikli (der). Mssages, New York, Random House, 1974, r. 6.)
[30] Turam, **b.n.b**., r. 43. (Ji pirtûka George A. Thedorson û Achilles G. Theodorson, A Modern Dictionary of Sociology, New York, Thomas Y. Crowell, 1969, r. 62.)
[31] Aziz, **b.n.b.**, r. 8.
[32] Aziz, **b.n.b.**, r. 8.

û şandiyar de raste rast tê şandin. Hunera ku wek pandomîm tê binavkirin ragihandina bi vî şiklî ye.[33]

### 1.1.4. Ragihandina Rûbirû û Biamûran

Di navbera kes an kesan de rasterast, rû bi rû an jî bi amûrên ragihandinê peyam tê şandin. Heke însan peyam an gotinên xwe li ba hev ji hev re bişînin û bibêjin, ev dibe ragihandina rû bi rû. Heke ji dûr ve bi amûrên ragihandinê peyamên xwe ji hev re bişînin wê çaxê ev dibe ragihandina biamûran. Ev cûre ragihandin li gor cûreyên ragihandinên din di demên dawî de derketiye û îro bi saya teknolojiyê pêşve çûye. Bi taybetî ragihandina ku ji dûrve tê kirin bi alîkariya teknolojiyê pêk tê û amûrên wek telgraf, telefon, telex, fax, radyo, televîzyon, fîlman diçe serî. Di serdama dawîn de jî înternet derketiye û ev amûr bûn amûrên sereke yên ragihandinê.[34]

## 1.2. NÛÇEGIHAN Û NÛÇE

### 1.2.1. Nûçegihan Kî ye?

Nûçegihan ew kes e ku agahdar dike, ji bo dezgehekê bi amûrên ragihandinê yên girseyî agahiyan berhev dike û dinivîse.[35] Nûçegihan ji aliyê çavkaniyên xwe ve îstîxbaratên bûyeran werdigire; paşê diçe dibîne, dibihîze, fehm dike, qeyd dike û bi awayekî objektîf radigihînê gel. Îro li hemû dinyayê nûçegihan, li ser mijarên ku pisporê wê ne disekinin, lêkolînan dikin û nûçeyan dinivîsîn.

Mirov dikare nûçe û nûçegihan li gor mijar û pisporiyê wiha kategorîze bike;

Nûçegihanê Serokomariyê, nûçegihanê serokwezirtiyê, nûçegihanê parlamentoyê, nûçegihanê partiyên siyasî, nûçegihanê aboriyê, nûçegihanê polîs û dadgehê, nûçegihanê şer, nûçegihanê wezarata karên derve an jî nûçegihanê derve, nûçegihanê dîplomasiyê, nûçegihanê perwerdehiyê, nûçegihanê zanîngehan, nûçegihanê tenduristiyê, nûçegihanê şaredaran, nûçegihanê werzîşê, nûçegihanê çand û hunerê û hwd.

Ji bo ku nûçegihan bi ser keve lazim e ku xwedî hin şert û qabiliyeta be. Di sêrî dê divê nûçegihan bimereq be û paşê jî;

---

[33] Aziz, **b.n.b.**, r. 8.
[34] Aziz, **b.n.b.**, r. 9.
[35] Girgin û Özay, **b.n.b.,** r. 297.

- Baldar be
- Jêhatî be
- Bikaribe îqna bike
- Kontrol bike
- Analîzan bike
- Teqîp bike
- Bifikire
- Şikbar be[36]

Ji bilî van gava ku nûçegihan li ser mijarekê disekinê divê beriya her tiştî serancama bûyer an jî mijarê baş bizanibe ku nûçeyên xelet nenivîse. Heke nûçêgihan jêhatî û zana be wê demê dikare pirsên di cih de bipirse û rastiyê derxîne holê. Divê em jibîr nekin ku hêza rojnemegeran ya herî xurt, mafê pirs pirsînê yê. Her çiqas ev maf, wezîfe û heqê rojnamegeran be jî divê nûçegihan pişta xwe nedin vî mafî û quretî, bêhurmetî û bozbilindiyê jî nekin. Heke rojnameger mafê pirs pirsînê li gor berjewendiyên xwe yên şexsî bi kar bîne ev dibe sedema bêrêtî û aloziya çapemeniyê. Îro li gelek welatan ev pirsgirêk mixabin dewam dikin.

Rojnameger divê bi zimanekî zelal û nerm pirsên xwe bipirse. Heke di civîna çapemeniyê de be, divê ewil navê xwe û paşê jî saziya ku tê de dixebite diyar bike û paşê pirsên xwe ji mixatabên xwe bipirse. Nûçegihan bi mixatabê xwe re nakeve nîqaşan, bi tenê bi awayekî objektîf li gotinên wî guhdar dike û heke hewce bike ji bo ku mijar ji aliyê xwîner an jî temaşevanan ve bê fehmkirin dikare pirsên din jî bipirse. Divê nûçegihan her tim bitedbîr be. Wek mînak lazim e heta ku ji dest bê cîhaza qeydkirinê, makînaya wênegirtinê, pênûs û kaxiz li cem hebin. Carinan di civînan de cihaza dengqeydkirinê an jî kamera nayên bikaranîn. Ji ber vê yekê divê di wê demê de bikaribin bi awayekî hêsan gotinên muxatabê xwe tomar bikin.

[36] Anadolu Ajansı Genel Müdürlüğü, **Habercinin El Kitabı Yeni Nesil Gazeteciliğin Temel İlkeleri**, Ankara: Anadolu Ajansı, 2014, r. 21.

### 1.2.2. Nûçe Çi ye?

Çi piçûk çi mezin ev rûdanên ku li cihanê diqewimin, hemû nûçe ne. Ji barîna baran û berfê bigrin heta qezayên li ser riyan, şer û pevçûnên însanan, vekirina kulîlkan, mirin an dayikbûna însanan, hemû rûdan nûçe ne. Di nav wan rûdanan de bûyer jî hene û gotin jî hene. Lê çawa ku bihayê her tiştî ne vekhev e, nirx û bihayê nûçeyan jî ne vekhev e. Em ê di bin sernavekî cûda de li ser nirxa nûçeyan bisekinin. Lê ewil lazime em diyar bikin ka ji aliyê zanyaran ve nûçe çawa hatiye terîfkirin.

Nûçe di zimanê Îngilîzan de bi sertîpên peyvên North (Bakûr), East (Rojhilat), West (Rojava) û South (Başûr) pêk hatiye û jê re gotine News yanê nûçe an jî xeber.[37] Tirkan ji peyva xabar a Erebî hildane û gotine haber. Peyva xeberê Kurd jî bikartînin. Lê di salên dawîn de êdî peyva ‘nûçê’yê rûniştiye û di medyaya Kurdî de tê nivîsîn û bikaranîn.

Îro gelek wateyên nûçeyê hene û ji wan hin wiha ne:

- Agahiya ku derbarê mijareke diyar de hatiye bidestxistin.
- Bi awayekî objektîf agahdarkirina bûyeran.
- Rûdana ku îro qevimiye.
- Tiştên ku rojnamegeran weşandiye.
- Tiştên ku me bihîstine û em jê agahdar bûne.[38]
- Agahiya ku derbarê tiştekî de tê bidestxistin an jî agahiya ku di amrazên ragihandinê de tê weşandin.[39]
- Derbarê bûyerekê de parvekirina agahiyan.[40]
- Tiştên ku duh agahiya me jê tune ye.[41]
- Mijarên ku mîrov li ser xeber didin.[42]

---

[37] Girgin û Seçil Özay, **b.n.b.**, r. 3. (Ji pirtûkaÜnal Uyguç û Ali Genç, **Radyo Televizyon Haberciliği**, İstanbul, Avcıol Basımyayın, 1998, r. 107an hatiye hildan)
[38] Girgin û Özay, **b.n.b.,** r. 4.
[39] Farqînî, **b.n.b.,** r. 508.
[40] Girgin û Özay, **b.n.b.,** r. 4. (Ji **Büyük Larousse Sözlük ve Ansiklopedisi**, İstanbul, Milliyet Gazetecilik A.Ş. hatiye hildan)
[41] Tokgöz, **b.n.b.**, r. 237.
[42] Tokgöz, **b.n.b**., r. 237.

- Tistê ku gel eleqeyê nîşan dide.
- Raporkirin, parvekirin û ragihandina bûyeran.
- Tiştên ku ew bi xwe balkêş e û em dixwazin hîn bibin, bibihîzin û bixwînin.[43]

Diyare ku bi tenê wateyeke nûçeyê tune ye. Di dîroka rojnamegeriyê de gelek mane dane nûçeyê û ev hatiye merhaleyeke wisa ku em dikarin bibêjin li dinyayê çiqas rojnameger hebin ewqas jî wateyên nûçeyê hene.

## 1.3. NIRXA NÛÇEYÊ Û HÊMANÊN NIRXA NÛÇEYÊ

Nirxa nûçeyê ji faktorên ku tesîra nûçêyê kêm an jî zêde dikin pêk tê. Hin nûçe hene ku bi tenê navçe an bajarekî, hin nûçê hene hemû dinyayê; hin nûçê hene bi tenê mamosteyan an jî kesên ku di sektora tendurustî, çandinî û karên din de dixebitin eleqedar dikin. Her kes li gor rewşa xwe, bala xwe dide nûçeyê û dixwîne. Ji ber vê jî faktorên ku nirxa nûçêyê pêk tînin jî ji hev cûda ne û bi hev re bingeha nirxa nûçeyê datînin.

Zanyarên ku li ser rojnamegeriyê dixebitin di pênc katogoriyan de wiha faktorên nirxa nûçêyê rêz kirine: Hêmana demî, dûrbûn û nêzikbûn, giringî, encam û balkêşî. Hin kes jî orjînaltî, ecêbî û şikê jî tevî wan xalan dikin.[44]

### 1.3.1. Hêmana Demî

Di serdema ku em têde ne de nûçegihanî bi saya teknolojiyê bi lez tê kirin û nûçe ji nişka ve belav dibin. Ji ber vê jî di demeke kin de haya her kesî ji bûyerên ku diqevimin dibe û nûçe jî carna di nav deqeyekê de û carna jî di nav saet an di rojê de ji nirxa xwe dûr dikevin. Ji bo vê jî di nûçegihaniyê de hêmana demê zehf girîng e. Nûbûn, nişkavî û derbasdarî wek sê çiqên ku nirxa hêmana demî diyar dikin tên qebûlkirin.[45]

Em bi mînakekê li ser vê meseleyê bisekinin.

**Rûdana yekem;**

”Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî diyar kir ku divê meseleya Kerkûkê bê çareserkirin”

[43] Oğuz, **b.n.b.**, r. 32.
[44] Tokgöz, **b.n.b.,** r. 254.
[45] Tokgöz, **b.n.b.,** r. 256.

**Rûdana duyem;**

"Serokwezîrê Iraqê Nûrî el Malîkî eşkere kir Kerkûkê tu caran nadin Kurdan"

**Rûdana sêyem;**

"Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî got ku Kerkûk a Kurdan e û dê hin hêzên pêşmergeyên din jî bişînin Kerkûkê"

**Rûdana çarem;**

"Wezareta Peşmergeyan ragihand ku hêzên Kurden ber bi Kerkûkê ve bi rê ketin"

Di van nûçe û rûdanan de behsa pirsgirêka Kerkûkê ya ku ji aliyê her kesî vê tê zanîn hatiye kirin. Lê derbarê meseleya Kerkûkê de hin rûdanên nû diqevimin. Di vê pêvajoyê de lazim e ku nûçegihan ewil daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî bide. Çimkî derbarê Kerkûkê de daxuyaniyeke nû tê dayîn yanê tiştekî nû diqevime.

Piştî daxuyaniya Serokwezîr Barzanî, Malîkî xeber dide û Serok Barzanî jî bersivê dide Malîkî. Ev pêvajo ji bo îro û sibê rojeva sereke ye û ji bo rojname û televîzyonan derbasder e. Em gava mijarê dişopînin em dibînin ku rayedarên Hewlêrê hêzên xwe şandine Kerkûkê û ev jî ji nişka ve diqevime.

Di van mînakan de diyar e ku di nûçeyan de hêmana demî pir girîng e. Lê divê rojnameger vê jî bizanibe ku di pêvajoya çêkirina nûçeyê de her çiqas ji destpêkê heta dawiyê, rûdanên ku qevimîne ji bo backgrounde nûçeyê zehf girîng bin jî her bûyera dawîn nirxa nûçeya pêşîn dadixe. Ji bo vê jî lazime nûçegihan di her merhaleya rûdanan de baldar be û haya wî ji bûyeran hebe ku nûçeyê bi serkeftî bigihîne xwendevan û temaşevanan.

### 1.3.2. Dûrbûn û Nêzikbûn

Mirov zêdetir bi bûyer û qewimînên li derdora xwe re elqeder dibin û tiştên li nêzî xwe meraq dikin. Ji ber vê yekê jî ev girîngiya cî û mekana ku bûyer lê qewimiye nîşan didin. Mîrov bi awayekî xwezayî dixwazin hemû bûyer û rûdanên li derdora xwe hîn bibin. Ji ber vê yekê jî nûçeyên li ser cî û mekanên wan, bala wan dikşîne. Heke mirov mînakekê bide; qezayeke trafîkê ya li bajarakî din an jî ya li ber deriyê we ji bo we girîng e?[46] Daxuyaniya serokwezîrê welatê ku em li ser dijîn bala me zêde dikşîne an

[46] Maşallah Dekak, **Nûçe û Nûçevanî 3Ç 3K**, Ankara: Form Ofset Matbaacılık, 2010, r. 21.

daxuyaniya welatê ku tu têkiliya me jê re tune ye? Em dikarin mînakan zêde bikin. Bi kurtasî bûyer an rûdanên ku diqewimin çiqas nêzik bin ewqas jî bala xwendevanan dikşînin.

### 1.3.3. Girîngî

Her nûçe li gor tesîra xwe bi qedir û qîmet e. Yanê giringiya nûçeyê di heman demê de nirxa nûçeyê ye jî. Girîngî girêdeyî tesîra mijara nûçeyê ye û heke têsîr çiqas zêde be nûçê jî ewqas girîng e. Ji bo vê jî divê rojnameger bizanibe mijara ku li ser dixebite wê tesîrê li gel bike an na? Divê ev xal pir baş bê analîzkirin.

Girîngî ji bo polîtîkayên saziyên çapemeniyê jî carna diguherin. Hin nûçe hene di rojnameyekê de dibin manşet an sermanşet. Lê heman nûçe dibe ku di rojnameyeke din de qet cih negre. Rojnameger, divê polîtîkaya weşana saziya ku têde dixebite jî bizanibe.

Nûçegihan beriya destpêkirina nivîsandina nûçeyê divê wan her du xalan analîz bike. Gelo mijara ku ez li ser dixebitim wê tesîreke çawa li gel bike? Ya din jî heke ez vê mijarê û nûçeyê ji midûrê xwe re bişînim dê nûçeya min biweşîne an na? Di vê pirsa duyemîn de wezîfeya rojnamegeran nivîsandin û amedekirina nûçeyan e. Rojnameger nûçeyên xwe teslîmê edîtorê xwe dike û lê lazime di wan merhaleyan de bi rayederên xwe re bişêwire da ku ked û zehmetiyên wî pûç nebin.

### 1.3.4. Encam û Balkêşî

Di nirxa nûçeyê de encam û balkêşî rasterast bi faktorên hêmana demî, dûrbûn-nêzikbûn û giringiyê ve girêdeyî ne. Hemû faktorên nirxa nûçêyê tên ba hev û paşê di encamê de pirsa ”Çima ev mijar an nûçe girîng e, balkêş e û bi tesîr e?” tê pirsîn. Bersiva ku rojnameger dide wan pirsan, him nirxa nûçeyê ye him jî yek ji faktorên nirxa nuçêyê ye.

Em bibêjin ku di belgeyeke fermî de navên dewlet û saziyên ku piştgirî dane rêxistinên terorê hatine bidestxistin. Di nûçeyeke wiha de hemû faktorên nirxa nûçeyê hene û diyare ku di encama weşana nûçeyê de dê tesîreke mezin çêbibe.

## 1.4. LI GOR NAVEROKÊ CÛREYÊN NÛÇEYAN

Nûçe li gor naveroka xwe ji hev vediqetin û nûçegihan jî li gor pisporî û meraqa xwe di wan qadan yekî de dixebite. Îro li hemû dinyayê bi taybetî li welatên pêşveçûyî

servîsên nûçeyan wek edîtoriyekê bi tena serê xwe dixebitin lê elbet bi girêdayî gerînendeyê saziya çapemeniyê ne.

Nûçeyên partiyên siyasî, nûçeyên aboriyê, nûçeyên polîs û dadgehê, nûçeyên derve, nûçeyên dîplomasiyê, nûçeyên perwerdehiyê, nûçeyên tenduristiyê, nûçeyên herêmî, nûçeyên werzîşê, nûçeyên çand û hunerê, nûçeyên magazînê, nûçeyên hawirdorê, nûçeyên teknolojiyê, nûçeyên vejenê, nûçeyên bajaran ji wan beşan yek in.

### 1.4.1. Nûçeyên Partiyên Siyasî

Nûçegihan, xebatên partiyên siyasî yên li welêt û parlamentoyê teqîp dike. Îro li Tirkiyeyê rojname, ji bo her partiyên siyasî nûçegihanekî wezîfedar dike û di sektorê de ji wan hevalan re dibêjin peyamnêrên CHPê, peyamnêrên HDPê, peyamnêrên AK Partiyê. Li parlamentoya Tirkiyeyê nûnerên saziyên çapemeniyê hene û xebatên partiyên siyasî dişopînin. Nûçegihan divê rayedarên partiya ku dişopînin baş nas bikin û têkiliyên xwe bi wan re xurt bikin. Wekî din rojnameger di xebatên xwe de lazime ku kevneşopî û adetên xebatên parlamentoyê jî baş bizanibe ku bi hêsanî karên xwe bidomîne. Ev li her welatî derbasdar e.

Ji bo nûçeyên siyasi minak;

**ENKS û YNK derbarê ROJAVA de civiyan**

HEWLÊR (RÛDAW)- Îro li paytexta Başûrê Kurdistanê bajarê Hewlêrê şandeke ENKSê serdana YNKê kir. Di civînê de ENKSê daxwaz kir, li ser hesabên nakokiyên navbera YNKê û PDKê li Başûrê Kurdistanê, YNK piştgîriyeke yekalî nede PYDê.

Li gor agahiyên Rûdawê, îro li bajarê Hewlêrê şandeke Encumena Niştîmaniya Kurd li Sûriyê (ENKS) serdana bargeha Yekîtiya Niştimanî Kurdistanê (YNK) kir. Şanda ENKSê ji aliyê Endamê Polîtbîroya YNK Seidî Ehmed Pîrê ve hate pêşwazîkirin.

Di hevdîtina di navbera her du aliyan de, li ser rewşa siyasî ya herêmê û bi taybetî girîngiya Rojavayê Kurdistanê hate rawestandin. Herwiha tekezî li ser wê yekê hate kirin ku li Rojavayê Kurdistanê hemahengî û yekrêzî di navbera partî û aliyên siyasî de hebe. Ji aliyê xwe Endamê Polîtbîriya YNK Seidî Ehmed Pîrê bal kişande ser wê yekê ku YNK weke hev nêzîkî ENKSê û aliyên din ên siyasî yên Rojavayê Kurdistanê dibe.

Şanda ENKSê jî di vê civînê de daxwaz kir ku YNK roleke erênî di başkirina pêwendiyên navbera aliyên siyasî yên Rojavayê Kurdistanê de bilîze. Çavkaniyek ji

civînê ji Rûdawê re ragihand ku wan ji YNK xwestine, ji ber nakokiyên ligel PDKê, li ser hesaba wan piştgîriyê nedin Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD).

ENKS ku ji çend partiyên Rojavayê Kurdistanê de ye, di mijara çawaniya rêvebirina Rojavayê Kurdistanê û siyaseta ku li wir tê cîbicîkirin, bi PYDê û Rêveberiya Xweser re ya ku PYDê li Rojavayê Kurdistanê ava kiriye, nakokî hene.[47]

### 1.4.2. Nûçeyên Aboriyê

Nûçeyên aboriyê di nav nûçeyan de beşeke sereke ye û di hemû saziyên çapemeniyê de wek servîseke cûda hatiye damezrandin. Di televîzyonan de bernameyên aboriyê û di rojmaneyan de jî malperên aboriyê cih digrin. Nûçegihanên aboriyê di servîsên nûçeyên aboriyê de û di bin editor û alîkarên edîtor de xebatên xwe didomînin. Ew kesên ku di beşa aboriyê de dixebitin divê zanyarên têgehên ekonomiyê bibin. Ji ber ku têgehên aboriyê di nûçeyên aboriyê de tên bikaranîn û ew cûre nûçe jî li gor nûçeyên din bêtir teknîk in, ji aliyê xwendekar û temaşevanan ve jî zêde aleqeyê nabînin. Bi taybeti karsaz û pisporên aboriyê malperên nûçeyên aboriyê dixwînin. Ji ber ku têgehên aboriyê ji aliyê piraniya xwendekaran ve baş nayên fehmkirin, divê nûçegihan heta ku ji destê wî tê bi zimanekî zelal û hêsan metnê nûçeyê binivîse.

Mînak;

**Kurdistanê zêdetirî 18 milyon bermîlên petrolê firot**

HEWLÊR (RÛDAW) – Wezareta Çavkaniyên Xwezayî ragihand, di meha Befranbar a 2015an de Kurdistanê zêdetirî 18 milyon û 105 hezar bermîlên petrolê bi rêya Bendera Ceyhan a Tirkiyê firotiye.

Wezareta Çavkaniyên Xwezayî ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê îro di daxuyaniyekê de raporta meha 12 a taybet bi firotina petrola Herêma Kurdistanê belav kir.

Li gor vê raportê, di meha Befranbar a 2015ê de (meha dawî ya sale), Herêma Kurdistanê bi giştî 18 milyon û 105 hezar û 734 bermîlên petrolê bi rêya Bendera Ceyhan a Tirkiyê ber bi bazarên cîhanê şandiye derve.

[47] Rûdaw, ENKS û YNK derbarê ROJAVA de civiyan,13yê Çileya 2016an,http://rudaw.net/kurmanci/Kurdistan/1301201612, (Dema Gihanê: 11.02.2016).

Wezareta Çavkaniyên Xwezayî daye xuyakirin, ku 13 milyon û 504 hezar û 536 bermîlên petrolê ji bîrên petrolê di bin desthilata Hikûmeta Herêma Kurdistanê de bo derve hatiye şandin, ku rojane dike 435 hezar û 630 bermîl.

Herwiha ji bîrên petrolê yên Kerkûkê jî 4 milyon û 601 hezar û 198 bermîlên petrolê hatiye firotin, ku di rojekê de dike 184 hezar û 426 bermîl.

Wezareta Çavkaniyên Xwezayî ya Herêma Kurdistanê herwiha aşkere kiriye ku ji ber rewşa deverên derveyî îdareya Hikûmeta Herêma Kurdistanê, bo heyama 3 rojan şandina petrola Kurdistanê bo derve bi rêya boriya petrolê hatibû rawestandin.[48]

### 1.4.3. Nûçeyên Polîs û Dadgehê

Em dikarin bibêjin di nav nûçeyan de beşa herî zor û zehmet nûçeyên polîs û dadgehê ne. Di nîvê şevê an serê sibehê de li kolan û taxan; kuştin, mirin, qeza, şewat, nexweşî û bûyerên wekî wan her tim diqewimin. Rojnamegerên ku polîs û dadgehê dişopînin her tim bi wan rûdan û bûyeran re rûbirû dimînin.

Gava ku nîvê şevê qeza an kuştinek çêdibe nûçêgihan ewil derbarê kesên mexdûr de agahiyan werdigire. Di nav wê teşqele, êş û azarê de hewlên agahîhildanê pir zehmet e û ev hewl carna dibin sedama erîşên li ser nûçegihanan. Nûçegihanên polîs û dadgehê ji bo ku agahiyan hildin divê têkiliyên xwe bi rayedarên polîs û nexweşxaneyan re xurt bikin da ku di bûyerên din de jî zûtir agahiyan werbigirin û nûçeyê binivîsin. Li ba rojnamegerên ku di vî warî de dixebitin her tim telefona bêtel heye û li gor destûra qanûnê li polîsan guhdar dikin û haya wan jî bi vî awayî ji bûyeran dibe.

Mînak;

**Li Almanyayê qeza: 8 mirî**

Li nêzîkî navçeya Bad Aîblîngê du trên li hev qelibîn. Di qezayê de herî kêm 8 kes mirin û gelek kes jî birîndar bûn.

BERLÎN (AA)- Li navçeya Bad Aîblînga Almanyayê du trên li hev qelibîn. Hat ragihandin ku li gor agahiyên ewil di qezayê de herî kêm 8 kes mirin û 150 kes jî birîndar bûn.

48 Rûdaw, Kurdistanê zêdetirî 18 milyon bermîlên petrolê firot,12yêÇileya 2016an, http://rudaw.net/kurmanci/business/110120162, ( Dema Gihanê: 11.02.2016).

Hêzên ewlehiyê daxuyandin ku serê sibê du trên li hev qelibîn, 8 kes mirin û 150 kes jî birîndar bûn.

Di çapemeniya Almanyayê de jî hat gotin ku di qezayê de herî kêm 8 kes mirin û 150 kes jî birîndar bûn. Cihê ku qeza lê çêbû 60 kîlomêtro dûrî Munîhê ye. Rayedaran firoke şandin cihê bûyerê û xeta ku qeza lê çêbû jî trênên Merîdîan niha seferan dikin.[49]

### 1.4.4. Nûçeyên Derve

Nûçegihan bi bûyerên derve re eleqedar dibe û rûdanên ku li derve diqevimin dişopîne. Rojnamegerê nûçeyên derve divê zimanên biyanî bizanibe ku ajans û saziyên çapemeniyê yên biyanî teqip bike û derbarê rûdanan de agahdar bibe, nûçeyan binivîse û karê xwe bidomîne. Nûçegihanê nûçeyên derve li gor rojnamegerên din zêdetir wergerê dikin û ji bo vê jî divê zimanê ku dê jê nûçeyê wergerînê pir baş bizanibe. Di nûçeyên wergerê de divê li ser wateyê bisikine,  yekûyek wergerê neke û heta ji dest bê bi hevokên kurt binivîse ku xwendekar fehm bikin.

Mînak;

**Li Amerîkayê bager: 19 mirî**

Li Amerîkayê ji ber berf û bagerê 19 kes mirin, li 11 eyaletan rewşa derasayî hat îlankirin.

NEW YORK (AA)-  Li Amerîkayê li aliyê rojhilatê û bajarên hundirîn ji ber ku berf zêde barî û bager çêbû, 19 kes mirin. 11 eyaletên DYAyê ji ber berf û bagerê rewşa derasayî hat îlankirin û li van bajarên ku bi giştî 80 milyon kes dijîn, jiyan serobino bû. Li Arkansas, Carolînaya bakur, Kentucky, Ohîo, Tennessee û Vîrgînîayê ji ber qeşa û qezayên trafîkê 13 kes mirin.

Li New Yorkê 3 kes dema ku berf paqij dikirin, li Vîrgînîayê 2 û li Marylandê jî kesek ji ber sermayê mirin. Ji ber bagerê li 13 eyaletan ceyran tune û 10 hezar seferên balafiran jî hatin betalkirin. Li New Jersey û New Yorkê jî seferên otobês û metroyan hatin betalkirin, ajotina wesayîtan hat qedexekirin.[50]

---

[49] Anadolu Ajansı, Li Almanyayê qeza: 8 mirî, 9ê Sibata 2016an,http://aa.com.tr/kk/dinya/almanyay%C3%AA-qeza-8-mir%C3%AE/518551, (Dema Gihanê: 11.02.2016).

[50] Anadolu Ajansı,Li Amerîkayê bager: 19 mirî, 24ê Çileya 2016an, http://aa.com.tr/kk/dinya/li-amer%C3%AEkay%C3%AA-bager-19-mir%C3%AE/509727, (Dema Gihanê: 11.02.2016).

### 1.4.5. Nûçeyên Dîplomasiyê

Dîplomasî ji têkîliyên di navbera dewletan pêk tê û gava ku di navbera dewletan de şer, nîqaş an pirsgirêkên li ser aborî, çandî û mijarên din derdikevin xebatên dîplomasiyê destpê dikin da ku çareseriyêk bê dîtin.

Di vê pêvajoyê de nûçêyên dîplomasiyê derdikevin pêş û bala her kesî li ser wan nûçeyen dimîne. Di nav nûçeyan de lazime nûçegihan zêdetir bi baldarî tevbigere. Di nûçeyên dîplomasiyê de xeletî encamên girîng derdixin û dibe ku bibin sedema nîqaşên din jî. Carina li welatekî derbarê dewletekî din de hin nûçe derdikivin. Ji ber vê jî rayedarên wê dewletê derbarê nûçeyê de ji rayedarên dewleta ku lê nûçe belav bûye daxuyaniyan dixwazin û bersivên tund didin. Ji ber van sedem û xesasiyetan ferze ku nûçegihan têgehên dîplamasiyê jî baş bizanibe.

Mînak;

**“Di mijara YPGê de fikra me û Tirkiyeyê wek hev nîne"**

Berdevkê Wezareta Karên Derve yê DYAyê Mark Toner di civîna çapemeniyê ya rojane de wiha got: "Em PKKê wek organîzasyoneke terorî dibînin û dihesibînin lê em dizanin ku YPG li Sûriyeyê li hemberî DAIŞê li ber xwe dide û em jî piştgiriyê didin vê hewla wan."

WASHINGTON (AA) - Berdevkê Wezareta Karên Derve yê DYAyê Mark Toner di civîna çapemeniyê ya rojane de got ku ew PKKê wek organîzasyoneke terorî dibînin û wiha pê de çû: "Em dizanin ku YPG li Sûriyeyê li hemberî DAIŞê li ber xwe dide û em jî piştgiriyê didin vê hewla wan."

- "Em qisawetên Tirkiyeyê fehm dikin"

Li ser pirsekê Toner wiha axivî: "Em PKKê wek organîzasyoneke terorî dibînin û dihesibînin lê em dizanin ku YPG li Sûriyeyê li hemberî DAIŞê li ber xwe dide û em jî piştgiriyê didin vê hewla wan.

Serokomar Recep Tayyip Erdoğan gotibû ku DYA hêzên ku li herêmê ne ji hev dernaxe û ji ber ku "Hûn vana nas nakin herêm di nav xwînê de ye" û ev yek hat bibîrxistin. Toner jî li ser vê bîranînê wiha axivî: "Em şirîk û mutefîk in. Bi rayedarên Tirkiyeyê re hevdîtinên pir cidî û girîng hatin kirin. Em qisaweta wan a ku ji ber PKKê peyda dibe fehm dikin lê bi rastî di mijara YPGê de em wek hev nafikirin."

Toner bangî PKKê kir û ji wan xwest ku bila demildest dev ji êrîşên xwe yên ku li Tirkiyeyê didomîne berde û wiha pê de çû: "Rayedarên Tirkiyeyê xwediyê wê berpirsyariyê ne ku bersiva êrîşên PKKê bidin. Lê hêviya me ew e ku ev gengeşî dakeve û li ser maseya lihevkirinê careke din bên bal hev."[51]

### 1.4.6. Nûçeyên Perwerdehiyê

Kar û barên perwerdehiyê ji zarokan bigrin heta kal û pîran di civakê de her kesî aleqeder dike. Ji bo vê jî biryarên ku derbarê perwerdehiyê de tên dayîn û paşê dikevin rewacê bala her kesî dikşîne û ji ber vê çendê jî nûçeyên perwerdehiyê him di rojname û him jî di saziyên çapemeniyê yên din de cihekî girîng digrin.

Rojnamegerên ku li ser perwerdehiyê dixebitin heke li paytextê bin bi wezareta perwerdehiyê re aleqedar dibin û di avahiyên wezaretê de ji aliyê wezaretê ve ji bo wan rojnamegeran cihekî taybet tê amedekirin. Nûçegihan, qanûn û biryarên ku ji aliyê wezaretê ve tên amedekirin bi baldarî dişopînin û paşê midûrê xwe agahdar dikin û wan rûdanan diweşînin. Îro li paytext Enqereyê li wezarata perwerdehiyê gelek nûçegihan dixebitin û li ser navê saziya ku dixebitin nûçeyan parve dikin.

Mînak;

**Li Swîsrayê xwendekarên Kurd bi bawernameyên Kurdî dilxweş bûn**

Dibistanên ziman û çanda Kurdî yên li Swîsrayê bawernameyên dewreya yekem li xwendekaran belav kirin.

ZURÎX -Omer Faruk Baran-Xwendekarên dibistanên ziman û çanda Kurdî yên li Swîsreyê, bawernameyên xwe yên dewreya yekemîn a sala perwerdehiya 2015-2016an ji destê mamosteyên xwe girtin. Li gorî pergala perwerdehiya Swisrayê wê zarok bawernameyên xwe yên dewreya yekem ji mamosteyên xwe yên swîsrî re bibin û deqên ku ji hindekariya Kurdî girtine, wê bikeve ser bawernameya wan a dibistana swisrî.

Li sê kantonên sereke Zurîx, Basel û Bernê bi dehan zarokên Kurd diçin dibistanên Kurdî û hînî zimanê Kurdî dibin. Komeleya Hîndekariya Kurdî ya ku di sala 2008an de hatiye damezirandin û di encama xebateke bi israr de li Swîsrayê hatiye

[51] Anadolu Ajansı, Di mijara YPGê de fikra me û Tirkiyeyê wek hev nîne, 11yê Sibata 1916an, http://aa.com.tr/kk/tirkiye/di-mijara-ypg%C3%AA-de-fikra-me-%C3%BB-tirkiyey%C3%AA-wek-hev-n%C3%AEne/519433, (Dema Gihanê: 11.02.2016).

fermîkirin kursên zimanê Kurdî ji bo zarokan û mezinan li dar dixe. Zarokên Kurd li her sê kantonan dersên Kurdî bi awayekî fermî dibînin.

Rêvebira Komeleya Hindekariya Kurdî Fatoş Koyuncuer li ser komeleyê ji Sputnik Kurdistanê re axivî.

Koyuncuerê got: 'Komelaya Hîndekariya Kurdî ji sala 2008an vir de xizmetê dide. Komele ji sala 2014an vir de karê hîndekariya Kurdî di nava sazûmana hîndekariya Swîsrayê de bi awayekî fermî li bajarên Basel, Bern û Zurîxê dike. Ji bo sala hîndekariyê ya 2015-2016an zarokên dibistanên Kurdî roja çarşem û şemiyê ji destê mamosteyên xwe bawernameyên dewreya yekem girtin. Em mamoste, malbat û zarok tev kêfxweş in ku wê di bawernameyên swisrî de deqên hîndekariya Kurdî jî cih bigrin û ew ê bandoreke erênî li ser deqên giştî bikin.'

Koyuncuerê bal kişand ser kêmbûna hejmara xwendekarên Kurdî û wiha got: 'Rêvebirên komeleyê ji can û dil li ber xwe didin ku zêdetir malbat zarokên xwe bişînin hîndekariya Kurdî. Her çiqas dewlata Swîsrayê derfet û destekê dide zimanê Kurdî jî, mixabin malbatên Kurd ji wan derfetan sûd nagirin. Hejmara zarokên ku tev li qursên komeleyê dibin nagihêje 100î. Em ji komele, sazî û rêxistinên Kurdistanî hêvî dikin ku alîkarî û destekê bidin kar û xebata hîndekariya Kurdî.[52]

### 1.4.7. Nûçeyên Tenduristiyê

Ev cûre nûçe ji bûyer û rûdanên ku tenduristiyê eleqedar dikin pêk tê û nûçegihan jî li ser mijarên tenduristiyê disekine û dibe pisporê nûçeyên tenduristiyê. Derbarê tenduristiyê de ji aliyê wezareta tenduristiyê ve gelek qanûn tên amedekirin û paşê li meclisê tên qebûlkirin. Ji bilî van gelek nexweşî û derbarê nexweşiyan de dermanên nû derdikevin û nexweş bi wan tedawiyê dibînin. Nûçegihanê tenduristiyê divê li ser hemû hurgiliyên tenduristiyê bisekine û ji nêz ve bişopîne.

Li Tirkiyeyê rojmagerên ku geşedanên tenduristiyê dişopînin li wezarata tenduristiyê disekinin û pêwendiya wan a bi rayedaran re xurt e. Nûçegihan him bernameyên wezîrê tenduristiyê teqîp dikin him jî bi doxtor û pisporên tenduristiyê re dikevin têkiliyan û pispor û dixtoran wekî çavkaniyên nûçeyan bikar tînin. Doxtor û

[52] Sputniknews, Li Swisraye xwendekaren Kurd bi bawernameyen Kurdi dilxwes bûn, 22yê Çileya 2016an, http://krd.sputniknews.com/cihan/20160122/1716967/Li-Swisraye-xwendekaren-Kurd-bi-bawernameyen-Kurdi-dilxwes-bin.htm, (Dema Gihanê: 11.02.2016).

pispor jî bi saya nûçegihanan karûbar û xizmetên ku dikin radigihînin raya giştî. Têkiliya nûçegihan û rayedaran bi vî şiklî li ser parvekirina nûçeyan didome û em jî ji rûdanên tenduristiyê agahdar dibin.

Mînak;

**Nexweşiya çolyakê ji çi çêdibe?**

WAN – JINHA- Li gorî daneyan li Wanê heta niha 10 hezar kes bi nexweşiya çolyakê ketine. Doktor Mehmet Fatîh Ozbayderbarê nexweşiya çolyakê de agahî da û diyar kir ku nexweşiya çolyakê ya ku dermanê wê tune ji ber proteîna Gluteînê rû dide.

Li herema Serhedê nexweşiya ku herî zêde derdikeve pêşberî mirovan nexweşiya çolyakê ye. Li gorî lêkolina Xwendekarên Zaningeha Yuzuncu Yilê ya Wanê li bajarê Wanê heta niha 10 hezar kes ji ber nexweşiya çolyakê serî li nexweşxaneyan dane. Doktor Mehmet Fatîh Ozbay a ku di li beşa nexweşiyên hundirîn dinêrederbarê nexweşiya çolyakê de axivî û da zanîn ku gelek welatî ji ber nexweşiya çolyakê serî li wan didin.

Ozbay got ku sedema nexweşiya çolyakê bi kêmbûna ‘Gluteînê’ derdikeve pêş û da zanîn ku ji ber ku laşê mirovan bertek nîşanî proteînan dide ev nexweşîn derdikeve holê. Ozbay anî ziman ku proteîna Gluteînê di nav ceh, genim, baçik û hwd din de cih digire û wiha axivî: “Nexweşiya Çolyakê jî di nav van xwarînan zêde ye. Ev nexweşî herî zêde di roviyên zirav de xwe dide der. Di demên nexweşiyê de roviyên zirav stûr dibin û xwarina ku tê xwarin nayê ferikandin.”

**-Proteîna gluteînê**

Ozbay nîşaneyên nexweşiya çolyakê wiha anî ziman: “Dema ku zikêşê bi mirovan girt, xwêdan, emel, qelsbûn, bêxwînî, felç, werm pêk hat û dema hestiyên mirovan êşiyan û bêteqat man ev nîşaneyên nexweşiya çolyakê ye. Dermanê vê nexweşiyê hêj nehatiyê dîtin. Em tenê nexweşên ku tên cem me re pêşniyara ku bila ji xwarinên ji genim çêdibin dûr bikevin dikin. Kesên ku bi vê nexweşiyê dikevin tenê dikarin bi ar’a bê Gluteînê bixwin. Her wiha nexweşiya çolyakê ji bo jinên ducanî jî gelek xetere ye. Ji ber ku çolyak dibe sedema nezayîna zarokan.”

**-Xwarina bê genim**

Ozbay diyar kir ku nexweşiya çolyakê bi gelemperî ji ber genetîkê derdikeve holê û wiha pê de çû: “Ev nexweşî genetîk e. Piranî ji dayikê digihije zarokan, lê gelek caran di nav xwînê de jî çêdibe.” Ozbay pêşnîşarên xwe yê xwarin û vexwarinên ji bo nexweşiya çolyakê wiha rêz kir: “Kesên ku ji bo xwe ji nexweşiya çolyakê rizgar bikin divê di serî de ji aliyê xwarinê de gelek baldar bin. Em wekî doktoran dikarin çend xwarin pêşniyar bikin. Kesên ku bi nexweşiya çolyakê ketin divê xwe ji xwarinên ji genim çêdibin dur bixin. Kesên ku bi nexweşiya çolyakê ne, dikarin birinc û arê şamikan bixwin.”[53]

**1.4.8. Nûçeyên Herêmî**

Li Tirkiyeyê û dinyayê ji bilî saziyên çapemeniyê yên neteweyî, gelek saziyên herêmî jî hene ku karên rojnamegeriyê dikin. Rojnameyên herêmî bêtir li ser bûyerên herêma xwe disekinin û cih didin wan nûçeyan. Hin rojnameyên neteweyî jî cih didin malperên heremî û bi vî awayî nûçeyên herêmî parve dikin. ‘Hurriyet Ankara’ û ‘Sabah Ankara’ hin ji wan rojnameyan in. Gelek rojname li gor rewşa aboriya xwe wek Sabah û Hurriyetê malperên ku ji nûçeyên herêmî pêk tên bi rê ve dibin.

Edîtorên nûçeyên herêmî li gor nirxa nûçeyê hereket dikin û heke bûyera ku qewimiye bi tenê herêm ân bajarê li herêmê eleqedar bike vê nûçeyê di malperên herêmî de diweşînin. Lê heke ev nûçe bi nirxa xwe ve tesîreke mezin bike wê demê dibe ku bibe manşet ân sûrmanşêta rojnameyê jî. Divê rojnamegerê ku li ser bûyerên herêmî disekine vê baş zanibe; tişta ku nûçeya heremî û nûçeya giştî ji hev vetiqetîne nirxa nûçeyê ye. Heke nûçegihan an edîtor vê nirxê baş nizanibin dibe ku bibe sedama pûçkirina nûçeyê.

Em bibêjin ku li gundekî navçeyekê 3 zarok winda bûne. Gava ku nûçegihan ji vê bûyerê agahdar bû û bibêje ‘ev bûyer li gund bûye tu kesî eleqedar nake’ dê bibe sedema xeletiyeke mezin. Divê demildest vê bûyerê bi midurê xwe re parve bike û paşê li gor agahiyên rast nûçêyê binivîse.

Çimkî tişta ku nûçeyê ji herêmîbûnê derdixe û dixe meseleya neteweyî nirxa nûçeyê ye. Ji bo wê lazim e ku nirxa nûçeyê ji aliyê nûçegihan ve pir baş bê fehmkirin.

Mînak;

---

[53] Azadiya walat, Nexweşiya çolyakê ji çi çêdibe?, 9ê Sibata 2016an, http://www.azadiyawelat.info/?p=37374, (Dema Gihanê: 11.02.2016).

**Li Agiriyê berf bû sedema qezayan**

Li Elaşgira navçeya Agiriyê ji ber ku berf barî qeza çêbûn.

AGRI (AA) - Li Elaşgira navçeya Agiriyê ji ber ku berf barî qeza çêbûn û gelek wesayît welgeriyan.

Ji ber ku berf barî li ser rêya Agirî û Erziromê li nêzîkî gundê Aydintepeyê rê qeşa girt. Şofêr li bendê nebûn ku berf bibare û rê qeşa bigre. Ji ber vê tevdîrên xwe nedîtin.

Hin wesayît ji rê derketin û qeza kirin. Di qezayan de hin welatî birîndar bûn û hin wesayîtan jî xisar dît.

Birîndar rakirin nexweşxaneyan.[54]

### 1.4.9. Nûçeyên Werzîşê

Gelek însan ji bo şahî û hengê bi werzîşê re eleqedar in. Futbol, hentbol, basketbol, voleybol û bez hin ji beşên werzîşê ne û nûçeyên ku derbarê rûdanên werzîşê de derdikevin ji aliyê temaşevanan ve ji nêz ve tên şopandin. Bi taybetî futbol di nav wan şaxan de bûye sektora aboriyê ya herî mezin û li hemû dinyayê pêşve çûye. Ji bo vê jî di saziyên çapemeniyê de malper an bernameyên werzîşê di serî de cih digrin û di her saziyên çapemeniyê de servîsa werzîşê hatiye damezrandin.

Nûçegihanên werzîşê jî li gor pisporiya xwe li ser futbol, basketbol û çeqên werzîşê yên din disekinin û nûçeyan diweşînin. Di nûçeyên werzîşê de jî hin têgeh û rêgez hene û divê rojnamegerên werzîşê wan têgeh û rêgezan baş bizanibin.

Wek mînak divê nûçegihan di futbolê de têgehên wek ofsayt, faul, korner, futbolîstê parastinê, golvan, û stoperê bizanibin da ku di nûçêyên de xeletiyan nekin.

Di rojeva nûçêyên werzîşê de bi taybetî xebatên tîmên futbolê cih digrin û rojeva werzîşê diyar dikin. Li Tirkiyeyê tîma Fenerbahçe, Galatasaray û Beşîktaşê; li dinyayê jî tîma Bercelona Real Madrid di serî de gelek tîm hene ku bala her kesî dikşînin. Ji bo ku futbol li dinyayê bûye lîstika herî balkêş saziyên çapemeniyê jî ji bo her tîmî nûçegihanekî wezîfedar dikin û ji wan nûçegihanan re jî dibêjin nûçegihanê Fenerbahçeye, nûçegihanê Galatsarayê ân jî yê Beşîktaşê. Ji bo şopandina van tîman jî ev gotin derketiye pêş.

[54] Anadolu Ajansı, Li Agiriyê berf bû sedema qezayan, 9ê Qanûna 2015an, http://aa.com.tr/kk/jiyan/li-agiriy%C3%AA-berf-b%C3%BB-sedema-qezayan/470745, (Dema Gihanê:11.02.2016).

Mînak;

**Barcelonayê 4 gol avêtin**

Navenda Nûçeyan- Tîma Barcelonayê li stada Nou Campê pêşwaziya tîma Grandayê kir û bi skora 4-0 ew têk bir.

Lîstikavanê Barcelonayê yê navdar Lionel Messi di xuleka 8emîn de deriyê golan vekir. Lîstikvanê arjantinî piştre gola xwe ya duyem jî avêt yekem beşa lîstikê ya wê skorê bidawî hat.

Di beşa duyem a lîstikê de jî tîma Barcelonayê bi ser tîma hevrîka xwe Grandayê de çû û her dîsa Messi di xuleka 58emîn de gola xwe ya seyemîn jî avêt.

Piştre lîstikvanê Barcelonayê yê bi navê Neymar jî di xulaka 83yemîn de goleke avêt û lîstik bi skora 4-0 bidawî hat.

Bi vê encamê puanên Barcelonayê di lîga Îspanyayê de gihîştin 42 û bû tîma sereke.[55]

**1.4.10. Nûçeyên Çand û Hunerê**

Bajarên mezin di serî de li gelek cihan xebatên çand û hunerê tên kirin û welatî jî li gor keseyatî û meraqa xwe diçin wan bernameyan temaşe dikin. Xebatên sînema, şano, pêşangeh, resim, konser, muzîk, edebiyat û semînerên cûrbicûr her tim tên kirin û nûçeyên derbarê wan de jî di rojname û televîzyonan de cih digrin.

Sînema jî wekî futbolê li dinyayê bûye sekteroke mezin û bi pereyên giran dimeşe. Fîlmên nû yên xwemalî û biyanî her hefte dikevin gîşeyan û bi milyonan însan li wan temaşe dikin. Ji bilî aktîrîstên sînemayê, stranbêjên navdar ên navneteweyî û herêmî di konsêran de derdikevin pêşberî hezkiriyên xwe û kilaman dibêjîn, direqisin û bi coş ciwanan direqisînin.

Di salonan de şanô, di mekanên dîrokî de pêşangeh û çalakiyên din her tim bala însanan dikşînin. Ji bo vê jî rojname û televîzyon her tim cih didin wan nûçeyan û bi vî awayî jî xizmetê didin xwîner, temaşevan û aboneyên xwe.

Mînak;

---

[55] Rûdaw, Barcelonayê 4 gol avêtin, 9ê Sibata 2016an, http://rudaw.net/kurmanci/sports/09012016, (Dema Gihanê: 11.02.2016).

**Baxê Babêmin li Dû Festîvalên Cîhanî de tê Pêşkêşkirin**

BASNEWS - Kurte fîlma ‘’Baxê Babêmin’’ ya nivîs û derhênana, derhêner Şivan Etûf li dû festîvalên navnetewî li Amerîkayê tê pêşkêşkirin.

Kurte fîlma sinemakarê Kurd Şivan Etûf, a bi navê Baxê Babêmin baldikşîne ser helbesteke Mevlana Celaleddînê Rumî û bi beşdariya dû festîvalên navnetewî dikeve pêşbirkê. Festivala kurte fîlmên ‘’TEXAS ULTİMATE’’ li vilayeta Texasê wê bê pêşkêşkirin.

Ev festival yek ji wan festîvalane ku cîhanî ye û kurte fîlmên serkeftî wek xelata sînemayê ya Oscar tê zanîn.

Herwaha ev fîlma Kurdî 13 deqîqe ye, bi beşdariya navnetewî ya di meha adarê de wê bikeve pêşbirka serekî ya montajê jî ku festîvaleke navneteweyî ye, li wilayeta Delaware di Pêşbirka ‘’DEPTİH OF FILD’’ de jî wê cih bigre.

Baxê Babêmin bi sponsoriya serekî ya Hotêl Ramada ku li bajarê Silêmaniyê ye li Herêma Kurdistanê hatiye çêkirin û bi rêya şîrketa I love Fîlm di asta cîhanê de tê belavkirin. Di yekemîn beşdariya xwe ya pêşbirka serekî kurte fîlmên ‘’Muhir Gulf Short’’ a 12 mîn a navnetewî li Dubaî hate pêşkêşkirin.[56]

**1.4.11. Nûçeyên Magazînê**

Magazîn ji peyva ‘mahzen’ a Erebî li ser Endilûsa Emevî ji Spanyayê derbasî zimanê Frensî bûye. Mahzen, cihê ku lê tişt tên depokirin e û bi Frensî jî tê wateya dikanê. Yanê cihê ku gelek tişt lê tên firotin e. Têgeha magazînê, tê wateya weşana ku gelek agahiyan di xwe de dihewîne jî. Ev mane, yanê weşana ku gelek agahîyên di nav xwe de dihewîne ji peyva dikana ku gelek tişt tên firotin peyda bûye.[57]

Îro têgeha magazînê tê wateya cûreyeke nûçeyê û weşanê. Weşanên Magazînê ji gelek mijarên cûrbicûr û rengîn û nûçeyên bi wêne û dîmenan pêk tê. Nûçeyên magazînê piranî li ser jiyana kesên navdar ên wekî aktîrîs, manken, hunermend, siyasetmedar, werzîşvan, malbatên dewlemend, cihên şahiyê, hatiye avakirin. Ew nûçe

---

[56] BasNews, Baxê Babêmin li dû festîvalên cîhanî de tê pêşkêşkirin, 11yê Sibata 2016an, http://www.basnews.com/index.php/kr/culture-arts/258311, (Dema Gihanê:11.02.2016).
[57] Erdal Dağtaş, **Türkiye'de Magazin Basını**, Ankara: Ütopya Yayınevi, 2006, r. 101. (Ji pirtuka Murat Belge, Tarihten Güncelliğe, İstanbul: İletişim Yayınları, 1997, r. 373an hatiye hildan)

him însanan agahdar dikin him jî wan kêfxwaş dikin. Ji bo vê jî li hemû dinyayê mijarên magazînê balkêş in.

Wek mînak têkîliya cinsî ya di navbera Serokê berê yê DYAyê Bill Clinton û Monîca Lewînsyê de li hemû dinyayê bû mijara sereke û di manşetên rojnameyan de cih girt. An jî jiyana Prenses Dîanaya ku di qezayekê de mir jî wek nimûneyeke nûçeyên magazînê ye û vê bûyerê jî li hemû dinyayê di nûçeyan de cih girt.

Nûçeyên magazînê di rojname û televîzyonan de wek nûçeyên aborî û polîtakayê di kategoriyeke cûda de tên hesibandin û di saziyên çapemeniyê de jî servîsên magazînê hatine damezrandin. Di servîsên magazînê de gelek rojnameger bi tenê li ser magazînê dixebitin û nûçeyan diweşînin. Nûçegihanên magazînê ji bo ku xwe bigihînin agahiyan divê çavkaniyên wan zêde bin. Divê pêwendiya nûçegihan bi kesên navdar ên li ber çawan re hebe û bi hawirdorên wan re her tim bişêwire. Ji bilî wan divê nûçegihanên magazînê, cihên wek xweringeh û şahiyê jî bizanibin ku kesên navdar bi hevalên xwe re diçin wir û herwiha lazim e pêwendiya wan bi xwediyên wan deran re jî xurt be ku derbarê jiyana wan de agahdar bin.

### 1.4.12. Nûçeyên Hawirdorê

Li dinyayê bi taybetî jî li welatên Ewropayê xesasiyeta paqijiya hawirdorê gihîştiye asteke bilind û civak di warê perwerdehiya paqijiya kolan û xwezayê de giringiyê dide xebatên saziyên sivîl û zanîngehan. Îro li bajarên mezin û qerebalix ku di sanayî û bazirganiyê de pêşve çûne pirsgirêka paqijıya hawirdorê bûye sedema bihayê zêde û ji bo paqijiya herêm û xwezayê jî bi sermayedanîna teknolojiyê gelek mesref tê kirin. Ji ber ku paqijiya xwezayê rasterast tenduristiya gel eleqedar dike, rûdanên di vî warî de jî bala her kesî dikşînin. Di encama wan xebat û xesasiyetan de saziyên çapemeniyê jî ji bo rûdanên derbarê hawirdorê de rojnamegerên pispor wezîfedar kirine û wan nûceyan diweşînin. Rojnameyên ku li ser hawirdorê disekinin divê xabatên ku di zanîngehan de tên kirin ji nêz ve bişopînin û derheqê wan xebatan de jêhatî bin. Ji aliyê din ji ber ku qirêjiya hawirdorê tesîreke neyînî li tenduristiyê dike divê bi pisporên tenduristiyê yên gel re jî têkîldar bin û hişyariyên ku pispor didin bigihînin welatiyan. Li ser paqijiya gel şeradarî, şaxên saziyên dewletê yên ku bi wezarata karên hawirdorê ve girêdayîne jî dixebitin û rojnameger divê bi wan saziyên dewletê re jî têkildar bin. Ji bilî

van ji ber ku bi taybetî fabrîkayên giran xwezayê qirêj dikin lazim e nûçegihan li ser karxaneyên pîşezayiyê jî bisekine ka gelo xwezayê qirêj dikin an na?

Mînak;

**Diyarbekir dê bikeve nav lîsteya Mîrateya Cîhanê ya UNESCOyê**

Ji bo ku Diyarbekir bi sûrên xwe û Baxçeyên Hewselê bikeve nav Lîsteya Mîrateya Cîhanê ya UNESCOyê, Meclisa Şaredariya Mezin di Projeya Geliyê Dîcleyê de biryara revîzeyê da. Em dê destûr nedin ku li Geliyê Dîcleyê avahî bên çêkirin.

DIYARBAKIR (AA) -Seroka Şaredariya Mezin a Diayrbekirê Gultan Kişanakê got ji bo ku Diyarbekir bi sûrên xwe û Baxçeyên Hewselê bikeve nav Lîsteya Mîrateya Cîhanê ya UNESCOyê, Meclisa Şaredariya Mezin di Projeya Geliyê Dîcleyê de biryara revîzeyê da.

Kişanakê di civîna "Plana Stratejîk a 2015-2019an a Diyarbekirê" ya ku li Hêwana Meclisa Şaredariya Mezin de hat li dar xistin de axivî û destnîşan kir ku bi saya ew cihên ku qal dikin Diyarbekir dê di lîsteya cîhanê de cî bigire.

Kişanakê diyar kir ku dê di lîsteya firmayên mezin ênderbarê tûrîzmê de yên li çar aliyên cîhanê û operatorên tûrîzmê de Diyarbekir jî cî bigire û wiha axivî: "Tûrîst dê bêtir bên Diyarbekirê. Hatina tûrîstan dê bibe sedem ku esnafên me bêtir bixebitin û dahata tûrîzmê ya bajêr zêde bibe. Ev xebat dê heta hezîrana sala pêşiya me berdewam bike û UNESCO dê biryara xwe bide. Em jî dê hemû xebatên xwe yên nasandinê, xebatên derbarê heyînên me yên dîrokî û çandî li gor vê yekê bikin."

-Em dê kanên qûmê ji hewzeya Robara Dîcleyê derxînin

Kişanakê bal kişand ku divê di vê çarçoveyê de Projeya Geliyê Dîcleyê bê revîzekirin û got ku hin xebatên ku di vê projeyê de pêş dibînin ne li gor krîterên UNESCOyê ne.

Kişanakê got ku ji ber vê yekê meha borî biryar dan ku projeyê revîze bikin û wiha axivî: "Ji bo ku Diyarbekir bi sûrên xwe û Baxçeyên Hewselê bikeve nav Lîsteya Mîrateya Cîhanê ya UNESCOyê, Meclisa Şaredariya Mezin di Projeya Geliyê Dîcleyê de biryara revîzeyê da. Em dê destûr nedin ku li Geliyê Dîcleyê avahî bên çêkirin. Me komîsyonek ava kir ku perava Robara Dîcleyê diyar bike. Li her du aliyên peravê herî kêm cihên şîn ên kamûyî yên bi qasî 300 metekareyî, rêyên meş û bisîkletan dê bên

çêkirin. Em dê destûr nedin tu xebatên ku zirarê didin geliyê me. Xebatên me berdewam dikin. Me soz da ku em Robara Dîcleyê wekî hewzeyê bikin plana mastirê. Di vê çarçoveyê de kanên qûmê dê ji hewzeya Robara Dîcleyê bên derxistin. Ev robar mîrateya çandî û dîrokî ya hemû gelê me ye. Parastina vê robarê peywira me hemûyan e."[58]

### 1.4.13. Nûçeyên Teknolojî û Vejenê

Di vê sedsala me de teknolojî û vejen bi hev ve girêdayîne û yek ji yekî nayê veqetandin. Vejen ji bo teknolojiyê çavkaniya sereke ye û ji kompîtirên ku di destê me de ne bigrin heta tirimbêla ku em lê siwar dibin, bi saya vejenê em dikarin bikarbînin. Ji ber vê jî şerên navdewletî û nîqaşên aboriyê bi taybetî li ser vejen û rûdanên teknolojiyê derdikevin û di navbera dewletên mezin de dibin sedema reqabetê. Xetên vejenê yên xwezayî û sermayegiredayîna li ser vejenê bûne çavkaniya hatiniya aboriya dewletên mezin. Îro ev sektor wisa pêşve çûye ku aboriya şîrketên vejenê yên navneteweyî ji butçeya gelek dewletan qat bi qat mezintir e û ev şîrket dikarin gelek dewletan bikirin. Dewletên wek DYA û YAyê polîtîkayên xwe yên derve û hundir li ser çavkaniyên vejen û sermayedanîna teknolojiyê ava kirine.

Ji ber vê hindê nûçeyên vejen û çavkaniyan di ajans û saziyên çapemeniyê de wek beşeke edîtoriya serbixwe hatine avakirin. Rojnamegerên ku di vê beşê de dixebitin lazime ku zimanê biyanî û têgehên teknolojiyê bizanibin da ku rûdanên navnateweyî bişopînin û ji peyman û xebatên zanîngeh, şîrket û dewletan ên derheqê teknolojî û vejenê de agahdar bin û bigihînin xwendevan û aboneyên xwe.

Mînak;

**Erebistan û Venezuela li Ser Nirxê Petrolê Biryar Didin**

Navenda Nûçeyan – Erebistana Siûdiye û Venezuela dixwazin nirxê petrolê rêk bixin.

Wezîrên Petrolê yên Erebistana Siûdiyê û Venezulayê dixwazin buhayê petrola xam di bazarên cîhanê de rêk bixin û bo vê mebestê jî dixwazin ligel endamên Rêxistina

---

[58] Anadolu Ajansı, Diyarbekir dê bikeve nav lîsteya Mîrateya Cîhanê ya UNESCOyê, 11yê Sibata 2016an,https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t =Arsiv, (Dema Gihanê:11.02.2016).

Welatên Hinardekarê Petrolê (OPEC) û welatên din ên hinardekarê petrolê wê mijarê gotûbêj bikin.

Hewlên Erebistan û Venezuelayê di demekê de ne ku buhayê petrolê roj bi roj di bazarên cîhanî de ber bi kêmbûnê ve diçe.

Wezîrê Petrolê yê Erebistana Siûdiyê Elî Neîmî îro 7ê Sibatê bi mebesta gotûbêjkirina rêkxistina nirxê petrolê ligel Wezîrê Petrolê yê Venezuelayê Eulogio Del Pino li Riyaz a paytexta Erebistanê civiya.

Piştî civînê Elî Neîmî ragihand, civîna me serkeftî bû.

Neîmî herwiha got: “Di civînê de me behsa çawaniya rêxistina nirxê petrola xam di bazarên cîhanê de û herwiha behsa encamên civînên Wezîrê Petrolê yê Venezuelayê ligel rayedarên çend welatên din,  ên li ser pirsa rêxistina nirxê petrolê jî kir.”

Erebistan û Venezuela du ji mezintirîn welatên berhemhênerê petrolê di cîhanê de ne û %40ê petrola cîhanê ji aliyê her du welatan ve hinareyî bazarên cîhanê tê kirin.

Nirxê yek bermîlê petrola OPECê niha derdora 30 dolarî ye. Ew yek di demekê de ye ku pêştir nirxê her bermîlê petrolê zêdetirî 110 dolarî bû.

Ji ber kêmbûna buhayê petrolê, welatên ku petrolê berhem tînin, rastî kirîzek mezin a darayî û aborî hatine û bûdceya wan rastî kêmiyê hatiye.[59]

[59] Rûdaw, Erebistan û Venezuela Li Ser Nirxê Petrolê Biryar Didin, 7ê Sibata 2016an, http://rudaw.net/kurmanci/business/07022016, (Dema Gihanê: 11.02.2016).

# BEŞA DUYEMÎN

# SERNAV Û BERHEVKIRINA NÛÇEYAN

## 2.1. DI NÛÇEYAN DE BIKARANÎNA SERNAVAN

Nûçe bê sernav nayên weşandin. Bi tenê nûçeyên flaş bê sernav tên weşandin. Bi taybetî jî ajans û televîzyon ewil nûçeyan bêsernav diweşînin û li gor hûrgiliyên nû jî naveroka nûçeyê di bin sernavekî de diweşînin.

Mînak;

Li Stenbolê qeza çêbû. Li gor agahiyên ewil gelek birîndar hene.

Heke rûdaneke wiha biqewime saziyên çapemeniyê ewil derbarê bûyerê de xwendevan û temaşvanên xwe agahdar dikin û paşê jî di bin sernavekî de hûrgiliyên bûyerê diweşînin.

Mînak:

Li Maltepeya navçeya Stenbolê du trimbêl li hev qelibîn û di qezayê de 2 kes mirin, 5 kes jî birîndar bûn.

Mînak;

**Li Stenbolê Qeza; 2 Kes Mirin, 5 Kes jî Birîndar Bûn**

İSTANBUL- Li Maltepeya navçeya Stenbolê du trimbêl li hev qelibîn û di qezayê de 2 kes mirin, 5 kes jî birîndar bûn.

Li gor agahiyan trimbêla bi plaqeya 24 DLK 54 ku Zana Qoserî (35) diajot û trimbêla bi plaqeya 06 AB 2235 ya ku ajokarê wê Nêçîrvan Kerkûkî (43) bû, li hev qelibîn.

Di qezayê de Qoserî û Kerkûkî bi ambûlansê rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Maltepeyê. Lê her du birîndar jî di rê de mirin.

Alî Bawer (18), Leyla Çiya (25), Mihemed Alî (55), Rênas Serhat (42), Îsa Alîko (26) jî li cihê bûyerê hatin dermankirin. Rayedarên tenduristiyê ragihandin ku rewşa birîndaran giran nîne.

Derbarê bûyerê de jî lêpirsîn dan destpêkirin.

### 2.1.1. Sernavê Sereke:

Ev sernav ji 3 an jî 6 peyvan pêk tê. Ji bilî nûçeyên ku wek flaş tên dayîn lazim e di her nûçeyê de sernav hebe û divê heta ku ji destê nûçegihan bê bi awayekî kurt bide. Sernavê sereke kurtasiya nûçeyê ye û derbarê mijarê de fikr û agahiyan dide xwendevanan. Ji ber vê peyama herî balkêş di xwe de dihevîne û divê di navbera sernav û naveroka nûçeyê de jî tu nakokî tune bin. Nûçegihan di sernav de cih nade fikrên xwe yên subjektîf û divê nûçeyê piçûk an mezin jî nîşan nede. Bi kurtasî divê sernav;

- Kurt be
- Balkêş be
- Bê fehmkirin
- Objektîf be
- Ji şîroveyan dûr be

### 2.1.2. Jorsernav

Li ser sernavê sereke tê nivîsîn û di heman demê de sernavê temam dike û ji 5-10 peyvan, hevokek û li gor sernav ji puntoyên piçûk pêk tê.[60]

### 2.1.3. Jêrsernav

Di bin sernavê sereke de cih digre. Derbarê naveroka sernav de bi hevokekê agahiyan dide. Li gor sernavê sereke û jorsernav bêtir bi pûntoyên piçûk tên nivîsîn.[61]

### 2.1.4. Sernavê Spot

Ji 15 û 20 peyvan pêk tê. Tîpên sernavê spot li gor tîpên metna nûçeyê bêtir bi puntoyên mezin tên amedekirin. Bi taybetî di bin sernav an jî jêrsernav de tên bikaranîn.[62]

### 2.1.5. Navsernav

Hin caran metnên nûçeyan bi mijarên ji hev cuda û nivîsên dirêj pêk tên. Bi taybetî di konferans an jî roportajan de gelek mesele tên rojevê, ji ber vê jî nûçe li ser gelek mijaran tên danîn. Ji bo ku xwendevan aciz nebin û bi hêsanî metna nûçeyê

[60] Girgin û Özay, **b.n.b.,** r. 89.
[61] Girgin û Özay, **b.n.b.,** r. 89.
[62] Girgin û Özay, **b.n.b.,** r. 89.

bixwînin di naveroka metnan de hin sernav hewce dikin. Ev sernav jî wek sernavê sereke lazim e kurt be û mijarên ku di nûçeyê de cih girtine ji hev veqetîne.

### 2.2. BERHEVKIRINA NÛÇEYAN

Karên rojnamegeriyê pir zehmet û zor e. Yên ku vî karî dikin divê him xwedan huner him jî jêhatî bin ku nebin sedema nepakî û neheqiyê. Ev pîşe ji bo manîpulasyon, propaganda û neyartiyê divê neyê bikaranîn û rojnameger jî divê her tim lêkolîner û baldar be ku nekeve nav defik, dek û dolaban.

Di vê çerçoveyê de beriya nivîsandina nûçêyê divê hurgiliyên agahiyan ji hin merhaleyan re derbas bibin ku nûçe nebe sedema nebaşiyê û ev nûçe bi awayekî rast bê nivîsandin û paşê bê weşandin.

Zanyarên nûçegihaniyê ji bo wan xesasiyatan 6 merhele dane pêş me û divê piştî wan merhaleyan nûçe bênê nivîsandin.

Ev merhale wiha ne;

1- Hilbijartin
2- Lêkolîn
3- Jinûvehilbijartin
4- Vebijartin
5- Danîna nûçeyê
6- Weşandin[63]

#### 2.2.1. Hilbijartin

Îro ji ber ku teknolojî zehf pêşve çûye parvekirin û ragihandina mijar û bûyeran jî pir hêsan bûye. Qezaya ku li gundekî dibe bi riya telefonên destan ên bikamera li her derê tê parvekirin. Berê ji bo wêne û dîmenan her kes li benda rojnamegerekî dima da ku qeza an şer û pevçûnan bikşîne û bigihîne raya giştî. Lê îro şert û merc guherîne û di destê her kesî de telefonên bi kamera hene û dikarin her tiştî bikşînin û parve bikin.

Geşedanên teknolojiyê her çend jiyan û şertên rojnamegeran hêsantir kiribe jî ev hêsanî her tim nabe sedama karên baş û pêkan e ku nûçegihan û berpirsyarên saziyên çapemeniyê bixin nav tengasiyê û zirarê jî bidin gel. Di civakê de gelek agahiyên derew

[63] Girginû Özay, **b.n.b.,** r. 55.

û qirêj di malperên civakî yên mîna facebook û Twittterê de cih digrin û ev jî dibin sedema xapîndina rojnamegeran.

Ji aliyê din ve îro hejmara saziyên wekî komele, partiyên siyasî, zanîngehan pir zêde bûne û ev sazî her tim xebat û çalakiyên xwe bi rojname an rojnamegeran re parve dikin da ku bên weşandin û di civakê de deng û navê wan derkevin pêş.

Ji bo van sedaman rojnameger divê her daxuyanî, çalakî, agahî û rûdanên ku diqevimin li gor nirxa wan şîrove bike û paşê biryarê bide. Lazim e rojnameger her tişt û agahiyên ku dibihîsê li gor nirxa nûçeyê şîrove bike û paşê li ser mijarê bisekine. Her wiha di merhaleyên amedekirina nûçeyan de hilbijartina mijarê pir girîng e.

### 2.2.2. Lêkolîn

Di parvekirin û weşandina nûçeyan de merhaleya duyemîn lêkolîn e. Nûçegihan divê li hûrgilîyên agahî û rûdanên ku berhev dike bikolê û serî li çavkaniyên xwe yên ewle bide û mijarê piştrast bike. Di vê merhaleyê de çavkaniyên rojnameger pir girîng in û divê çavkanî pispor an jî zanayên mijarê bin ku tiştên xelet dernekevin û neyên weşandin. Ji bilî çavkaniyan arşîva ku di destê nûçegihan de ye jî pir girînge û nûçegihan dikare ji arşîva xwe jî îstîfade bike.

### 2.2.3. Jinûve Hilbijartin

Di çêkirina nûçeyan de jinûvehilbijartin merhaleya sêyemîn e. Rojnameger ewil mijara nûçeyê hildijbêre, paşê lêkolînan li ser dike û agahiyên ku berhev kirine ji nûve şîrove dike, dinêrxîne û hildijbêre. Di vê merhaleyê de nûçegihan mijar û naveroka nûçeyê dinirxîne û ji nûve nûçeyê sererast dike. Piştî vê merhaleyê vebijartina nûçeyê dest pê dike.

### 2.2.4. Vebijartin

Merhaleya berhevkina nûçeyan hêdî hêdi ber bi danîna nûçeyê ve diçe. Di vê merhaleyê de nûçegihan him ji çavkaniyên xwe him ji arşîva xwe û him jî ji hawirdorê gelek hûrgiliyan berhev dike û dibe ku hin agahî kêrî rojnameger neyên û hin jî xelet an ne li gor nûçeyê bin. Ji ber van sedaman rojnameger divê tiştên ku ji bo nûçeyê berhev kirine hilbijbêre û agahiyên ku dê parve bike ji yên din veqetîne. Rojnameger tiştên ku hildijbêre divê di arşîva xwe de biparêze da ku di pêşerojê de ev agahî dîsa kêrî vê bên. Di vebijartinê de şikl û naveroka nûçeyê amede û diyar dibe.

### 2.2.5. Danîna Nûçeyê

Di nûçegihaniyê de merhaleya herî zehmet ev merhele ye. Danîna nûçeyê ji bo tesîr û nirxa nûçeyê zehf girîng e. Heke nûçeyeke girîng xelet bê danîn tu tesîrekê li ser kesî nake. Carna nûçeyeke ku bala kesî nakşîne heke bi awayekî baş û zelal bê danîn dibe ku bibe manşet û ji aliyê her kesî vê bê xwendin an temaşekirin. Ji bo vê jî divê nûçegihan biryareke rast bide ku wê nûçeyê li ser kîjan agahî û hûrgiliyên di destê xwe de çêbike. Heke rojnameger ne xwedî tecrûbe be dikare bi edîtor û midûrê xwe bişêwire paşê dest bi nivîsandina nûçeyê bike. Di vê merheleyê de lazime ku nûçegihan bersiva 3 Ç û 3 Kyê bide (Çi? Çima? Çawan? Kî? Kîngê? (Li) Ku derê?) û dest bi nivîsa nûçeyê bike.

### 2.2.6. Weşandin

De serdama ku em tê de ne şert û mercên weşandina wêne, dîmen û nûçeyan pir hêsan bûye. Hemu dezgehên çapemeniyê di nav xwe de reqebeteke dijwar dikin. Hemû rojnameger hewl didin ku pêşiyê wê nûçeyê bigihînîn dezgehên ku tê de dixebitin. Ev pêşbirk him ji bo rojnamegeran him jî ji bo dezgehên rojnamegeriyê derbasdar e. Ji bo vê jî weşandina nûçeyan pir girînge û nûçeyên ku hatine amedekirin divê di merheleya berhevkirina nûçeyan de zûtir bên weşandin.

## 2.3. DI NÛÇEYAN DE ÇAVKANÎ

Nûçe bi saya çavkaniyan tê amedekirin. Nûçê bê çavkanî nabin. Xezneya rojnamegeran ya herî mezin çavkaniya wî ye. Ji bo vê jî kîjan rojnameger xwedî çavkaniyên zêde be ew rojnameger ewqas jî serkeftî ye. Çimkî hejmar û qelîteya çavkaniyan dibe sedemên nûçeyên taybet û girîng ji bo rojnamegeran. Ji ber vê çendê divê nûçegihan heta ji destê wî bê bi her aliyan re têkildar be û hejmara nasên xwe zêde bigre da ku nûçeyên baş biweşîne.

Lê çavkanî bi hêsanî nayên berhevkirin. Di encama xebatên salan de ev yek pêk tê. Nûçegihan divê her tim pispor, siyasetmedar û navdarên din re biaxive û ji wan agahiyan hilde. Lê divê rojnameger bizanibe ne mecbûr e ku di nûçeyan de navên çavkaniyên xwe eşkere bike. Ji loma yek ji wezîfeya nûçegihanan jî ew e ku çavkaniyên xwe biparêze û wan ji dek û dolabên encama nûçeyan dûr bixe da ku her tim têkiliyên xwe biparêze. Heke di vî warî de nûçegihan ne baldarbe çavkaniyên wî dibe ku careke

din bersivê nede wî û ji rojnameger dûr bikeve. Ev jî ji bo nûçegihanan dibe sedema qutkirina agahiyan.

Rojnameger gava ku agahiyan dibihîzin divê di heman demê de xwe bigihînîn çavkaniyên xwe, rûdan û bûyerên ku bihîstîne piştrast bikin. Di vê pêvajoyê de zor û zehmetî destpê dike. Carna çavkanî ji ber sedemên cûrbicûr ji rojnamegeran direvin.

Em bi mînakêkê li ser vê meseleyê bisekinin.

Em bibêjin rojnamegerekî bihîst ku di saziyeke dewletê de gendelî û bêrêtiyeke mezin çêbûye û derbarê hin rayedaran de jî lêpirsîn hatiye vekirin. Di vê rûdanê de nas û çavkaniyên ku di heman saziyê de dixibitin dibe ku têlefonên xwe venekin û bi tu kesî re têkiliyan daneynin. Di vir de rojnameger dikare bi destê dûyemin an sêyemîn xwe bigihîne çavkaniyên xwe û derbarê bûyerê de belge û hûrgiliyan hilde û paşê jî dikare bi vî şiklî nûçeyê binivîsîne.

*“Di wezarata ……yê de derbarê 3 rayedaran de ji ber gendelî û bêrêtiyê lêpîrsin hat vekirin. Li gor agahiyên ku me bi dest xistin 3 kesên ku tên sucdarkirin ji wezîfeyê hatin dûrxistin…….”*

Di vir de heke em bala xwe bidinê di nûçeyê de navên çavkaniyên me nediyar in. Rojnameger bi destê duyemîn an jî sêyemîn xwe gihandiye çavkaniyên xwe, belge û hûrgilî jê wergirtine, lê di nûçeyê de behsa çavkaniyên xwe nekiriye û kesek nizane ku ev agahî ji kê ân kesan bihistine. Yanê rojnameger bi awayekî profesyonel çavkaniyên xwe diparêzê.

Lê di hin nûçeyan de beravajî vê lazime ku çavkanî eşkere bê nivîsandin. Di wan nûçeyan de heke çavkanî nebe wê çaxê xeletiyeke mezin derdikeve holê. Di wan nûçeyan de bi taybetî civînên rûtîn, daxûyanî û çalakiyên eşkere cih digrin.

Mînak:

*“Serokatiya Herêma Kurdistana Iraqê daxuyaniyeke nivîskî belav kir û ragihand ku Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî dê sibê biçe Ewrûpayê…”*

An jî;

*Saziyên Civaka Sivîl ên ku ji 34 komeleyan pêk tên îro li paytext Hewlêrê kom bûn û êrîşên hikûmeta Bexdayê şermezar kirin. Li ser navê  saziyên sivîl Ahmed Silêmanî daxûyanê da û wiha got: ....”*

Di her du mînakên jorîn de jî çavkanî diyar in û heke di wan nûçeyan de çavkanî nediyar bin wê çaxê nûçe wê xelet bin.

YÖK watermark

# BEŞA SÊYEMÎN

# BIKARANÎNA DEMÊ Û RÊZIKÊN NÛÇEYAN

## 3.1. DI NÛÇEYAN DE BIKARANÎNA DEMÊ

Îro şert û mercên ragihandin û rojnamegeriyê pir hêsan bûne û ji bo vê jî rojnameger bi riya teknolojiyê dikarin xwe bigihînin rûdan û mijarên ku li ser dixebitin. Derfetên rojnamegeran gihîştine asteke wisa ku nûçegihan êdi nikarin bibêjin ‘filan kesî ji filan kesî re wiha gotiye’ an jî ’Li gor salixan filan tişt bi vî şiklî bûye’. Çimkî rojnameger dikarin di demeke kurt de xwe bigihînin bûyer an kesên ku bûne mijara nûçeyê da ku bibêjin ‘ev tişt bi vî şiklî bû’ an ‘bûyer wiha qewimî’

Heke em bala xwe bidinê di navbera her du gotinan de cudahiyeke mezin heye û tesîra her du gotinan jî li ser me ne haman e. Yanê heke rojnamegerek bibêje ‘Li Amedê qeza bûye’ wê çaxê em ê bifikirin ku haya rojnameger ji qezayê tune ye lê ji yekî din bihistiye û me agahdar dike.

Lê heke rojnamegerekî din bibêje û binivîse ‘Li Amedê qeza bû’ wê çaxê mirov dizane ku ev rojnameger şahidê vê qazayê ye û ji yekî din nebihistiye û em ê jî jê zedetir bawer bin. Di mînakên jorîn de xuya ye ku tesîra her du gotinan ne yek e û hevoka ku tê de dema boriya têdeyî hatiye bikaranîn zêdetir tesîrê li ser xwendevanan dike.

Ji ber vê destûrê di nûçeyan de bêtir dema boriya têdeyî tê bikaranîn. Lê ji bo bekraunda nûçeyê em dikarin dema boriya çîrokî bikarbînin. Di zimanên nûçeyan de ev rêgez ne bi tenê ji bo Kurdî di Îngîlîzî, Fransî û Tirkî de jî hatiye qebûlkirin.

### 3.1.1. Di Nûçeyên Tirkî de Dem

Di nûçeyên Tirkî de dema boriya têdeyî tê bikaranîn. Lê heke derbarê mijarê de bekraund bê nivîsîn wê çaxê dema boriya çîrokî tê bikaranîn.

Em li ser hevoka jêrîn meseleyê dikarin wiha zelal bikin;

“Suudi Arabistan öncülüğündeki koalisyon güçlerinin, Yemen'in kuzeyindeki Sa'da ilinde Husilerin kontrolündeki yerlere hava saldırısı düzenlediği bildirildi”

Di hevokê de bi kurtasî dibêje hêzên kolalîsyonê avêt ser Hûsiyan.

‘Bildirmek’ lêker e û “dî” ya ku hatiya dawiya ‘bildirme’yê dema boriya têdeyî ye.

Ji ber ku nûçe behsa bûyereke rojevê ya nû yanê behsa êrîşa li ser hûsiyan dike ‘di’(di’li geçmiş zaman)ya dema boriya têdeyî hatiye bikaranîn.

Niha em dewam bikin û hevoka dûyemin analîz bikin.

“Suudi Arabistan basınında çıkan haberlerde, Husiler tarafından atılan havan toplarının kentteki evlere ve hastanelere düştüğü, olayda ölü ve yaralı olmadığı ileri sürülmüştü.”

Di vê hevokê de jî bi kurtasî dibêjê Hûsiyan beriya vê bûyerê bi topan êrîş kiribûn, top li mal û nexweşxaneyan ketibûn lê di bûyerê de tu tişt tu kesî nehatibû.

Yanê behsa serancama şerê ku dewam dike tê kirin û bekraunda bûyerê di nûçeyê de dide.

“Sürülmek” lêker e û ‘müş’(miş’li geçmiş zaman) a ku hatiye dawiya ‘sürülme’yê jî dema boriya çîrokî ye.

### 3.1.2. Di Nûçeyên Îngîlîzî de Dem

Nûçegihanê AA’yê Canberk Yukselê ku di beşa Îngilîzî de dixebite derbarê nûçeyên Îngîlîzî de ev agahî dan min.

Canberk Yüksel dibêje ku heman rêbaz ji bo nûçeyên Îngîlîzî jî tê bikaranîn û ‘past perfect’ wezîfeya ‘dî’li geçmiş zaman’ yanê ‘dema boriya têdeyî’ dike.

“Al-Shabaab militants on Wednesday shot dead the deputy commissioner of Wadajir, a district in the capital Mogadishu, and his driver.

Tirkî: “Somali başkenti Mogadişu’nun Wadajir ilçesi Emniyet Müdür Yardımcısı ve şoförü çarşamba günü El-Şebab militanlarınca öldürüldü.”

Bi kurtasî Kurdiya vê hevokê “Şofor û alîkarê Midûrê Ewlekariya Wadajîra navçeya paytext Mogadîşaya Somaliyê roja çarşemê ji aliyê milîtanên El-Şebab ve hatin kuştin.”

Ji ber ku bûyer nû qewimiye di nûçeyê de dema boriya têdeyî hatiye bikaranîn. ‘Shoot dead’ lêker e û ‘shot’ jî ‘Past Tense’ ya ku wezîfeya dema boriya têdeyî dike ye.

Di dawiyê de Yüksel dibêjê di nûçeyên îngilîzî de ‘Past Tense’ û 'Past Perfect Tense’ dema boriya têdeyî û dema boriya çîrokî ji hev vediqetîne û bi vî şiklî tê bikaranîn.[64]

### 3.1.3. Di Nûçeyên Frensî de Bikaranîna Demê

Fatma Şeyma Tahana nûçegihana beşa Frensî ya AAyê jî derbarê nûçêyên Frensî de roportajek da min û got ku di nûçeyên Frensî de jî dema boriya têdeyî tê bikaranîn.

Tahanê ev mînak dan;

Jeudi 7 mai, la cour d’appel de Paris *a validé* l’essentiel de la procédure ayant mené à la mise en examen de l’ancien chef de l’Etat, à l’été 2014, pour corruption active, trafic d’influence actif et recel de violation du secret professionnel.

Di hevoka jorîn de bi kurtasî dibêje 7mîn Dadgeha Herêmî ya Parîsê kiryarên derbarê cezayê serokkomar de a ku di sala 2014an de bûbû sedema girtina wî pesend kir.

‘Valider’ lêkera hevokê ye û tê wateya ‘onamak’a Tirkî yanê pesendkirin an jî pejirandina Kurdî yê. ‘a validé’ jî ‘di’li geçmişa Tirki’ yanê ‘dema boriya têdeyî’ ya Kurdî ye.

Di berdewamiya nûçeyê de;

Aussi Nicolas Sarkozy *avait*-il, dès sa garde à vue, *contesté* « formellement la légalité des interceptions qui ne sont ni plus ni moins qu’un scandale » et donc refusé de répondre aux questions sur elles.

Tirkî: Nicolas Sarkozy, gözaltına alındığında, gözaltının yasallığını yadsımıştı, bunun “adeta bir skandal olduğunu” belirterek soruları cevaplamayı reddetmişti.

Kurdî: Gava ku Nîcolas Sarkozy hatibû binçavkirin biryara dadgehê qebûl nekiribû û gotibû ku ‘Ev biryar skandaleke’ û pirsên ku hatibûn pirsîn jî red kiribûn.

Contester (yadsımak, qebûlnekirin): lêker

avait contesté, (yadsımış, qebûl nekiribû): ‘miş'li geçmiş zaman’a Tirkî, dema boriya çîrokî ya Kurdî.

---

[64] Canberk Yüksel, -Nûçegihanê Ajansa Anadoluyê ya beşa Îngîlîzî, Hevditîna li ser “di nûçeyên Îngîlîzî de bikaranîna deme”, Ankara, 6ê gulana 2015an.

refuser: reddetmek, redkirin

avait refusé (reddetmişti, red kiribû): ‘miş'li geçmiş zaman’a Tirkî, dema boriya çîrokî ya Kurdî.

Di hevoka din de jî wek mînak di hevoka jorîn de ku gava bekraunda nûçêye devam dike dema boriya çîrokî hatiye bikaranîn.

Fransî: Il *avait* à l’époque reçu le soutien d’un certain nombre de juristes et d’avocats contestant également leur légalité, notamment celui de Pierre-Olivier Sur, le bâtonnier du barreau de Paris.

Tirkî: Sarkozy o dönemde başta Paris Barosu Başkanı Pierre-Olivier Sur olmak üzere gözaltının yasallığını sorgulayan bazı hukukçu ve avukat tarafından desteklenmişti.

Kurdî: Di vê demê de Serokê Baroya Parîsê Pîerre- Olîvier Sûr di serî de hin hiqûqnas û parêzeran piştgirî dabû Sarkozy.

recevoir le soutien (desteklenmek, pîştgirî dayîn): Lêker-Fîîl’a Tirkî

avait reçu le soutien (desteklenmîştî, piştgirî dabûn, hatûbû dayîn): ‘miş'li geçmiş zaman’a Tirkî ‘dema boriya çîrokî ya Kurdî.

Rojnameger Tahan di berdewamiya hevpeyvînê de bi vê mînakê bal kişand ser dema boriya têdeyî û dema boriya çîrokî.

Fransî: Suite à la décision du Comité turc d'organisation du 1er mai de permettre les célébrations à la place Taksim à Istanbul, de grandes mesures de sécurité ont été prises dans plusieurs quartiers.

Tirkî: 1 Mayıs Tertip Komitesi'nin İstanbul'un Taksim meydanında kutlama yapma kararından sonra birçok mahallede geniş güvenlik önlemleri alındı.

Kurdî: Piştî biryara Komîteya Demezrandina 1ê Gulanê ya kû wê li meydana Taksîmê cejna 1ê Gulanê pîroz bike li gelek taxan tevdîrên ewlehiyê hat hildan.

Prendre (almak, hildan): Lêker, fîîl a Tirkî

ont été prises (alindi, tevdîr hat hildan): Dema boriya têdeyî ya Kurdî, di'li geçmiş zaman a Tirkî.

Di berdevamiya nûçeyê de behsa begraunta bûyêrê tê kirin û dema boriya çîrokî tê bikaranîn.

Fransî: Au 1er mai 1977, lorsque 500 000 personnes *s'étaient rassemblées* sur la place Taksim pour célébrer la journée, des hommes armés non identifiés *avaient tiré s*ur la foule pacifique.

Tirkî: 1 Mayıs 1977'de İşçi Bayramı'nı kutlamak için Taksim Meydanı'nında toplanan 500 bin kişiye kimliği belirlenemeyen kişilerce ateş açılmıştı.

Kurdî: Di 1ê Gulana 1977an de ji bo pîrozkirina cejna karkaran 500 hezar kes li Meydana Taksîmê kom bûbûn, lê kesên nasmanenediyar gule barandibun ser çalakvanan.

se rassembler (toplanmak, kombûn) : Lêker- fiîl

s'étaient rassemblées (kom bibûn, civiya bûn, taplanmıştı): Dema boriya çîrokî ya Kurdî û 'miş'li geçmiş zaman'a Tirkî.

tirer (gule barandin, agir barandin- ateş etmek): Lêker- fiîl

avaient tiré (Gule barandibû, agir barandibû-ateş etmişti): Dema boriya çîrokî ya Kurdî, 'mişli geçmiş zaman'a Tirkî.[65]

### 3.1.4. Di Nûçeyên Kurdî de Bikaranîna Demê û Hin Xeletî

**DAIŞ Wiha Behsa Aloziyên Başûrê Kurdistanê Dike!**

HEWLÊR (RÛDAW) – Rêxistina DAIŞê kêfxweşiya xwe li hember alozî û xwepêşandanên Başûrê Kurdistanê nîşan daye û şewitandina navend û avahiyên PDKê wek "serkeftina li hember peyayên cihûyan" nirxandiye!

Ev çend roj in li Başûrê Kurdistanê bi taybet li parêzgeha Silêmanî û devera Germiyanê li hember taloqkirina mûçeyan xwepêşandan û çalakiyên nerazîbûnê tên kirin.

Lê ev du-sê roj in xwepêşandan û çalakiyên han aloz bûne û vegerîne şer û pevçûnan û heta niha çend kesan di wan bûyeran de jiyana xwe ji dest daye û li hinek deveran jî avahiyên PDKê hatine şewitandin.

[65] Tahan, Şeyma, -Nûçegihana Ajansa Anadoluyê ya beşa Frensî, Hevdîtîna li ser di "Nûçeyên Frensî de Bikaranînaemê" Ankara, 7ê gulana 2015an.

Rêxistina DAIŞê jî ev rewş wek firsendekî bikar aniye û li ser rûpel û malperên xwe yên civakî behsa bûyerên Başûr kiriye.

DAIŞê li ser rûpelên xwe yên Kurdî qaşo pîrozbahî li wan kesan kiriye ku êrişî avahiyên PDKê dikin û kêfxweşiya xwe li hember wan bûyeran nîşan daye.

DAIŞê her wiha şewitandina avahî û navendên PDKê li hinek bajar û deverên Başûrê Kurdistanê, wek serkeftina "mucahidan li hember kafir û peyayên cihûyan" nirxandiye û xwepêşander gij kiriye ku zêdetir êriş bikin!

Çekdarekî Kurd ê DAIŞê jî li ser rûpela xwe ya facebookê gotiye: "Li wilayeta Kurdistanê, mucahidên me li Silêmanî û Pişderê avahiyên Barzaniyên sehyûnîst şewitandin!"

Li aliyekî din, welatiyên Başûrê Kurdistanê, wan peyamên DAIŞê wek şerê derûnî û şêlûkirina daxwaziyên rewa yên gel dibînin û dibêjin, li wan deverên ku xwepêşandan lê tê kirin, gellek Pêşmerge di şerê DAIŞê de şehîd û birîndar bûne.[66]

**Analîz:** Dema em bala xwe bidin vê nûçeyê em ê bibînin ku di seranserê metnê de bi lêkerên wekî "gotiye, nirxandiye, kiriye" dema boriya çîrokî hatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê ev ji bo nûçeyên bi vî rengî xeletî ye. Lazim e di metnên wiha de dema boriya têdeyî bê bikaranîn ku zêdetir tesîrê li temaşevan û xwîneran bike.

**Îstîxbarata Îranê Gefan li Barzanî Dixwe**

Hate gotin ku berpirsekî ji îstixbarata Îranê li Hewlêrê gotiye ku qaşo heke Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî alîkariyê bide partiyên Kurdan ên li Rojhilatê Kurdistanê, dê ew jî şer bibin nav mala Barzanî.

Hate gotin ku berpirsekî ji Îtlaata îstixbarata Îranê ya Koşka Serokkomariyê yê bi navê Salih Silehşor ku bi navê rojnamevanî hatiye Hewlêrê, di axaftinên xwe de ligel devrûbera xwe, gef li Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, xwariye.

Derbarê vê yekê de Endamê Mekteba Siyasî ya Partiya Komunîst a Kurdistanê (Şûî) Zîrek Kemal ji BasNews re got ku ev kesê bi navê Salih Şilehşor ku endamê Îtlaatê bûye û xwe wek rojnamevan nasandiye, hatiye hevdîtina wî û gotiye ku "Barzanî

---

66 Rûdaw, DAIŞ wiha behsa aloziyên Başûrê Kurdistanê dike, 11yê Cotmeha 2015an, http://rudaw.net/kurmanci/Kurdistan/111020151, (Dema Gihanê: 11.10.2015).

niha alîkarî dide partiyên Kurd yên rojhilat û hêdî hêdî wan ji bo şer dişîne nav axa Îranê. Heger wisa berdewam bike dê Îran şer bibe nav mala wî."[67]

**Analîz:** Em gava nûçeya jorîn analîz dikin dibînin ku him dema boriya têdeyî û him jî dema boriya çîrokî hatiye bikaranîn. Di bingeha vê nûçeyê de kûlîsek heye û nûçegihan jî ji bo vê agahîyê serî li rayedarê ku bûye çavkaniya kûlîse daye û cih daye gotinên wî û agahî piştrast kiriye. Yanê di destpêka nûçeyê de ewil behsa kûlîsê yanê agahiya ku bihîstiye hatiye kirin û paşê cih daye daxuyaniya rayederan. Di vir de ji ber ku agahî ji yekî din bihistiye rojnameger bi hevoka "*Hate gotin ku berpirsekî ji îstixbarata Îranê li Hewlêrê gotiye ku qaşo heke Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî alîkariyê bide partiyên Kurdan ên li Rojhilatê Kurdistanê, dê ew jî şer bibin nav mala Barzanî.*" Dest bi nûçeyê kiriye û lêkera "gotiye" bi kar aniye. Yanê dema boriya çîrokî hatiye bikaranîn.

Di berdewamiya nûçeyê de jî daxuyaniya kesê ku bûye çavkaniya nûçeyê yanî Zîrek Kemal cih girtiye.

"*Derbarê vê yekê de Endamê Mekteba Siyasî ya Partiya Komunîst a Kurdistanê (Şûî) Zîrek Kemal ji BasNews re got ku ev kesê bi navê Salih Şilehşor ku endamê Îtlaatê bûye û xwe wek rojnamevan nasandiye, hatiye hevdîtina wî û gotiye ku "Barzanî niha alîkarî dide partiyên Kurd yên rojhilat û hêdî hêdî wan ji bo şer dişîne nav axa Îranê. Heger wisa berdewam bike dê Îran şer bibe nav mala wî."*

Di vir de jî em bala xwe bidin lêkera "got"ê ku bi dema boriya têdeyî hatiye bikaranîn. Yanê bi kurtasî nüce wek tiştekî ku ji yekî din hatiye bihistîn bi dema boriya çîrokî û agahiya ku bi xwe bihistîye jî bi dema boriya têdeyî hatiye avakirin. Di nûçeyên wiha de mirov dikare bi vî şiklî binivîse. Lê danîna nûçeya bi vî şiklî him zihmet e û him jî dibe ku zirarê bide tesîra nûçeyê.

Lê heke nûçeyê bi kirdeyê dest pê bikira û dema boriya têdeyî bihata bikaranîn dê çêtir bûbûya.

---

[67] BasNews, Îstîxbarata Îranê gefan li Barzanî dixwe, 18yê Tîrmeha 2015an, http://www.basnews.com/kr/news/2015/07/18/istixbarata-irane-gefan-li-barzani-dixwe/, (Dema Gihanê: 18.07.2015).

*Endamê Mekteba Siyasî ya Partiya Komunîst a Kurdistanê Zîrek Kemal anî ziman ku berpirsê îstixbarata Îranê Salih Silehşor, hat cem wî û xwe wekî rojnameger da nasandin û wiha xeber da, "Barzanî niha alîkariyê dide partiyên Kurdan ên li Rojhilatê û hêdî hêdî wan ji bo şer dişîne nava axa Îranê. Heger wisa dewam bike, Îranê jî şer bibe nava mala wî."*

*Kemal, derbarê bûyerê de agahî dan BasNewsê û got ku berpirsê Îtlaata îstixbarata Îranê ya Koşka Serokkomariyê li Hewlêrê hat ba wî û di axaftinên xwe de gef li Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî xwar.*

Minak:

**Dişa Talebanî: Ez Ditirsim Wezareta Pêşmerge Bikeve Destê Tirkiyeyê!**

Xûşka hevjîna Mam Celal (dişa Talebanî) û berpirsa pêwendiyên YNKê Şanaz Îbrahîm Ehmed, li dijî hatina hêzên Tirk bo Başûrê Kurdistanê nerazîbûn **nîşan daye** û **gotiye**: "Ez ditirsim rojekê ji xewê rabim bibînim Wezareta Pêşmerge ketiye destê Tirkiyê!..."

Dişa Talebanî di nivîsekê de nerazîbûna xwe ya li dijî hebûn û hatina hêzên Tirk bo Başûrê Kurdistanê denîşan daye û tiştên sosret gotine.

Wê rayedara YNKê wiha **nivîsiye**: "Ez ditirsim rojekê ji xewê rabim bibînim Kurdistan bûye Mîrnişînek ku serokatiya wê heta hetayî hatiye qorixkirin, Serokê Parlamentoya wê yekê Qeter e. Kabîneya hikûmeta wê jî ji 6 wezaretan pêk tê: Wezareta Mafên Mirov di destê Erebistanê de ye. Wezareta Dadê di destê DAIŞê de ye. Wezareta Tûrîzmê di destê mîran de ye, Wezareta Samanên Sirûştî di destê PDKê de ye, Wezareta Pêşmerge di destê Tirkiyê de ye û Wezareta Şehîdan jî di destê berpirsên berê yên rêjîma Beisî ya Iraqê de ye…"

Xûşka Hêro Îbrahîm Ehmed, rexneyên tûj li PDKê **girtine** û **gotiye**, kirîz û aloziya ku niha li Kurdistanê heye hemû ji ber siyaseta PDKê ya "bila her tişt ji bo min be" ye. Helbet kêmasiyên YNKê jî hene, çimkî YNKê xemsarî kiriye û piştî nexweşketina Mam Celal, rewş wiha lê hatiye...

Dişa Talebanî bang li YNKê **kiriye** û gotiye, beriya ku Kurdistan tijî “cendirme û deve” bibe, divê YNK bilez dakeve meydanê û pêşiya nexşeya “neyarên gelê Kurd” bigire…[68]

**Analîz:** Di mînaka jorîn de nûçe li ser nivîsekê hatiye danîn. Lê em dibînin ku di lêkerên wek“**nîşan daye”**, **“nivîsiye”**, **“girtine”**, **“kiriye”**, **“gotiye”** de dema boriya çîrokî hatiye bikaranîn. Ji ber vê çendê jî gava ku nûçe tê xwendin mirov dibêje ku ev nivîs ji aliyê yekî din ve hatiye xwendin û haya nûçegihan ji vê nivîsê tune ye. Heke dema boriya têdeyî bihata bikaranîn wê çaxê me yê bigota nivîs ji aliyê rojnameger ve hatiye xwendin û paşê hatiye nivîsandin.

**Derhanîna Otombîlan ji bo Herêma Kurdistanê Kêm Bûye**

Zaxo (Rûdaw) – Di sala 2016an de hawirdekirina otomobila bi deriyê sînorî yê Îbrahîm Xelîl re ku dikeve navbera Bakur û Başûrê Kurdistanê de kêm bûye. Li gorî daneyên berpirsên deriyê sînorî yê Îbrahîm Xelîl, di sala 2016an de derhanîna otomobilan %58 kêm bûye.

Ajokarê TIRê Dilawer Hesan ji Rûdawê re got, beriya niha di mehê de 3-4 sefer dikirin lê niha herî zêde 1 an 2 seferan dikin. Vê yekê jî hişteye ku bihayê otomobilên destê duduyan zêde bibe.

Firoşkarekî otomobilên destê duduyan jî wiha dibêje: “Beriya niha me destpêka meha çileyê otomobîl hawirde dikirin. Lê niha jiber kirîza darayî bazar lawaz bûye û lewma me otomobîlên nû hawirde nekirine.”

Bi deriyê Îbrahîm Xelîl re di sala 2015ê 38 hezar otomobîl û di sala 2016an de jî 17 hezar û 700 otomobîl derbasî Herêma Kurdistanê bûne.[69]

**Analîz:** Di nûçeya jorîn de berpirsên deriyê sînor ê Îbrahîm Xelîl, çavkaniyên daneyan nîşandane. Lê di berdewamiya nûçeyê de daxuyaniyên ajokarê TIR’ê û firoşkerê otomobîlê di nûçeyê de cih girtine. Di nûçeyên wiha de lazime ku dane ji saziyên fermi an jî nûnerên sektöre bê girtin û paşê jî cih bidin ajokaran da ku nûçe bi

[68] Rûdaw, Dişa Talebanî: Ez ditirsim Wezareta Pêşmerge bikeve destê Tirkiyê!, 15yê Qanûna 2015an, http://rudaw.net/kurmanci/Kurdistan/151220154, (Dema Gihanê:15.12.2015).

[69] Rûdaw, Derhanîna otombîlan ji bo Herêma Kurdistanê kêm bûye,1ê Rêbendana 2016an,http://rudaw.net /kurmanci/business/04012017, (Dema Gihanê: 06.01.2017).

agahiyan xurt bibe.  Ji bilî wê di nûçeyê de dema boriya çîrokî jî hatiye bikaranîn û ji ber van sedaman di berhevkirin û nivîsandina nûçeyê de hin kêmasî çêbûne.

## 3.2. RÊZIKÊN NIVÎSANDINA NÛÇEYAN

Nûçe li ser hin teknîkan tên danîn. Yanê ji bo ragihandin û nivîsandina agahiyan lazim e ku bi şikl û awayekî diyar nûçe bên amedekirin. Îro di medyaya modern û pêşveçûyî de bi piranî têknîkên Pîramîta Vajî, Pîramîta Rast û Çargoşe cih girtine û rojnameger jî li gor wan pîvanan dest bi nivîsandina nûçeyê dikin.

### 3.2.1. Teknîka Pîramîta Vajî

Rêbaza Pîramîta Vajî di nav teknîkên nivîsandina nûçeyan de teknîka herî kevn e û îro jî herî zêde ev teknîk di nûçeyan de tê bikaranîn.

Li gor zanyaran, Teknîka Pîramîta Vajî di sala 1850an de li DYAyê ketiye rewacê û ji bo ku rojnameger bi telgrafê nûçeyên xwe ji navenda saziyên çapemeniyê re bişînin ev teknîk ceribandine.

Piştî şerê navxweyî yê li DYAyê sendîkayên çapemeniyê û ajansan jî ev rêgez qebûl kirine û bi vî awayî Teknîka Pîramîta Vajî ji aliyê saziyên çapemeniyê û rojnamegeran ve hatiye pejirandin û belavî welatên din bûye. Di vê demê de rojmaneyên herêmî yên Ewropayê jî Teknîka Pîramîta Vajî di nûçeyên xwe de bikar anîne û li Ewropayê jî ev rêgez hatiye qebûlkirin.[70]

Li gor vê teknîkê mijara herî balkêş di serê nûçeyê de tê nivîsîn û li gor nirxa nûçeyê hûrgiliyên din di naverokê de cih digirin. Li gor pîramîta vajî, di destpêka nûçeyê de xala herî balkêş bi kurtasî tê weşandin û di hevokên din de jî biberfirehî li ser mijarê tê sekinîn.

Ev cûre nûçe ji aliyê xwendevanan ve bi hêsanî tê xwendin û mijara ku herî zêde tê mereqkirin di destpêkê de tê dayîn. Loma kesên ku nûçeyê dixwînîn di serî de agahdar dibin ku nûçe behsa çi dike. Teknîka Pîramîta Vajî ne bi tenê ji bo xwîneran ji bo nûçegihanan jî hêsan e û nûçegihan bi zimanekî zelal dikarin nûçeyê binivîsin.[71]

---

[70] Tokgöz, **b.n.b.,** r. 301.
[71] Milli Eğitim Bakanlığı, MEGEP (Meslek Eğitim ve Öğretim Sisteminin Güçlendirilmesi Projesi Gazetecilik Alanı Haber Yazma Teknikleri,2007, http://hbogm.meb.gov.tr/modulerprogramlar/ kursprogramlari/gazetecilik/moduller/haber_yazma_teknikleri.pdf, (Dema Gihanê: 17.01.2016), r. 7.

WASHINGTON (AA) - Wezareta Karên Derva ya DYAyê daxuyand ku Tirkiye, PYDyê wekî terorîst dibîne, lê ew bi xwe wiha nafikirin.

Di civîna çapemeniyê ya rojane de bi Berdevkê Wezareta Karên Derva John Kirby dan bibîrxistin ku Serokomar Recep Tayyip Erdoğan di vegera xwe ya bo welat de di firokeyê de daxûyanî da rojnamegeran û pêwendiya DYAyê ya bi PYDyê re qesd kir û wiha got, "Ma ez im hevkarê te, an terorîstên li Kobanê ne?"

Kirby diyar kir ku Tirkiye endamekî NATOyê ye û di operasyonên dijî DAIŞê de hevkarekî girîng e û wiha xeber da, "Ez mijar ji bo Tirkan ne bitenê meseleyeke teorîk e. Rasterast li ser sînorê wan diqewime. Bi milyonan penabera rûbirû dimînin. Ji ber operasyonên Rûsya û rejima Esed dibe ku bêtir penaber were."

Kirby diyar kir ku ji ber van sedeman ew, zexta li ser Tirkiyeyê fêm dikin û wiha pê de çû, "Emê ji ber endîşeya wan a der heqê PYDyê de, bi wan re bixebitin. Ev tiştekî nû nîne. Emê bi wan re xeberdin û der heqê mijarê de gotûbêj bikin."

Kirby bal kişand ser gotinên Erdoğan û wiha got, "Tişta ku divê em li vir hilbijêrin ew e ku wekî endamên hevpeymanê divê em hewla xwe ya dijî DAIŞê zêde bikin û li Iraq û Sûriyeyê rêxistinê bi temamî ji holê rakin."

Herwisa Kirby der heqê pêwendiyên bi Tirkiyeyê re wiha bal kişand, "Tu tişt nikare têkiliya me ya nêzîkî hevdu ya bi Tirkiyeyê re biguherîne."

Kirby der heqê PYDyê de jî wiha got, "Em PYDyê wekî rêxistineke terorê nabînin. Lê helbet emê bi Tirkiyeyê re axaftina xwe dewam bikin. Tirkiye hevkar û dost e."

**Çekên ku Didin PYDyê Tên Tirkiyeyê**

Herwisa ji Kirby îdiayên ku çekên ji PYDyê re tên şandin, derbasî Tirkiyeyê dibin jî hat pirsîn.

Kirby destnîşan kir ku ew xeberên der heqê vê mijarê de dişopînin û wiha xeber da, "Me delîlek nedît ku van îdiayan piştrast bike. Bi tenê ji şervanên Kurdan re muhimat hat dayîn, ne çek. Lêbelê em vê mijarê pir cidî dişopînin. Heger em delîlekî ku van îdiayan piştrast dike bibînin, emê gavên hewce bavêjin."Bi destpêkirina Bernameya Aştiyê li Efxanistanê, bi hezaran endamê Talibanê teslîm bûn. Di çarçoveya Bernameya

Aştiyê ku ji aliyê Konseya Bilind ya Aştiyê ve tê birêvebirin de, çekdarên ku çekê datînin û teslîm dibin îmkana piştevaniya maddî û kar û xebatê ji wan re tê dabînkirin.[72]

### 3.2.2. Teknîka Pîramîta Rast

Teknîka Pîramîta Rast, bereksê teknîka pîramîta vajî bi hûrgiliyan destpêdike û di dawiya nûçeyê de xala herî girîng û balkêş cih digre. Di wan nûçeyan de pirsgirêka demê tune ye û nûçegihan dikare di demeke dirêj de nûçeyê biweşîne. Yanê hin nûçe hene ku divê rojnameger zûtir biweşîne ku bi derengiyê nekevin. Lê di vê teknîkê de tiştekî wisa tune ye û nûçe dikare di demeke dirêj de bê nivîsîn û weşandin.

Di vê teknîkê de nûçegihan dikare bi zimanê çîrokî nûçeyê binivîse. Di teknîka vajî de dema boriya têdeyî tê bikaranîn lê di teknîka pîramîta rast de nûçegihan dikare bi çîrokiya dema niha binivîse û li gor hevok û naverokê demên din jî bikarbîne. Divê em vê jî bibêjin ev cûre nûçe bi taybetî di nûçeyên kovaran û mijarên rengîn ên wekî magazînê de tê bikaranîn.[73]

Minak;

**Cilên Kurdî Êdî dê bi Govendê Bijîn**

Li Kurdistanê cil û bergên gelerî ber bi windakirinê ye. Navenda Çandê ya Cegerxwîn ji bo çanda cil û bergên Kurdî pêş bixe, dê bi govendan cil û bergên gelerî bidin pêşandan.

AMED- Yek ji çanda Kurdan ku bûye wekî nasnameyê cil û bergên neteweyî ne. Di çanda Kurdan de bi qasî ziman, cil û bergên neteweyî û herêmî jî balê dikişînin ser xwe. Di aliyê cil û bergan de her herêmek Kurdistanê xwedî taybetmendî û çîrokek e. Bajarê Amedê jî di aliyê cil û bergan de xwedî taybetmendiyek xweser e. Amed bi qasî warê xwe yê dîrokî bi cil û bergên xwe jî xweser e. Gelek bîr û bawerî hatin li Amedê bi cih bûn û koçbûn. Her civak û baweriyekê şopek li pey xwe hiştiye. Ji ber vî aliyê Amedê yê dîrokî çanda cil û bergan ya Amedê jî pir dewlemend û rengîn e. Lê di salên dawî de piştî hêzên kapîtalist tekstîla cil û bergan pêş xistin, cil û bergên herêmî jî yek bi yek tune bû û şopa wan winda dibe.

---

[72] Anadolu Ajansı, Daxuyaniya Wezareta Karên Derva ya DYAyê,9ê Sibata 2016an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx ?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Yayin, (Dema Gihanê: 09.02.2016).
[73] Milli Eğitim Bakanlığı, **b.n.b.,** r. 9.

Yek ji miras û çanda ku gelan li Amedê hiştiye cil û bergên gelerî yên herêmê ne. Heta niha cihek ku cil û bergên gelerî yên herêmê biparêze nehatiye avakirin. Cil û bergên ku li herêma Amedê dihatin lixwekirin bi demê re ber bi windabûnê ve çûn. Yek ji cihên ku cilên gelerî yên herêmê berhev dike, navendên çandê ne. Komên govendan yên navendên çandê, cilên herêmî li xwe dikin. Yek ji van navendan Navenda Çandê ya Cegerxwîne. Koma Govendê ya Navenda Çandê ya Cegerxwîn di dema liyîstina lîstikan de cilên herêmî yên Amedê li xwe dikin. Her çend Navenda Çandê ya Cegerxwîn hewildaye ku cil û bergên gelerî yên Amedê kom bike jî, lê nekariye hemû parçeyên çandên li Amedê hatine lixwekirin kom bike. Ji ber ku gelek cûreyên cil û bergên herêma Amedê winda bûne, niha Navenda Çandê ya Cegerxwîn tenê cûreyek ji cilên herêmî yên Amedê di lîstikên govendê de li xwe dikin.

Cil û bergên Amedê ji dehan reng û perçeyan pêk tên. Cilê ku niha hatiye parastin ji van perçeyan pêk tê:

**Cilên Jinan:** Derpî, desmala piştê, kitan (5 metreye û di bin kofiyê de tê li xwe kirin), kofî (heftreng e û bi destan tê çêkirin. Taybetmendiya xwe jî ji heftrengê asîman digre) qotik (piranî bi zivistanê tê li xwe kirin), kiras û sol.

**Cilên Mêran:** Gumlek (heftrenge û ji qumaşê herîr tê çêkirin), êlek (di heman demê de êlekê 40 bijkoş jî tê li xwe kirin), şal (delingên şal re dibêjin siwarî, ji bo bi rihetî li hespan siwar bibin fireh tê hêlan), desmala piştê (jêre dibêjin kuşaxa eceman bi dest tê çêkirin), kum ( ji kulav û desmalê pêktê), nivişt û himail (ji ber di şeran de bên parastin nivîştan bi mil û stuyê xwe ve dikin), demjimêra bi zincî (hinek diavêjin stuyê xwe û hinek jî bi aliyekê xwe ve didaliqînin) û sol.

Mamostayê Koma Govendê ya Navenda Çanda Cegerxwîn Îsmaîl Altog têkildarî cilên Kurdî diyar kir ku cil û bergên jin û zilaman bi neqş, fesal û modela xwe hev temam dikin. Altog, da zanîn ku kofiya heftreng û gomlekê heftreng hevdû temam dikin û cilên jinan pir bi gul û rengînin. Altog, wiha axivî: "Ev jî tê wateya ku jin taybetmendiyên xwe ji xwezayê digre. Em nikarin jin û xwezayê ji hev cuda bikin. Her çend jin hatibe bindest kirin jî hîn nîşaneyên xwezayê bi xwere hildigrin." (Dîha) [74]

[74] Hawarnet,Cilên Kurdî êdî dê bi govendê bijîn, 14yê Tîrmeha 2015an, http://candname.hawarnet.org/2015/09/cilen-Kurdi-edi-de-bi-govende-bijin.html, (Dema Gihanê:19.02.2016).

### 3.2.3. Teknîka Çarkoşe

Piştî Teknîka Pîramîta Vajî, rêgeza ku herî zêde tê bikaranîn Teknîka Çargoşeyê ye. Ev rêgez ji bo nûçeyên analîzî an jî nûçeyên ku têde şîrove hene hatiye bikaranîn û derketiye pêş. Li gor vê teknîkê hemû hevokên nûçeyê li gor nirxa nûçeyê di heman astê de ne, nûçegihan hemû agahî û belgeyan dinirxîne û ji bo peyama sereke ya nûçêyê van yekûyek şîrove dike û di nûçeyê de perçe perçe agahî û belgeyan parvedike û diweşîne. Di wan nûçêyan de divê xwendevan nûçeyê ji serî heta bini bixwîne û heta ku bi temamî nûçeyê nexwîne nayê fehmkirin ku armanc û mijara nûçeyê çi ye.[75]

Minak;

**Baskên Hêro Talabanî û Kosret Resûl bi hev ketin**

**Şerê Nav YNKê Geş Dibe**

Li RHKê, di demeke ku li dij qeyrana siyasî û aborî hewleke mezin a bergiriyê hatiye destpêkirin, rikberiya di navbera Cîgirê Sekreterê Giştî yê YNKê Kosret Resûl û Hevsera damezirînerê YNKê Celal Talabanî û Endama Polîtburoyê Hêro Talabanî de aloztir dibe.

Ambargodanîna li ser medyaya YNKê û di derbarê babetê de qedexekirina axaftina rayedaran nîşan dide ku pirsgirêk vê carê aloztir bûye.

Piştî ku Kosret Resûl ragihand ku 'wê Polîtburoya YNKê bêyî Hêro Talabanî bicive' tafilê ji baskê Hêro Talabanî peyamên tûnd hatin dayîn.

Piştî van geşedanan, di şîroveyên siyasî de nirxandina 'Ji nû ve lihevsorbûna herdû baskan, dikare YNKê dabeş bike û her wiha guman tê kirin ku egerî heye ev alozî bandoreke neyênî li qeyrana siyasî ya RHKê jî bike.

Di vê kêliya ku rojeva navxweyî aloziya nav YNKê ye, daxuyaniya Fermandarê Pasdaranê Îranê Mihemmed Elî Ceferî ya 'Em ê nehêlin ku Iraq û Sûriye dabeş bibe' bû sedema şîroveyên wek 'Piştî DYA û welatên rojava ambargoya aborî rakirin, wê Îran di siyaseta dijeKurd de ji berê bêtir pêgir be' Li gel van geşedanên neyênî jî, çavlirê ye ku Serokê RHKê Mesûd Barzanî ku li Hewlêrê mesaiyeke çalak a dîplomasiyê dimeşîne, ji

---

[75] Tokgöz, **b.n.b., r**. 303.

bo yekîtiya mala Kurd, bi hemû nûnerên partiyên siyasî re bicive û daxwaza hewldana yekîtiyê ji wan bike.

**Pandora ya YNKê Vebû**

Di demeke ku ji bo lêgerîna çareseriya qeyrana siyasî YNKê bi PDKê re dest bi civînên ku erênî dimeşiyan kiribû û nîqaşên li ser beşdariya Tevgera Goran a vê pêvajoyê dihatin kirin de, jinûve lihevsorbûna her dû baskên ku ji alî Cîgirê Sekreterê Giştî yê YNKê û Cîgirê Serokê Rêveberiya Herêma Kurdistanê (RHK) Kosret Resûl û Hevsera Celal Talabanî û Endama Polîtburoya YNKê Hêro (İbrahim Ehmed) Talabanî ve têne temsîlkirin, herçend wek ‘YNK belav dibe’ bê şîrovekirin jî, çavdêrên siyasî yên ku YNKê ji nêz ve dişopînin diyar dikin ku ev alozî ne surprîz e û di nav YNKê de tilîyên baskên rikber her li tetikê bûye.

Di 2009’an de piştî ku navê hin rayedarên YNKê bi gendeliya skandala 3 milyar dolarî re hate bilêvkirin, Cîgirê Sekreterê Giştî Newşîrwan Mistefa û hin rayedarên payebilind ên YNKê jê veqetiyan û Tevgera Goran damezirandin.

Di heman demê de piştî ku Serokkomarê Iraqê û Sekreterê Giştî yê YNKê Celal Talabanî ji ber giranbûna nexweşiya xwe dev ji siyaseta çalak berda, di YNKê de aloziyeke navxweyî rû da, Hêro Talabanî aboriyê û Kosret Resûl jî hêzên leşkerî xist bin kontrola xwe.

Her wiha qada akademî û dîplomasiya YNKê jî kete kontrola Endamê Polîtburoyê yê wê demê û 3. Cîgirê Sekreterê Giştî yê niha Dr. Berhem Salih. Ji endamên Polîtburoyê Mele Bextiyar ku zavayê malbata Talabaniyane û niha 2. Sekreterê Giştî yê YNKêye, piştgirî da Hêro Talabanî û BerpirsêRagihandinê Azad Cundiyanê jî piştgirî da Kosret Resûl. Li gel hewlên Mele Bextiyar ên hevsengdariya navbera baskan jî, ji ber ku Hêro Talabanî hemû dosyayên aborî û darayî ji beşên din ên YNKê vedişêre û nerazîbûnên ji mêj ve hene, alozî mezintir bû. Piştî ku çend roj berê Dr. Berhem Salih, Kosret Resûl û Hêro Talabanî ji bo çareserkirina pirsgirêkan li hev civiyan lê ji vê civînê jî encamek derneket Kosret Resûl, bêyî vexwendina Hêro Talabanî, banga kombûna Polîtburoya YNKê kir û piştî vê bangê rageşiya navxweyî aloztir bû. Piştî vê banga Kosret Resûl, rayedarên YNKê yên ku nêzîkî Hêro Talabanî ne, ragihandin banga Kosret Resûl di wan de gumanan der kirî û got: “Hewce nake ku em bersivê jî bidin.” Van rayedaran di peyama bertekdanînê de her wiha gotin: “YNK, wê nehêle kesayetek

ku îradeya xwe radestî partiyeke din kirî ye bêyî Hêro Talabanî polîtburoyê kom bike." Piştî van bertekan, di bersivandayîna pirsên BasNûçe'yê de Parlamentê YNKê Goran Azad ragihand ku her kes ji giraniya barê pirsgirêkên Kurdistanê agahdar e û wê tehamula gelê Kurd nikaribe zêdetir giranî hilgire û wiha got: "Çareseriyeke ku ji xalên hevbeş ên ku her kes dikare xwe tê de bibîne pêwîst e. Tu kes nikare xwe ji qeyrana RHKê azade bike. Divê em hemû berpirsyariyên xwe bizanibin." Ji hêla din Rojnameya Fermî ya YNKê Kurdistanî Nwê ku di bin kontrola Hêro Talabanî de ye, ragihand ku YNKê 'Peymana Stratejîk' a ku 10 sal berê bi PDKê re îmze kiribû bi dawî kirî ye û ji bo YNK û PDK bi hev re tevbigerin pêwîstî bi pêkanîna peymaneke nû heye.

**Goran Azad: Cîgirê Sekreterê Giştî Dikare Biryar Bide**

Goran Azad di bersivandina pirsen BasNûçe'yê de diyar kir ku wek Cîgirê Sekreterê Giştî, Kosret Resûl ji bo YNKê ji vê rewşê derxe dikare biryaran bide, lê belê nabe ku YNK bide dû partiyeke din a siyasî û got: "Divê YNK nebe aliyek rikberiyên siyasî û di bin serokatiya Cîgirê Sekreterê Giştî de dikare biryaran bide. Ger ku YNK van babetan nexe rojeva xwe, wê gavê mafê partiyên din heye ku rojevê diyar bikin."

Endamê Lîste ya Kurd a Parlamena Iraqê Newzad Resûl jî ji BasNûçe'yê re ragihand ku ji ber Kosret Resûl baş dizane ku pirsgirêkên navxweyî yên YNKê mezin in, wê bi baskekî re bicive û piştî vê civînê wê hin mesele aşkere bibin. Newzad Resûl di derbarê naveroka civînê de tu agahî neda lê da zanîn ku wê pirsgirêk baştir bêne dîtin û ji bo çareserkirina pirsgirêkan wê gavên nû bêne avêtin. Li gor agahiyên jêderên Silêmanî, tê gotin ku ew baskê ku wê bi Kosret Resûl re bicive, Berhem Salih û kesên nêzîkî wî ne.

**Kosret Resûl: YNK Em in û Em Venaqetin**

Piştî banga civîna bêyî Hêro Talabanî û bertekên hatin nîşandan û gotegotên ku wê Kosret Resûl û endamên polîtburoyê yên nêzîkî wî ji YNKê veqetin, Resûl axivî û got: "Ev pirsgirêkên navxweyî ji alî dildarên YNKê ve nayên qebûlkirin. Ev ne pirsgirêkên şexsî, pirsgirêkên li ser rêvebirina YNKê ne. Di rêznameya YNKê de şêweya rêvebirin û meşandina xebatû helwestên YNKê aşkere ne. Lê mixabin karûbar li gor rêznameyê nameşin. Ji ber ziyan li YNKê nebe û ji bo xatirê Sekreterê Giştî Birêz Mam Celal Talabanî û xizmên şehîdan, em heta îro bêdeng man. Lêbelê em dibînin hin hevalên me ji vê bêdengiyê çewt têgihîştine, bi texlîtkirina hin partiyên din rola Cîgiriya

Sekreterê Giştî hilgirtine ser xwe.” Di derbarê angaştên veqetandina ji YNKê de jî Resûl destnîşan kir ku ew xwe wek xwediyê YNKê dibînin, ji ber vê yekê jî di ajandaya wan de tiştek wisa tune ye û got: “YNKem in û em venaqetin.” Kosret Resûl di derbarê qeyranên siyasî û aborî de jî diyar kir ku di derbarê qeyranan de nêrîna wan nêrîna YNKê ye, pirsgirêka serokatiyê pirsgirêkeke hem siyasî û hem jî hiqûqî ye û got: “Lê bele nêrîna min a şexsî ew e ku divê RHKê ji pergala serokatiyê derbasî pergala parlamaniyê bibe.”

**Ata Selawî: YNK Parçe Nabe, lê bi Goran re Dibe Yek**

Endamê Polîtburoya YNKê Ata Selawî di derbarê mijarê de pirsên BasNûçe’yê bersivand û ragihand ku tu pevçûn û alozî di navbera wan de tune ye, ji ber ku YNK partîyek sosyal demokrat e, fikrên cuda di nava xwe de dihewîne û ev dewlemendiya YNKê ye. Ata Selawî diyar kir ku Kosret Resûl û Hero Talabanî jî endamên Polîtburoya YNKê ne û got ku YNK di kongreya xwe a 1992’yan de ji rêxistinek şoreşger vegûheriye partiyek sosyal demokrat û fikrên cuda asayî ne. Selawî got, “em pêvajoyek ne di rê de dijîn. Ji bo ku YNK vê qeyranê derbas bike, pêwîst be wê hemû partî bibin yek. Qeyrana serokatiyê, qeyrana aboriyê, rêvebirinê, yasayî û civakî wê bi vî awayî bên çareserkirin. Me îhtîmala yekbûna YNK û Goranê jî ji Selawî pirskir û Selawî diyar kir ku li ser vê mijarê hevdîtin û xebat didomin. Selawî wiha axivî: “Wê ji hevgirtina YNK û Goranê hêzêke mezin a çareseriyê derbikeve. YNK û Goran jî vê yekê dizanin. Lê ji niha ve ne rast e ku tiştekê bibêjim.”

**“Goran di Şertên Xwe de Pêgir e”**

Li aliyê din, hat ragihandin ku bi berdewamkirina hevdîtinên di navbera PDK û YNKê de hewlên ji bo Tevgera Goran beşdarî diyalogê bibe encam nedane. Endamê Parlamana Iraqê yê Goran Şîrîn Riza, di derbarê hevdîtinên YNK û Goranê de ji BasNûçe’yê re axivî. Riza diyar kir ku YNK dixwaze Goran û PDKê nêzikî hev bike, lê heta ku şertên wan ên vegera ser postên xwe yên serokparlaman û wezîrên wan bi cih neyên, ew beşdarî civînan nabin. Riza got: “Ji ber vê yeke me pêşniyaza YNKê qebûl nekir. Em ê beşdarî cîvîna Serokê RHKê Mesûd Barzanî ya ku wê bi hemû aliyan re pêk bîne jî nebin.”

Endamê Polîtburoya YNKê Letîf Şêx Omer jî ji BasNûçe’yê re axivî û got ku di rewşeke ku her kes şertên xwe derdixe pêş de, vegera diyalogê ne pêkan e û divê PDK û

Goran, ji van helwestên xwe vegerin. Omer, di berdewamiya axaftina xwe de destnîşan kir ku eger Goran, neyînî nêzîkî hewlên wan ên beşdarkirina diyalogê bibe, ew ê vê yekê qebûl nekin. Berdevkê Tevgera Goran Şoreş Hecî jî di civîneke çapemeniyê de dîsa PDKê tawanbar kir û da zanîn ku ew biryara Encûmena Şûra ya Bilind a Wezareta Dadê ya dirêjkirina maweya Serokatiya Mesûd Barzanî qebûl nakin û di derbarê referandûma serxwebûnê de jî got: "Lê belê em piştgirî didin referandûma serxwebûnê."

**Ji PDKê Berteka Danezana Goran**

Ji aliyêkî ji bo qeyranên li RHKê bê çareserkirin hem reformên brokratîk û hem jî yên darayî pêk tê. Ji aliyê din ve jî di Lijneya Wezîran ve piştî civînek dûr û dirêj biryar dan ku mûçeyên karmend û mamosteyan nîvî nîvî ew ê were razandin. Tevgera Goran bi hinceta vê biryarê danezanek dijwar li dijî çareseriyê weşand û helwesta xwe astek bilindtirkir. Piştî danezana Goranê, li Silêmanî û Navçeya Seyidsadiq alîgirên Goranê êrişê şaxên PDK, Komel û Yekgirtû kiribûn û di bûyeran de çend kes brîndar bûbûn. Goran, di danezanê de PDKê bi çaresernekirina pirsgirêkên gel, guhnedayîna hewara karmend û mamosteyan, bi van awayan jî bi binpêkirina yasayan sucdarkir û ji partiyên din jî xwestin ku li dijî PDKê helwestê bigrin. Di danezanê de peyvên mîna ku hikûmet û Serokatî ne rewa ye bi dijwarî bikaranîbûn. Piştî vê yekê ji PDKê jî daxuyaniyek dijwar hat parvekirin.

Di daxuyaniya Navenda Giştî ya PDKê de da zanîn ku pirsyarî hatiyedayîn lê tevgera Goran vê berpirsyariya xwe ne aniye cîh û bi helwesteke ji pirsyariyê dûr û tijî derew danezan weşandine û Goran bi vî awayî ji pirsyariyê dûr dikeve û ser têkçûna xweyî siyasî jî dinixûmîne de hate sucdarkirin. PDK, di daxuyaniya xwe ya 7 xalan de Goran bi siyaseteke li heremê gengeşî pêk were dişopîne de hat sucdarkirin di berdewamiya daxuyaniyê de PDKê nûnerê gel yê esas e û ji bo çareserkirina pirsgirêkên gel hewldidin û di vê hewldanê de jî bi pêgirbin.[76]

Mînak**;**

**Li Herêma Kurdistana Iraqê Xebatên Avakirina Hikûmetê**

Li herêmê di ser hilbijartinên parlamentoyê de 4 meh derbas bû û hê jî hikûmet nehatiye avakirin.

---

[76] Basnûçe, şerê nav YNKê geş dibe, 28ê Çileya 2016an, file:///C:/Users/abalta/Downloads/BasNu%C3%A7e%2087%20(1).pdf, (Dema Gihanê: 15.02.2013).

ERBÎL (AA) - Li Herêma Kurdistana Iraqê di ser hilbijartinên parlamentoyê de 4 meh derbas bû û hê jî hikûmet nehatiye avakirin. Di hilbijartinê de Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) bû partiya yekemîn û namzedê Serokwezîrtiyê Nêçîrvan Barzanî ji bo ku hikûmeteke berfireh were avakirin xebatên xwe didomîne.

Bi hemû hawirdorên siyasî re hevdîtin hatiye kirin û heta niha ji aliyê serokên siyasî ve rexneyên tûj nehatine kirin û li gor lihevkirinê hemû partiyên siyasî dixwazin di hîkûmeta nû de cih bigirin.

Di 21ê îlona sala çû de li bajarên Hewlêr, Dihok û Silêmaniyeyê hilbijartinên parlamentoyê hatin kirin û partiya muxalefetê Goran di hilbijartinê de bû partiya duyemîn. Li ser vê PDKyê ji bo ku di nav hikûmetê de cih bigirin bi hemû aliyên siyasî re axivî. Lê dîsa jî li Herêma Kurdistana Iraqê di ser hilbijartinên parlamentoyê de 4 meh derbas bû û hê jî hikûmet nehatiye avakirin.

Serokê Giştî yê Komeleya Îslamî Elî Bapîrderbarê xebatên avakirina hikûmetê de daxûyanî da nûçegihanê AAyê û destnîşan kir ku hê hemû aliyên siyasî li hev nekirine. Bapîr diyar kir ku divê di serî de PDK hemû aliyên siyasî di avakirina hikûmetê de cih bigirin û wiha got: "Partiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) avakirina hikûmetê asteng dike û bi derengî dixe. Divê hemû alî fedekariyê bikin û hikûmetê ava bikin. Divê em li dijî êrîşên ku ji derve tên bibin yek. Divê partiyên siyasî her tiştî deynin dera hanê û welatparêziyê biparêzin."

Bapîr destnîşan kir ku hêvî û daxwaza wan ew e ku hikûmeteke ku hemû alî tê de cih digirin ava bibe û ew jî wek perçeyekê vê hevkariyê dixwazin xizmeta gelê xwe bikin û wiha dewam kir: "Piştî hilbijartinê hikûmet û muxalefet nema. Çimkî niha her kes dikare di hikûmetê de cih bigire. Em niha 5 alî ne û dixwazin hikûmetê ava bikin. Divê ev hikûmet teqez were avakirin. Divê her kes di van xebatan de cih bigire û hewl bide."

**"Hemû Partî Hem Hîkûmet û hem Muxalefet in"**

Bapîr diyar kir ku divê her kes li gor hêza xwe biaxive û daxwazan bike û wiha got: "Divê berpirsiwar bi eqlê selim tevbigerin. Divê em Kurdistanê nekin qurbana partiyekê. Bila kes me rexne neke, çimkî li holê ne hikûmetek heye û ne jî muxalefetek heye. Hemû partî hem hîkûmet û muxalefet in."

Bapîr serdana lijneya ku di serokatiya Nêçîrvan Barzanî de çûn Bexdayê nirxand û wiha axivî: "Divê hin civînên din jî werin kirin. Ev pirsgirêk bi civînekê nayên çareserkirin. Em dixwazin di nav hemû karên baş de cih bigirin."

**"Em li Hember Nîn in ku Du Alîkarên Serokwezîr Werin Diyarkirin"**

Endamê Polîtburoya YNKyê Sadî Pîre jî destnîşan kir ku hin hawirdorên siyasî YNKyê li ber avakirina hikûmetê wek asteng dibînin. Pîre diyar kir ku sedema avanebûna hikûmeta nû partiyên siyasî nînin, encamên hilbijartinê ne û wiha got: "Encamên hilbijartina dawîn hevkêşeke din derxist holê. Berê tenê navê PDK û YNKyê hebû. Lê êdî dixwazin ku partiyên ku berê muxalefet bûn tevlî hikûmeta nû bikin. Di hilbijartinê rayên herî zêde PDKyê sitend û ji bo hikûmeta nû bi partiyên din re cihê cihê diaxive û dixwazin hikûmeta nû ava bikin."

Pîre destnîşan kir ku heke bi lez û bez hikûmeta nû were avakirin dê hin pirsgirêk derkevin holê û wiha axivî: "Bi hemû aliyan re hevdîtin hat kirin. Di van rojên dawîn de tê gotin ku dixwazin du alîkarên serokwezîr werin diyarkirin. Di vê mijarê de şertên me yên mezin tunene. Goran dibêje 'em partiya duyemîn in û divê PDK jî li gor vê bi me re tevbigere'. Lê daxwaz û banga hikûmeteke berfireh ji me kir. Divê Goran şêweyê xwe biguherîne û zimanekî ku hevkariyê derdixe pêş bi kar bîne. Bi vî awayî em dikarin xizmeta welat û gelê xwe bikin. Têkiliya me ya bi PDKyê re ji Goranê cudatir e. Peymaneke me ya stratejîk heye û em li gor vê tevdigerin."[77]

## 3.3. DI NÛÇEYAN DE GIRÎNGIYA BEKRAUNDÊ

Bekraund perçeyekî herî girîng ê mijara nûçeyê ye. Hin nûçe hene ku dema mîrov qala bekraunda mijarê neke ji nûçeyê tu tişt nayê fehmkirin û di metnê de kêmasiyeke mezin çêdibe.

Niha em li ser metna jêrîn bisekinin û naveroka nûçeyê analîz bikin.

---

[77] Anadolu Ajansı, Li Herêma Kurdistana Iraqê xebatên avakirina hikûmetê, 24ê Çileya 2014an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Arsiv, (Dema Gihanê: 24.01.2014).

Mînak:

**Sernav: “Xwestin Serdestiyê ji Destê Gel Bigrin û Bidin Dadgehê”**

**Spot:** Serokwezîr Recep Tayyip Erdoğan li Ofîsa Dolmabahçeyê ya Stenbolê bi rojnamevan û nivîskaran re hate bal hev.

ÎSTANBÛL (AA) - Serokwezîr Recep Tayyip Erdoğan derbarê geşedanên dawîn de bi rojnamevan û nivîskaran re hate bal hev.

Serokwezîr Recep Tayyip Erdoğan di destpêka civînê de axivî. Erdoğan di axaftina xwe de wiha got: "Ev operasyona ku di bin navê gendeliyê de hat kirin, di rastiyê de ne operasyoneke normal e, operasyoneke piralî ye û bi hiqûqê re ne têkildar e. Di vê bûyerê de tiştê bi xêr bû ku gelê me bi dewleta paralel hesiya û dît ku çawa dixwazin dewletê bikin nav lepên xwe. Bi ya min di vê pêvajoyê de tiştê xêrê ev bû."

Serokwezîr Erdoğan axaftina xwe wiha domand: "Di vê pêvajoyê de xwestin ku li Tirkiyeyê derbeya dadgehê pêk bînin. Me ev dît. Xwestin serdestiyê ji destê gel bigrin û bidin dadgehê. Em li dijî vê derketin û em ê tim derkevin jî. Cardin dubare dikim, li Tirkiyeyê hikûmet tenê bi hilbijartinê tên û bi hilbijartinê ve jî diçin. Ji bilî îradeya gel tu îradeyeke din nikare hikûmetê biguherîne."[78]

**Analîz:** Di nûçeyê de behsa hevditîna Serokwezîr Erdoğana bi rojnamegeran re hatiye kirin. Nûçe bi hevoka “Serokwezîr Recep Tayyip Erdoğan derbarê geşedanên dawîn de bi rojnameger û nivîskaran re hate bal hev” destpêkiriye û di berdewamiyê de jî cih daye hin gotinên Serokwezîr Erdoğan.

Gava ku em nûçeyê dixwînin û naverokê analîz dikin em dibînin ku derbarê **“geşadanên dawîn”**ên ku bûne sedama hevditînê de tu agahî tune ne. Yanê ev hevditîn çima pêk hatiye? Serokwezîr çima gotiye ku **“Xwestin serdestiyê ji destê gel bigrin û bidin dadgehê”** û hin duxuyaniyên din dane? Ev ne diyar in.

Nûçe bi zimanekî zelal hatiye nivîsandin lê ji ber ku di naverokê de cih nedane bekraundê xwendevan nizanin ku Serokwezîr Erdoğan çima bi rojnamegeran re hatiye ba hev û ew daxuyanî daye? Her wiha ji ber tunebûna bekraundê di nûçeyê de kêmasiyên mezin derketine.

---

78 Anadolu Ajansı, Xwestin serdestiyê ji destê gel bigrin û bidin dadgehê, 4ê Çileya 2014an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Arsiv, (Dema Gihanê: 04.01.2014).

Rojnamegerê ku ew nûçe nivîsandiye heke qala geşadanên dawîn û sedama hevditîna Serokwezîr Erdoğana bi rojnemgeran re bikira dê baştir bûbûya û ew kêmasî jî çênedibû.

Mînak;

Di nûçeya jêrîn de jî hin kes di çêm de roda çûnê û derbarê xebatên xelaskirinê de agahiyan dide. Di dawiyê de jî qala paşeroja rûdanê yanê bekraundê dike û ya rast jî ew e. Di nûçeya de bi berfirehî qala bûyerê hatiye kirin û xwendevan jî derbarê bûyerê de agahdar dibin. Ev nûçe ji bo begraundê mînakeke baş e.

**Li Sêrtê ji bo Jina ku Roda Çûbû bê Dîtin Xebat Dewam Dikin**

Li Perwariya navçeya Sêrtê ji bo Emîne Gurbuza ku di çem de roda çûbû bê dîtin, xebat dewam dikin.

SÊRT (AA) - Li Perwariya navçeya Sêrtê ji bo Emîne Gurbuza ku di çem de roda çûbû bê dîtin, xebat dewam dikin.

Li Zozana Çemîkareyê ya gundê Yukaribalcilarê 6 roj berê 4 jin roda çibûn û ji wan 3 kes hatibûn dîtin. Cendirme û xebatkarên AFADê bi hev re dixebitin ku Emîne Gurbuza winda bibînin.

Midûrê Şaxa Sêrtê yê AFADê Cahît Akkoyun ji nûçegihanan re daxuyand ku jinek birîndar hat dîtin, lê cesedê her du jinên din ji çem hatin derxistin.

Akkoyun got ku ew niha hewl didin ku Emîne Gurbuz jî bê dîtin û wiha axivî: "Rêya çem dijwar e û ji ber vê xebatkarên AFADê bizehmetî dixebitin. Me ji Şaredariya Çatakê alîkarî xwest, em ê rêya avê biguherînin ku li cihên ku em nikarin bikevinê bi rehetî bixebitin."

Bûyer:

Li zozana Çemîkareyê ya gundê Yukaribalcilarê di 10ê hezîranê de Hadiye Eryilmaz (67), Emîne Gurbuz (79), Murî (67) û Azîme Toraman (50) ji bo ku pincarê berhev bikin û bixin nav penêr çibûn gerê. Dema destê hev girtibûn ku ji çêm derbas bibin roda çûbûn. Cesedê Murî Toramanê ji avê hatibû derxistin. Azîme Toraman jî birîndar hatibû xelaskirin û di nexweşxaneyê de hatibû tedawîkirin. Piştî du rojan jî

cesedê Hadiye Eryilmazê hatibû dîtin. Emîne Gurbuz hê winda ye û xebat tê kirin ku ew bê dîtin.[79]

### 3.4. RÊBAZA 3 Ç 3 Kyê

Di nûçeyan de lazime ku nûçegihan bersiva 3 Ç û 3 Kyê bide (Çi? Çima? Çawa? Kî? Kîngê? (Li) Ku derê?) û dest bi nivîsîna nûçeyê bike. Lê îro bi taybetî di nûçeyên magazînê de ev nayên bikarinîn û bersiva 'kî bi kê re çi dike?' didin û ev jî li Tirkiyeyê dejenerebûna rojnamegeriyê nîşan dide.

Rojname û rojnamegerên cidî girîngiyê didin rêgeza 3 Ç û 3 Kyê û xwîner û temaşevanên xwe ji rûdan û bûyeran agahdar dikin.

Di nûçeyan de heke bersiva 3 Ç û 3 Kyê neyê dayîn ev dibe sedema kêmasiyan.

Serokê Herêma Kurdistana Iraqê Mesud Barzanî duh bi balafirê ji bo ku beşdarî konferansa navneteweyî ya li ser Kurdên rojava bibe ji Hewlêrê derbasî Diyarbakirê bû.

**Çi**: Barzanî çû Amedê

**Çima:** Ji bo konferansa navneteweyî ya li ser Kurdên rojava

**Çawan:** Bi balafirê

**Kî:** Mesûd Barzanî

**Kîngê:** Duh

**Ku derê:** Hewlêr

Niha em nûçeya jêrîn analîz bikin ka gelo bersiva pirsên jorîn heye an na?

**Rewşa Kurdên Qazaxistanê**

Kurd dikarin di her warî de her xebatê bikin

Kurdên Qazaxistanê di sirgunê de gelek zilm dîtibûn. Lê piştî belavbûna Yekîtiya Sowyetan rewşa Kurdên qazaxistanê jî baş bû. Niha di warê aborî, siyasî û çandî de dikarin her karî bikin. Herwiha gelek Kurdên Tirkiyeyê jî hene ku ji bo bazirganiyê çûne Qazaxistanê.

---

[79] Anadolu Ajansı, Li Sêrtê Ji Bo Jina Ku Roda Çûbû Bê Dîtin Xebat Dewam Dikin, 16yê Xezîrana 2015an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin /YayinMenu.aspx?t=Arsiv, (Dema Gihanê:16.06.2015).

Kurdên Qazaxistanê di sirgunê de gelek zehmetî dîtibûn û gelek zilm li wan hatibû kirin.

Piştî belavbûna Yekîtiya Sowyetan rewşa Kurdên Qazaxistanê jî baş bû.

Êdî Kurdên li wir dikarin di warê aborî, siyasî û çandî de her xebatê bikin û bikevin parlamentoyê.

Piştî zêdebûna derfetan Kurd jî li Qazaxistanê dest bi xebatên çandî dikin û gelek xebatên hêja derdikevin.

Ji aliyê din gelek Kurdên Tirkiyeyê jî hene ku ji bo xebatê diçin Qazaxistanê.[80]

**Çi:** Xebatên bazirganî, çandî û siyasî çi ne? Ne diyar in.

**Çima:** Armanca wan xebatan çi ye û çima dikin? Ne diyar e.

**Çawan:** Wan xebatan bi çi û çawa dikin? Ne diyar e.

**Kî:** Navê Kurdên ku xebatan dikin çi ne? Ne diyar e.

**Ku derê**: Ev xebat li kîjan bajar û herêmên Qazaxistanê tê kirin? Ne diyar e.

Wekî din di nûçeyê de behsa Kurdên Tirkiyeyê tê kirin. Ev Kurd kî ne? Kirde yanê em navên wan kesan nizanin. Çi dikin û çawa dikin? Ev jî ne diyar in. Derbarê hûrgiliyên nûçeyê de tu agahî tune ne. Ji ber van sedaman jî di nûçeyê de kêmasiyeke mezin heye û nûçe ji aliyê 3 Ç û 3 Kyê ve xelet e.

---

[80] TRT NÛÇE, Rewşa Kurdên Qazakistanê, 18yê mijdara 2015an, http://www.trtnuce.com/haber /jiyan/rewsa-Kurden-qazakistane-25460.html, (Dema Gihanê:18.11.2015).

# BEŞA ÇAREMÎN

# BIKARANÎNA LÊKER, DÎROK, SAET Û PIRSGIRÊKA STANDARDÎZEKIRINÊ

## 4.1. LÊKERÊN NÛÇEYAN

Hin axaftin di nûçeyan de dirêj in û rojnameger mecbûr dimînin ku wan hevokan bi hev ve girê bidin. Ji bo vê jî lêkerên nûçeyan du an sê hevokan bi lêkeran ve dikin yek û nûçeyên xwe dinivîsin.

Di nûçeyên Tirkî de 'söylemek, açıklamak, belirterek şöyle konuştu, kaydederek, dedi, hwd.' wek lêkerên nûçeyan tên bikaranîn.

Di nûçeyên Kurdî de jî gelek lêker hene, lê divê ev lêker di cih de bên bikaranîn.

**Got**:

Heke nûçe bi lêkera 'got'ê dest pê bike divê gihaneka 'ku'yê bê bikaranîn. An jî divê hokera 'Wiha'yê bê pêşiya lêkera 'got'ê.

**Minak:**

Serokomar Recep Tayyip Erdoğan got ku dê îro bi Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Barack Obama rê bênê ba hev.

**Wiha Got:**

Wezîrê Pêşketinê Cevdet Yilmaz ragihand ku di warê pêvajoya çareseriyê de pêşveçûnên baş diqewimin û wiha got: "Ger çek ji dewrê derkevin him ji hêla mirovî û him jî ji hêla aborî û pêşketinê ve dê baştir bibe."

**Xebarda:**

Heke nûçe bi lêkera **'xeberda'**yê dest pê bike divê hokera '**Wiha**'yê bê pêşiya lêkera **'xebarda'**yê.

Mînak: Serokê Partiya Komeleya Îslamî (Komel) ya li Herêma Kurdistana Iraqê Elî Bapîr derheqê rûdanên tundiyê yên li bajarê Silêmaniyeyê de îdia kir ku heger di nava aliyan de lihevhatinek pêk neyê wê rewş xerabtir be.

Bapîr daxûyanî da peyamnerê AAyê û wiha xeberda, "Ji bo çareserkirina rewşa li herêma Kurdistanê hewce ye ku 5 serokên partiyên siyasî bicivin. Heger alî li hevdu nekin îxtimal heye ku rewş xerabtir be."[81]

**Wiha Axivî:**

Hevserokê Giştî yê HDPyê Selahattîn Demirtaş wiha axivî: ”Her çiqas maseya aştiyê wergeriya be jî sererastkirina wê di destê me de ye. Her yek ji me bila ji koşeyeke wê bigre û em wê maseya aştiyê rast bikin. Yên ku divê li ser maseyê rûnên bila rûnên û vê mijarê çareser bikin.“

**Axivî:**

Hevserokê Giştî yê HDPyê Selahattîn Demirtaş li ser meselaya çareserkirina meseleya Kurdan axivî û wiha got: ”Her çiqas maseya aştiyê welgeriya be jî sererastkirina wê di destê me de ye. Her yek ji me bila ji koşeyeke wê bigre û em wê maseya aştiyê rast bikin. Yên ku divê li ser maseyê rûnên bila rûnên û vê mijarê çareser bikin.“

**Anî Ziman:**

Hevserokê Giştî yê HDPyê Selahattîn Demirtaş çareserkirina meselaya Kurdan anî ziman û wiha got: ”Her çiqas maseya aştiyê wergeriya be jî sererastkirina wê di destê me de ye. Her yek me bila ji koşeyeke wê bigre û em wê maseya aştiyê rast bikin. Yên ku divê li ser maseyê rûnên bila rûnên û vê mijarê çareser bikin.“

**Wiha Anî Zaman:**

Hevserokê Giştî yê HDPyê Selahattîn Demirtaş, fikren xwe yên derbarê çareserkirina meselaya Kurdan de wiha anî ziman: ”Her çiqas maseya aştiyê wergeriya be jî sererastkirina wê di destê me de ye. Her yek me bila ji koşeyeke wê bigre û em wê maseya aştiyê rast bikin. Yên ku divê li ser maseyê rûnên bila rûnên û vê mijarê çareser bikin.“

---

[81] Anadolu Ajansı, Ji bo çareserkirina krîza li Herêma Kurdistanê pêşniyazeke nû, 22yê Sibata 2016an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/ YayinMenu.aspx?t=Arsiv, (Dema Gihanê: 22.02.2016).

**Ragihand:**

Serokkomar Recep Tayyip Erdoğan ragihand ku dê di demeke kurt de hemû pirsgirêkên Tirkiyeyê çareser bikin.

**Diyar Kir:**

Serokwezîr Ahmet Davutoğlu diyar kir ku ji bo çareserkirina pirsgirêka bêkariyê dê hin projeyan bixin rewacê.

**Eşkere Kir:**

Serokê Herêma Kurdistana Iraqê Mesûd Barzanî eşkere ku kir ji bo ku li dijî rêxistinên terorê bi serkevin dê ji dewletên YAyê çekên nû bikirin.

Di vê hevokê de ji ber ku gihaneka"ku"yê hatiye duberekirin mirov dikare "ku"yekê jê derxe û wiha binivîse.

Serokê Herêma Kurdistana Iraqê Mesûd Barzanî eşkere kir ku ji bo li dijî rêxistinên terore serbikevin dê ji dewletên YEyê çeken nû bikirin.

**An jî:**

Serokê Herêma Kurdistana Iraqê Mesûd Barzanî eşkere kir ji bo ku li dijî rêxistinên terorî bi serkevin dê ji dewletên YEyê çekên nû bikirin.

**Da Zanin:**

Serokê Herêma Kurdistana Iraqê Mesûd Barzanî da zanîn ji bo ku li dijî rêxistinên terorî bi serkevin dê ji dewletên YEyê çekên nû bikirin.

**Vegot:**

Mamoste Îhsan Colemêrgî jî di vê gotûbêja xwe de ji me re vegot ku di Asyaya nêzik de yêkemîn car avahiya xanî û perestgeh, çandina genim û raçandina cil û bergan di bajarên Mezopotamyayê de derketine holê.[82]

---

[82] Vêje û zimanê Kurdî, di şaristaniyên Mezopotamyayê de Kurd, 14yê Mijdara 2014an, http://www.kurtdiliedebiyati.com/haber/198-di-saristaniyn-mezopotamyay-de-Kurd.html, (Dema Gihanê: 26.02.2016).

**Wiha Pêde Çû- Domand:**

Parlamentera êzdî ya Parlamentoya Iraqê Viyan Dexîl derbarê êrîşên DAIŞê yên ku birin ser êzdiyan de axivî û ragihand ku divê ev êrîş di civaka navnetewî de jenosîd bê qebûlkirin. Dexîl wiha pê de çû: "Ji bo ku êrîş wek jenosîd bê qebûlkirin lazim e belgeyên ku têr bikin bên berhevkirin. Li gor agahiyên di destê me de ne 5 hezar û 800 jinên êzdî hatin revandin. Ji wan dîlan 2 hezar û 300 jin hatin xilaskirin. Lê yên din hê jî di destê wan de rehîn in. Welatên Ewropayê ji bo tedawîkirina jinên ku hatine xilaskirin hemfikir in"[83]

**Daxuyand:**

Serokomar Recep Tayyip Erdoğan daxuyand ku şerê navxweyî yê li Sûriyeyê bû sedema mirina hezaran kesî. Erdoğan wiha axivî: "Şerê navxweyî yê Sûriyê ket sala 5emîn. Heta niha ji 400 hezarî zêdetir mirov mirin, 12 miyon mirov cî û warê xwe terk kirin. Hinekên wan li welatê xwe û hinekên wan jî li welatên din bûn penaber…"

**Agahî Da:**

Di qezaya li Qulpa navçeya Îdirê de 2 kes birîndar bûn. Li gor agahiyên ku rayedarên navçeyê dan nûçegihanê me, birîndar rakirine nexweşxaneya dewletê ya navçeyê û rewşa wan jî baş e.

**Destnîşan Kir:**

Lêkera 'destnîşan kir'ê li şûna 'Belirtmek', 'İşaret etmek', 'Vurgulamak', 'Açıklamak' tê bikaranîn.

Serokwezîr Ahmet Davudoğlu destnîşan kir ku Wezîrê Parastina Neteweyî yê nû Wecdi Gönül e.

Davutoğlu wiha got: "Min duh ji bo wezîriya parastina neteweyî Wecdi Gönül pêşniyarî Serokomar kir. Wecdi Gönül berê ev kar kiriye û serkeftî ye. Wê îro jî kar û barên tayînê temam bibin."

[83] Anadolu Ajansı, DAIŞê 5 hezar û 800 jinên Êzdiyan dîl girt, 24ê Sibata 2016an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Yayin, (Dema Gihanê:24.02.2016).

Wecdî Gonul berê di navbera salên 2002-2011an de wek wezîrê parastinê kar kiriye.[84]

**Rêz Kir:**

Parlamenterê HDPyê yê Stenbolê Sırrı Süreyya Önder ji bo demokrasî û aştiyê xalên sereke û bingehîn wiha rêz kir: "………"

**Wiha Berdawam Kir- Domand:**

Parlamenterê Qersê yê HDPê Ayhan Bilgen bi karkerên înşaetê re fitar vekir. Bilgen daxuyand ku li Tirkiyeyê cinayet û qezayên li ser kar pir zêde çêdibin û wiha berdewam kir: "Mixabin welatê me yek ji wan welatan e ku cinayetên kar û qezayên kar pir lê çêdibin. Di meha hezîranê 150 kes di qezayên kar de mirine. Di vê mijarê de em wisa bawer dikin ku divê hem karmend hem karsaz berpirsiwariyên xwe bi cih bînin. Bi piştgiriya medyayê jî, ji bo tişta ku bikeve ser milên me em bikin û balê bikşînin ser girîngiya mijarê, me ev fitar bi hev re vekir."[85]

**Îdia Kir:**

Serokê Partiya Komeleya Îslamî (Komel) ya li Herêma Kurdistana Iraqê Elî Bapîr derheqê rûdanên tundiyê yên li bajarê Silêmaniyê de îdia kir ku heger di nava aliyan de lihevhatinek pêk neyê wê rewş xerabtir be.[86]

[84] Pukmedia, Tirkiyê Wezîrê Parastinê yê nû destnîşan kir, 3yê Tîrmeha 2015an, http://www.pukmedia.com/EN/KK_Direje.aspx?Jimare=30017, (Dema Gihanê: 26.02.2015).
[85] Anadolu Ajansı, Parlementer Bîlgen bi karkerên înşaatê re fitar vekir,26ê Sibata 2016an,https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Arsiv, (Dema Gihanê: 26.02.2016).
[86] Anadolu Ajansı, Ji bo çareserkirina krîza li Herêma Kurdistanê pêşniyazeke nû, 26ê Sibata 2016an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Arsiv, (Dema Gihanê: 26.02.2016).

**Bilêv Kir:**

Li ser navê werzîşvanan Beşîr Zana axivî û pirsgirêkên futbolîstan bilêv kir. Zana got ku ji ber qadên xerab ên futbolê 4 hevalên wan seqet man û êdî nikarin futbolê bi awayêki baş bilizîn.

**Wiha Dom Kir:**

Zana gotina xwe wiha dom kir: “Divê em li ser meseleyên werzîşê bisekinin û pirsgirêkên werzîşvanan çareser bikin. Em li benda wan gavan e ku dê rayedarên dewletê bavêjin….”

**Bi Bîr Xist:**

Serokwezîr Ahmet Davutoğlu, penaberên ku li Tirkiyeyê dimînin bi bîr xistin û wiha got: “Em ê her dem piştgiriyê bidin birayên xwe. Deriyê me ji bo hemû penaberan vekiriye. Ji bo aramî û rihetiya wan em ê bixebitin…”

**Qal Kir:**

Serokwezîr Ahmet Davutoğlu, qala penaberên ku li Tirkiyeyê dimînin kir û wiha got: “Em ê her dem piştgiriyê bidin birayên xwe. Deriyê me ji bo hemû penaberan vekirî ye. Ji bo aramî û rihetiya wan em ê bixebitin…”

**Bal Kişand:**

Serokomar Recep Tayyip Erdoğan di vekirina Forûma Şirîkatiyê ya Bilind a Heftemîn a Somaliyê dexeber da.

Erdoğan bal kişand ser şerê navxweyî yê li Sûriyeyê û wiha xeber da: "Şerê navxweyî yê Sûriyê ket sala 5emîn. Heta niha ji 400 hezarî zêdetir mirov mirin, 12 miyon mirov cî û warê xwe terk kirin. Hinekên wan li welatê xwe û hinekên wan jî li welatên din bûne penaber…”

**Li Ser Sekinî:**

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî li ser êrîşên DAIŞê sekini û ragihand ku dê her tim Kurdistanê li dijî dijminan biparêzin.

**Hişyar Kir:**

Serokerkanê hêzên Pêşmerge yên Kurdistanê hişyarî da û ragihand, li gorî yasayê ti kesek nikare hêzeke çekdarî ji derveyî Wezareta Pêşmerge ava bike.[87]

**Parast:**

Parastin ji 'savunma'ya Tirkî derbasî nûçeyên Kurdî bûye û mirov dikare vê lêkerê rexne bike û bibêje ne hewceye ku di nûçeyan de ev peyv bê bikaranîn.

Yanê mirov dikare bibêje "Ez ê welatê xwe biparêzim" hevokeke rast e. Lê hevokên jêrîn xelet in'' Ev her du nêrîn jî mimkûn in.

*Serokê Giştî yê Partiya Lîberal a Kurdistana Sûriyeyê Salih Mizgeft, parast ku Kurd divê li Iraq û Sûriyeyê di nav koalîsyona navneteweyî ya di bin serkêşiya DYAyê de cî bigirin.*

An jî;

*Cîgirserokê Koma HDPê Îdris Balûken li Meclisê civîna çapemeniyê li dar xist û parast ku Ocalan bi "komploya navneteweyî" anîn Tirkiyê.*

Di van her du hevokan de jî 'parastin' li şûna 'savunma'ya Tirki hatiye bikaranîn. Di mantiqa nûçeyên Tirkî de heke lêkerên 'savunma' û 'îdia etti' di nûçeyekê de hebin wê çaxê xwendevan dizanin ku ev rojnemeger û sazî beşdarî rûdan û gotara ku bûye mijara nûçeyê nabin. Yanê nûçegihan û dezgeh dibêje ku "ew îdiayên wan in û em wek mixatabê xwe nafikirin"

Ji ber ku lêkerên 'savundu, iddia etti, ilerî sürdü' wateya neyînî didin nûçeyê, hin saziyên çapemeniya Kurdan ên li Tirkiyeyê jî lêkerên 'parast û pêş xist'ê bikartînin. Lê lêkera 'pêş xist' wek 'parastin'ê wateyeke neyînî nade nûçeyê û bi min şûna 'vurguladı, altini çizdi'yê digre.

---

87 Kurdistan 24, Serokerkanê Pêşmergeyan hişyarî da Tevgera Goran, 26ê Tebaxa 2015an,http://www.Kurdistan24.net/ku/news/f02bf3ec-38d9-4068-abfb-60fed430eed2/Serokerkan%C3%AA-P%C3%AA%C5%9Fmergeyan-hi%C5%9Fyar%C3%AE-da-Tevgera-Goran, (Dema Gihanê: 26.02.2016).

**Nirxand**:

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî êrîşên DAIŞê nirxandin û got ku dê her tim Kurdistanê li dijî dijminan biparêzin.

**Şîrove Kir:**

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî êrîşên DAIŞê yên li ser Şengalê şîrove kir û got ku dê her tim Kurdistanê li dijî dijminan biparêzin.

**Bersiv Da:**

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, bersiv da gotinên Serokwezîrê Iraqê Nûrî Malîkî û got ku dê her tim Kurdistanê li dijî dijminan biparêzin.

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, bersiv da pirsên rojnamegeran û got ku dê li hemberî erîşên DAIŞê her tim Kurdistanê biparêzin.

**Rexne Kir:**

Hevserokê Giştî yê HDPyê Selahattîn Demirtaş di Civîna Koma TBMM'yê ya partiya xwe de axivî.

Demirtaş got ku 21ê sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî ye û li Tirkiyeyê gelek ziman ber bi windabûnê ve diçin û wiha axivî: "Li Tirkiyeyê Kurdî li gor dewletê hê jî di nav wan zimanan de ye ku jê tên ditirsin. Bi tiştên ku li Sûr û Cizirê tên kirin ve pirsgirêka Kurdî nayê çareserkirin. Li Silopiyê 27 roj derketina derve hat qedexekirin û ji ber vê 500 ciwan derketin çiyê."

Demirtaş hikûmet rexne kir û wiha dewam kir: "Bombeya ku li Enqereyê teqiya jî, yên ku li Sûrê, Cizîrê, Sirûcê, Gara Enqereyê û Siltanehmedê teqiyan jî encama heman nêrîna siyasî ye. AKP berpiryarê siyasî ya vê ye. Baş e em ê tu pirsan ji wan nekin? Li Sûrê sivîl dixwazin derkevin derve lê hêzên ewlehiyê nahêlin. Me hêzên ewlehiyê wek dijmin nedît û em nabînin jî. Lê nêrîna we ya faşîst dijminê vî welatî ye."[88]

[88] Anadolu Ajansı, Civîna Koma TBMMyê ya HDPyê**,** 23yê Sibata 2016an,https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Yayin, (Dema Gihanê: 23.02.2016).

### 4.1.1. Di Nûçeyan de Tebatî

Di Kurdî de lêkerên pasîf ji 'hat-hatin' û 'tê'yê pêk tên. Gava ku ew peyv tên ber lêkeran wê çaxê hevok û lêker dibin pasîf.

Mînak:

Diyar bu- Hat diyarkirin

Got- hat gotin

Got- tê gotin

Eşkere bû- hat eşkerekirin

Ragihand- hat ragihandin

Mînak:

Agahî hat dayîn- Agahî dan

Hat pêşniyarkirin- Pêşniyar kirin

Daxuyanî hat dayîn- Daxuyanî dan

Çawa ku di çîrok, gotar, makale û axaftina rojane de bikaranîna peyvan ji hev cûda ye, her wekî vê yekê jî lazim e lêkerên ku di nûçeyan de tên bikaranîn jî li gor zimanê taybet ê nûçeyan be.

Mînak:

Wezareta Karên Derve daxuyaniyek belav kir û got: "Em beşdarî lijneya Neteweyên Yekbûyî bûn" û Wezaretê ragihand dê di pêşerojê de jî tevlî wan civînan bibin. Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku di lijneyê de wê encamên baş derkevin holê.

Di vê hevoka jorîn de tê dîtin ku lêkera pasîfekirinê "Hatin" bi mecbûrî hatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê jî dema mirov bala xwe bide van her du mînakan û van analîz bike wê têbigihê ku di nûçeyan de lazim e lêkerên pasîf jî werin bikaranîn.

Ji aliyê din ve ziman jî wekî însanan zindi ye û li gor dem, dewran û hewcedariyan diguhere. Ev guhertin carna ji aliyê wateyê ve xwe dide der, carna ji aliyê bilêvkirina peyvê ve carna jî ji aliyê rêzimanê ve derdikeve pêş.

Mînak: di nûçeyên Tirkî yên berê de wiha dihat gotin: “Başvekil Menderes BM doruk toplantısına katılmıştır”

Di vê mînakê de ji gelek aliyan ve guherîn çêbûye. Mesela peyva “Doruk” îro wek “Zîrve”yê tê bikaranîn. Her wiha lêkera “Katılmıştır”ê jî îro bûye “Katıldı”. Yanê dema boriya çîrokî rabûye û bûye dema boriya têdeyî.

Wekî guherîna di vê mînaka jorîn de dibe ku di axaftina rojane de lêkerên pasîf zêde nehatibin bikaranîn. Lewra dema mirov bala xwe dide axaftina dê, bav û gundiyên xwe dibîne ku tu kes bi tu awayî lêkerên pasîf ên wekî “hat, tê”yê bi kar neanîne. Lê wekî me li jor jî diyar kiribû ziman li gor hewcedariyan diguhere. Îro di zimanê Kurdî yên nûçeyan de jî em dikarin van lêkerên jêrîn ên pasîf bi rihetî bi kar bînin.

Hat kirin, hat îdiakirin, hat ragihandin, hat şîrovekirin, hat gotin, hat rêzkirin, daxûyanî hat dayîn, hat bibîrxistin, hat bikaranîn, hat eşkerekirin, hat ragihandin, hat pêşniyarkirin, hat derbirîn, hat rexnekirin, tê rexnekirin, tê gotin, tê diyarkirin û hwd.

### 4.2. DI NÛÇEYAN DE BIKARANÎNA HEJMAR, DÎROK Û SAETAN

Di nûçeyan de heta ku ji destê me bê divê em bi reqeman dest bi hevokan nekin. Lê di naveroka hevokan de reqêmen mîna dîrok, saet û hejmaran her tim tê bikaranîn. divê ev mesele jî bê standardîzekirin.

Di nûçeyan de hejmarên hezar û ên ji hezarî zêdetir divê bi herfan bên nivîsandin.

Mînak;

Li Rihayê 20 hezar û 320 ton pembo firotin.

Di nivîsandina dîrokan de jî divê roj, meh û sal bên diyarkirin.

Mînak;

Bûyer di 12ê Adara 2016an de qevimî.

Di nivîsandina saetan de standardîzyonek tune ye û divê ev jî bêçareserkirin. Îro di metnên nûçe an ên din de bi çend şiklan saet tê nivîsandin.

1) Saet di… de

2) Di saet… de

3) Saet……..de

4) Saet (bêyî bazinedaçekê)

Ji van awayan awayê sêyem ku bêyî pêşdaçekê ye di zamanê axaftinê de heye. Di eslê xwe de bazinedaçeka wê (di…de) hebûye, lê di axaftinê de winda bûye.

Awayê çarem ku bêyî bazinedaçekê ye di zimanê axaftinê de heye. Dieslê xwe de bazindaçeka wê (di…de) hebûye, lê di axaftinê de winda bûye.

Awayê "saet di….de" yê awayekî sererast e. Lewra mirovbi şiklê"di saet çendan de" dipirse; ne ku "saet di çendan de" û bersiva wê jî divê ku bi awayekî wisa bihê nivîsîn ku bêjeya "saet"ê di navbera her du beşên bazinedaçekê de bimîne; ango "di saet….de" . Loma awayê standard ev awa ye.[89]

Mînak;

Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Barack Obama di saet 15.15an de hate Enqereyê.

## 4.3. DI NÛÇEYAN DE STANDARDÎZEKIRINA ZIMAN Û PEYVAN

Îro ne bi tenê di nûçeyan de di hemû cûreyên nivîsên Kurdî de kêşeyên standardîzasyonê hene. Ji ber ku nivîsandina bi zimanê Kurdî hatiye qedexekirin, pêşîya wî hatiye girtin ev pirsgirêk hê jî didome û nehatiye çareserkirin.

Ziman li gor rewşa komelê bi rêbazên cuda hatiye standardîzekirin. Bo nimûne, ji bo Erebîya standard rola zimanê Qur'anê zêde bûye. Ji bo zimanê Fransî yê standard devoka Parîsê bûye bingeh, ji ber ku Parîs navenda îdarî û sîyasî bû.[90]

Lê mixabin ne Amed, ne Hewlêr, ne Mihabad, ne jî Qamişlo ji bo zimanê Kurdî bûn modêlek. Çar zaravayên Kurdî jî meseleyeke din e ji bo standardîzayonê û di ser de Kurdên îran û Kurdistana Iraqê jî bi tîpên Erebî dinivîsin.

Ji bo ku meseleya standardîzayonê baş bê fêmkirin em dikarin hin mînakan bidin.

Kergoşk (m, n), kerguh (m, n)/ kergo (m, n), kergoş (m, n), kergû (m, n), keroşk (m, n), kevroşk (m, n), kêrgoşk (m, n), kêrgû (m, n), kêrgûş (m, n), kêroşk(m, n),

[89] Mistefa Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, İstanbul: Weşanxaneya Rûpelê, 2012, r. 233.
[90] Mehmet Tayfur, "*Ji bo Standardîzasyona Kurdî Ferheng û Rastnivîsîn"*,(Gotara ku nehatiye weşandin), **Komxebata Pirsgirêkên Nûçegihaniya Kurdî û Pêşniyarên Çareseriyê**, Ankara. 29.05.2014.

kêrvoşk (m, n), kêvrîşk (m, n), kêvroşk (m, n), kêwrîşk (m, n), kêwroşk (m, n), kêwrûşk (m, n), kiroşk (m, n), kîrgo (m, n), kîroşk (m, n), kîvroşk (m, n), kwêrgî (m, n).[91]

Tekilî- Têkilî, Awahî- Avahî, Xristyan- Xristiyan, Lire- Lîre, Wasaît- Vesaît-Wesayît, Jehrê- Jehrî,Erîş- Êrîş, Stendin- Standin, Hefs- Heps, Trafîq- Trafîk- Hatûçûy-Hatinçûyin, Otobus- Otobês, Gihaşt- Gihîşt- Gihêşt, Xaz- Gaz, Dinihêrin- Dinêrin, Cigare-Cixare.

Di mînakên jorîn de jî diyare ku peyvek bi dehan telefûzan tê nivîsandin. Ji ber vê jî nivîskar û rojnamegerên Kurdan dê bi kîjan telefûz û varyantê binivîsin? Helbet her kes dikare li gor xwe bersivekê bide. Lê ev ne çareserî ye. Divê zanyarên zimanê Kurdî bên ba hev, li ser bingehên zimannasîyê bixebitin, qirarekê bidin û parve bikin da ku rojnameger û nivîskar jî binivîsin. Heke ev nebe tu tişt naçe serî.

Di daçekan de jî standardîzasyon girîng e. Di nûçe û nivîsan de him ‘di…..de’ û him ‘di…..da’ an jî ‘bi…...ve - bi…..va’, ‘bi…...re - bi……ra’ tên bikaranîn û divê ji bo standardîzayonê saziyên çapemeniyê û nivîskar li ser formatekê qirarê bidin.

Mînak;

**Li Nêzî Qeraxê Dîdimê Tekneya Penaberan Binav Bû: 18 Mirî**

Li Dîdima navçeya Aydinê tekneya ku penaber tê de bûn, binav bû û li gor agahiyên ewil 18 kes di behrê da xeniqîn. 15 kesên ku di teknê da bûn jî ji aliyê ekîba Fermandariya Ewlehiya Qerax va hatin xelaskirin.

Li Dîdima navçeya Aydinê tekneya ku penaber tê da bûn, binav bû û li gor agahiyên ewil 18 kes di behrê da xeniqîn, 15 kes hatin xelaskirin.

Li gor agahiya ku hat hildan, tekneya penaberan wê biçûya Yûnanistanê, lê li hinda Dîdim Mavîşehirê binav bû. Li ser ragihandina bûyerê 3 bot û firokeyeke Fermandariya Ewlehiya Qerax sewqî herêmê kirin.

Ekîba ewlehiya qeraxê ji penaberan 15 kes xelas kirin, cesedê 18 kesan jî ji avê derxistin.

Hat gotin ku ji bo kesên winda jî xebata lêgerîn û xelaskirinê dewam dike.[92]

---

[91] Tayfur, **g.n.b.,** r. 2.
[92] Anadolu Ajansı, Li nêzî Qeraxê Dîdimê tekna penaberan binav bû: 18 mirî, 6ê Adara 2016an,

Mînak;

**Li Dîdîmê Keştiya Penaberan Binav Bû: 25 Mirî**

Li Dîdîma navçeya Aydinê keştiya penaberan binav bû û li gor agahiyên ewil 25 kes mirin.

Li Dîdîma navçeya Aydinê keştiya ku penaberan dibir, binav bû. Di bûyerê de li gor agahiyên ewil 25 kes mirin, 15 kes jî sax hatin xilaskirin.

Li gor agahiya Fermandariya Ewlehiyê ya Qeraxê keştiya penaberan ya bi navê "Fermandar 2" li nêzîkî Mavîşehira Dîdîmê binav bû. Piştî îxbarê hêzên Fermandariya Ewlehiyê ya Qeraxê bi 3 botan û firokeyekî ve, hêzên girêdayî Fermandariya Hêzên Hewayê jî bi firokeyekî ve gihîştin herêmê.

Bi xebatan ve jê 2 kes jin, jê yek zarok, bi giştî 15 penaber sax hatin xilaskirin. Di nav de zarok û jin cesedê 25 kesan jî ji behrê hat xilaskirin.

Hat ragihandin ku hin penaber winda ne. Ji bo ku kesên winda bên dîtin xebat dewam dikin.

Li behra Egeyê herî dawîn di 8ê sibatê de qezayek çêbubû û 27 kes miribûn û 4 kes jî sax hatibûn xilaskirin.[93]

**Analîz:** Di her du mînakên jorîn de xuya ye ku di daçekan de standardek tune ye. Heman sazî di nûçeyekê de him daçeka 'di…..de'yê û him jî daçeka 'di….da'yê bikar tîne. Mînakên wiha yên li ser standardîzasyonê ne bi tenê pirsgirêka rojnameger û çapemeniyê ye. Nivîskarên ku bi Kurdî roman û çîrokan dinivîsîn jî di nav wan şertan de dixebitin û bi heman meseleyê re rûbirû ne. Ev mineqeşe divê bi qirarekê were bidawîkirin.

---

http://aa.com.tr/kk/tirkiye/li-n%C3%AAz%C3%AE-qerax%C3%AA-d%C3%AEdim%C3%AA-tekna-penaberan-binav-b%C3%BB-18-mir%C3%AE/532534, (Dema Gihanê: 07.03.2016).

[93] Anadolu Ajansı, Li Dîdîmê keştiya penaberan binav bû: 25 mirî,6ê Adara 2016an, http://aa.com.tr/kk/dinya/li-d%C3%AEd%C3%AEm%C3%AA-kestiya-penaberan-binav-b%C3%BB-25-mir%C3%AE/532657, (Dîroka xwendinê: 07.03.2016).

## 4.4. JI NÛÇEYAN HIN MÎNAK

**Pensîlvanya Neçû Serdana Seîdê Nûrsî**

WAN (AA)- Serokwezîr Recep Tayyip Erdoğan li Wanê axivî û wiha got: "Pensilvanya (Fethullah Gulen) ji ber ku Saîdê Nûrsî Kurd bû neçû ziyareta wî û a niha jî dixwaze pêvajoya çareseriyê asteng bike."

Namzedê Serokomariyê û Serokwezîr Recep Tayyip Erdoğan di mitînga xwe ya hilbijartina Serokomariyê ya li Wanê de axivî. Mitîng li Kolana Nexweşxaneyê hat lidarxistin.

Serokwezîr Erdoğan welatî silav kir û wiha axivî: "Ez li Wana bajarê alim û ewliyayan Seyîd Ebdirehman Arwasî, Seyîd Fehîmî, Feqiyê Teyran bi hurmetî silav dikim. Ji Bedîûzemanê ku di medreseyên Wanê de perwerde bûye re carke din dibêjim rihma Xwedê lê be. Rehme Xwedê li hemû şehîdên Wanê, bi teybetî jî şehîdên erdheja 23yê cotmeha 2011an be. Xwedê ji hemûyên wan razî be. Ji bo biratiya we, ji bo hevaltiya we, ji bo bibextiya we Xwedê ji we hemûyan razî be. Ji we gişka re spas dikim."

Erdoğan bal kişand ku Îsraîlê di Remezan û eydiyê de êrîşî Xezeyê kir û bombe barand ser zar, jin, sivîl, xwendegeh, nexweşxane û mizgeftan û wiha got:

"Di 25 rojan de ji hezar û 300î zêdetir birayên me yên ji Xezeyê hatin kuştin. 250yê wan zarok, 100ê wan jin, ji 50yî zêdetirê wan jî kal û pîr bûn. Zarokên Xezeyê eydî nedîtin. Zarên Xezeyê di eydiyê de nikaribûn ku derkevin kuçe û kolanan, nikaribûn ku herin li parka bilîzin, di malên xwe de, di kuçeyên xwe de, di peravan de hatin kuştin. Revîn mizgeft û xwendegehan û li wir jî hatin kuştin. Ji bo Xwedê, ji min re bêjin di navbera ew tiştên Hîtler anî serê wan û tiştên ku Îsraîl tîne serê Xezeyê de çi ferq heye? Ev nijadperestî ye, faşîstî ye, rihê Hîtler e."

Erdoğan li ser tevgera Fethullah Gulen a ku jê re dibêje 'pensilvanya' ji sekinî û wiha got: "Pensîlvanyaya (Fethullah Gulen) ji ber ku Seîdê Nûrsî Kurd e neçû serdana wî û ew kes ji bo ku pêvajoya çareseriyê sabote bike zehf xebitî. Em jî tiştê ku heq kirine li gor hiqûqê didin çeteya wî ya ku li vir e."

Serokwezîr got ku hin kes ji min dipirsin "Gava ku tu bibî Serokomar têkoşîna li dijî Pensîlvanyayê dê çibe?" û wiha bersiv da: "Heta ku ev cana di vî bedena min de be, ev têkoşîn hatanî dawiyê dê dewam bike."

Erdoğan derbarê pêwajoya çareseriyê de jî axivî û wiha pê de çû: " Heke kî, li ku, bi çi awayî ewlehiya me ya neteweyî tehdît bike ew ê li hemberî xwe me bibîne. Tengasiyên ku li pêşiya pêvajoya çareseriyê jî tên rakirin. Serastkirina qanûnî jî hat amadekirin. Qanûna ku me di demên dawiyê derxist bingeha pêvajoyê hê jî xurt dike. Heke hûn piştevaniyê bidin û ji bo Serokomariyê me hilbijêrên Înşallah pêvajo hê jî xurt bibe û bi lez dewam bike."

Erdoğan ji bo rûdan û guherînên li Tirkiyeyê çêdibin jî çend mînak dan û wiha got:

"Bi dehan salan pirtûk dihatin qedexekirin, kilam û sitran dihatin qedexekirin. Bi zimanê dayîkî axaftin qedexebû. Mirovan nikaribû bigota 'Kurd', 'Kurdî', ev qedexebûn. Di girtîgehan de dayîkan nikaribûn bi zarên xwe re bi Kurdî xeberdana. Lê niha çi bû? Televîzyona dewletê 24 saetan weşana Kurdî dike. Di televîzyon û rayoyan de di ziman û zarvayên din de weşan êdî serbest e. Di zanîngehan de beşên Kurdî hatin vekirin. Di xwendegehên taybet de bi du zimanî perwerde mimkûn e. Me dest pê kir navê gund û bajaran bi navê wan ên berê re diguherînin. Bi destê saziyên dewletê çavkaniyên bi Kurdî diweşînin. Wezareta Çand û Tûrîzmê kitêba Ehmedê Xanî weşand. Me ji we re gotibû ku kitêba Feqiyê Teyran jî dihat amadekirin, ew jî hat çapkirin."

Erdoğan diyar kir ku meala Qurana Kerîm a Kurdî jî hat çapkirin û wiha got: "12 salan berê bigotina dê ew pitûkana bi destê dewletê bên çapkirin kê bawer dikir? Em hemû gavên ku biratiya me xurt dikin diavêjin. Em ê vê şûnde jî van gavan bavêjin."[94]

**Li Yuksekovayê Mirina Biguman**

Li Gevera navçeya Colemêrgê cesedê mêrekî hat dîtin.

HAKKARİ (AA)- Li gor agahiyan, di kîlometreya 20emîn ya rêbeja Gever-Esendereyê de gundiyan li kêleka rê cesedê mêrekî dît. Gundiyan bersiv dan

[94] Anadolu Ajansı, Pelsîlvanya neçû serdana Seîdê Nûrsî,31ê Tîrmeha 2014an, http://aa.com.tr/kk/tirkiye/pels%C3%AElvanya-nec%C3%BB-serdana-sa%C3%AEd%C3%AA-n%C3%BBrs%C3%AE/135451, (Dema Gihanê: 26.02.2016).

cendirmeyan û cendirme hatin cihê bûyerê lêkolîn kir. Piştî lêkolînê term bi ambulansê şandin morga Nexweşxaneya Dewletê ya Geverê.

Li gor lêkolînan eşkere bû ku kesê mirî ji Îranê ye.

Term ji bo otopsiyê rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Geverê.

Der heqê bûyerê de lêpirsîn dewam dikin.[95]

**Qijika Reş Derket Pêşberî Temaşevanan**

Stenbol (Rûdaw) - Fîlma bi navê Qijika Reş ku ji aliyê derhênerê Kurd Tayfûr Aydin ve hatiye kişandin, li Stenbolê bi merasîmekê derket pêşberî temaşevanan. Di fîlma Aydin de çîroka aktrîsteke Îranî ku vegera wê ya welatê xwe qedexe ye tê vegotin.

Duyemîn fîlma dirêj a derhênerê ji Bakurê Kurdistanê yê bi navê Tayfûr Aydin, kete vîzyonê. Fîlma ku li Fransa, Tirkiye û Kurdistanê hatiye kişandin, bi beşdariya ekîba fîlmê û bi merasîmekê dest bi nîşandana xwe ya li Tirkiye kir.

Fîlm, vegera aktrîsteke Îranî ya di ser sînor û çiyayên Kurdistanê re vediguhêze perdeya spî.

Derhêner Tayfûr Aydin ji Rûdawê re wiha got: “Min xwest ku ez wê yekê bînim ziman ku çand û qedera welat û welatiyên Rojhilata Navîn çiqasî nêzikî hev in. Di fîlmê de rê her derdikeve ber sînoran. Di rêwitiya aktîrstê de jî zehmetî û giraniya li wan sînoran tê vegotin û aktrîsta me bi çîroka xwe re rûbirû dimîne û li xwe vedigere.”

Sara Azdî, ango qerektera sereke ya fîlmê, ji ber ku di roleke rût de lîstî ye, vegera wê ji aliyê Îranê ve hatiye qedexekirin. Piştî ku ew nameyekê ji bavê xwe werdigire, yekser dikeve rê û tê Bakurê Kurdistanê. Li vir bi qaçaxçiyan re dikeve nava sînoran û di rêyeke bi talûke re xwe digîhîne gundê xwe. Lê êdî tu tiştek weke berê nemaye.

Lîstikvan Mehmet Ûnal jî got: “Welleh zehmetiyên fîlmê pir bûn. Tu dizanî tev çiya û banîbûn. Hinekî jî çîrok jî li cihên çiya û bi zehmet derbas dibû. Westiyan pir bû. Berf, baran, serma û zehmetî bû. Tiştekî din tunebû.”

Lîstikvan Azîz Çapkûrt jî wiha axivî: “Cara 4an, 5emîn e ez di fîlmên Kurdî de dilîzim. Ji ber ku em wê jiyanê baş dizanin rola Yilmaz bo min hêsan bû. Weke

[95] Anadolu Ajansı, Li Yuksekovayê mirina biguman, 1ê Çileya 2014an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Arsiv, (Dema Gihanê: 01.01.2014).

aktorekî, tiştê baş ew bû ku ne hewce bû ez pir li ser lêkolîn bikim û bixebitim ji ber ku ez ji serhedê me û jiyana çiyan baş dizanim. Bo wê xebat limin hêsan hat.”

Fîlma ku temaşevanên xwe di nava xwezaya bê hempa ya Kurdistanê de derdixe geştê, beriya ku derkeve vîzyonê, li gelek festîvalên mezin jî hatibû nîşandan. Di fîlmê de Şebnem Hassanisoughi rola sereke dilîze û fîlm 90 xulek e. Qijika Reş bi Tirkî, Kurdî, Îngilizî û Farisî hatiye kişandin û hinekî jî serencema kolbendên Kurdistanê vedibêje.[96]

**Tîma Mezin a Awrupayê Ketiye Pey Zarokê Şingalî**

HEWLÊR (RÛDAW) – Tîma Almanyayê Borussia Dortmund dixwaze nûciwanê Kurd ê 11 salî Rêber Bapîr, veguheze nav refên xwe.

Ji ber pêşkeşkirina asteke bilind di du werzên derbasbûyî de, berpirsên tîma Borussia Dortmundê dixwazin nûciwanê Kurd ê 11 salî Rêber Bapîr ku di tîma Arminia Bielefeld de dilîze, transfer bikin.

Çavkaniyeke nêzîkjî malbata Rêber Bapîr ji Rûdawê re ragihand; “Rêber di nav tîma Arminia Bielefekdê de serkeftî bû. Ji ber vê yekê jî Dortmund gelek caran daxwaza transferkirina wî kirine. Dixwazin di mehên pêş me de li gel tîma wî girêbestekî îmze bikin.”

Malbata Rêber Bapîr ji nevçeya Şingalê ya Başûrê Kurdistanê ne. Rêber bixwe hemwelatiyê Almanyayê ye û tê pêşbînîkirin, ku di dema kupaya nûciwanên euro de dirêsa tîma nîştîmanî ya Almanyayê ber bike.[97]

[96] Rûdaw, Qijika Reş derket pêşberî temaşevanan**,** 27ê Kanûna 2016an, http://rudaw.net/kurmanci/culture/271220161, (Dema Gihanê:29.12.2016).
[97] Rûdaw, Tîma Mezin aAwrupayê ketiye pey zarokê Şingalî,http://rudaw.net/kurmanci/sports/27122016, 27ê Kanûna 2016an, (Dema Gihanê: 29.12.2016).

## ENCAM Û PÊŞNIYARÎ

Her çiqas rojnamegeriya Kurdî di sala 1898an de bi rojnameya Kurdistanê ve li Qahîreyê dest pê kiribe jî li gor rojnamegeriya dinyayê û miletên cîran kar û xebatên rojnamegeriyê bi derengiyê ketine û paşve mane.

Sedemên derengîketina rojnamegeriya Kurdî gelek in û em dikarin bibêjin pêşketina çapemeniya Kurdan li gor rûdanên aborî, civakî û siyaseta li ser Kurdan ji xwe re rotayek xêz kiriye. Rojnamegeriya Kurdî li gor siyaseta ku li ser wan hatiye meşandin an pêşve çûye an jî paşve maye.

Di heyama dawîn de bi taybetî geşadanên aboriyê û pêşveçûna tenkolojiyê rasterast tesîr li ser dezgehên çapmeniyê kiriye. Ji bo vê jî pêşketina dezgehên nûçegihaniyê girêdayî aborî û şirketên mezin maye. Ji bilî wan di zanîngehan de jî ji bo gihiştîna rojnamegeran fakûlteyên ragihandinê hatine damezrandin da ku nûçegihan perverde bibin û di sektora medyayê de cih bigrin. Di çerçoveya dezgehên taybet de ku bi şirketên medyayê yên giran ve girêdayîne, saziyên çapemeniyê yên Kurdî kêm in û li Tirkiyeyêji bo perwerdehiya nûçegihanên Kurdî dezgehên wek fakûlteyên ragihandinê tune ne. Îro bi tenê li Herêma Kurdistana Iraqê zanîngeha ragihandin û rojnamegeriyê heye. Mixabin ew sedemên neyînî tesîrê li ser rojnameger û rojnamegeriya Kurdan dikin.

Ji aliyê teknîka rê û rêbaza nivîsandina nûçeyan ve jî gelek pirsgirêk hene. Heta niha teknîka nivîsandina nûçeyan di çapemeniyên Kurdan de rûneniştiye. Nûçêyên ku tên weşandin jî piranî werger in û werger jî li gor rê û rêbazên rojnamegeriyê nayên kirin. Hejmara rojnameyên Kurdên ku li sehayê dixebitin kêm in. Kesên ku dixebitin jî derfetê nabînin ku kêmasiyên xwe temam bikin û pêşve herin.

Nûçeyên ku tên weşandin divê li gor teknîk, rê û rêbazên rojnamegeriyê bin. Ji aliyê naverok, ziman û nûçedanînê ve dest û çavên edîtoryalî lazim in û ew jî perwerdehî û tecrûbeyeke zêde dixwaze. Rojnameyên Kurdî di nav xwe de hêj biryar nedane ku dê bi kîjan demê nûçeyan binivîsin. Ji ber wê jî hin rojname ‘dema boriya têdeyî’ û hin rojname jî ‘dema boriya çîrokî’ bikar tînin.

Standardîzasyona ziman û nûçeyan jî pirsgirêkeke mezin e û divê bê halkirin. Têgehên tendurustî, ragihandin, zanist, tip, vejen, edebiyat û aboriyê jî hê bi temamî

nehatine çareserkirin û kesên ku li ser têgehan xebitî ne jî li ser formetekê li hev nekirine.[**]

Di nûçegihaniya Kurdî de divê zimanekî sade û tê fehmkirin were bikaranîn. Bikaranîna zimanekî sade û hevokên kin, fehmkirina nûçeyê hêsan dike. Ji bo vê divê zimanekî giran û akdemîk neyê bikaranîn, lewra ev fehmkirina nûçeyê dixe zehmetiyê. Di nûçe û nivîsan de divê hilbijartina peyvan û bikaranîna dîrok û saetan di cih de bin.

Divê têgehên ragihandinê baştir bên fehmkirin û paşê dest bi nivîsandina nûçeyan bê kirin. Nûçegihan divê mijara ku li ser dixibite baş bizanibe û ji pisporan alîkariyê bixwaze ku şaşitî çênebe. Ji bo vê jî lazim e ku nuçegihan baldar û jêhatî be.

Ji aliyê din di bikaranîna dem û yekbilêvkirina peyvan de jî gelek pirsgirêk hene. Em gava ku nûçeyên Kurdî analîz dikin dibînin ku dema boriya çîrokî hatiye bikaranîn. Lê divê di nûçeyan de dema boriya têdeyî bê bikaranîn. Di bekraundê de mîrov dikare bi dema boriya çîrokî nûçeyan binivîsîne.

Di nûçeyên Kurdî de hin kelîme bi dehan telefûzan tên nivîsandin. Her sazî li gor xwe biryarekê dide û bi vî şiklî hereket dike. Ev rewş ji bo standardîzyona zimanê Kurdî û nûçeyan dibe sedema aloziyê û lazime ku li ser formetekê biryarê bidin. Divê zanyarên zimanê Kurdî bên ba hev, li ser bingehên zimannasîyê bixebitin, qirarekê bidin û parve bikin da ku rojnameger û nivîskar jî li gor wan biryara binivîsin.

Ji bo ku nûçegihaniya Kurdî pêşve biçe divê sektora taybet yanê şirketên ji aliyê aboriyê ve xurtin jî berpirsyariyê bigrin ser xwe û dewlet jî piştgiriyê bide wan. Ji bo çareserkirina wan kêmasiyan lazim e di bin banê zanîngehan de fakulteyên ragihandinê yên bi Kurdî bên vekirin.

---

[**] Ji bo çareserkirina pirsgirêkên nûçegahiniya Kurdan divê konferans, semîner û xebatên din bên kirin. Heta niha li ser pirsgirêkên nûçegihaniyê bi hevkariya zanîngehan û dezgeheke medyayê bi tenê carekê komxebatek hatiye lidarxistin. "Komxebata Pirsgirêkên Nûçegihaniya Kurdî û Pêşniyazên Çareseriyê” ku di 29ê gulanê de bi mazûvaniya Anadolu Agencyê (AA) û tevkariya Zanîngeha Alparslanê ya Mûşê û Zanîngeha Artukluyê ya Mêrdînê hatiye kirin.

## ÇAVKANÎ


Acar, Hayrullah, **Di Serdama Komara Tirkiyê de Rewşa Kovarên Kurdî**, Senendec:Înt. Danişgahê Kurdistan, 2010.

Aktaş, Murat û Mehmet Yonat, **Dîroka Çapemeniya Kurdî Dema Osmaniyan,** İstanbul:Berdan Matbaacılık, (Dîroka çapê nediyar e).

Anadolu Ajansı Genel Müdürlüğü, **Haberciliğin El Kitabı Yeni Nesil Gazetciliğin Temel İlkeleri**, Ankara:Anadolu Ajansı, 2014.

Anadolu Ajansı, 9ê Sibata 2016an, **Daxuyaniya Wezareta Karên Derve ya DYAyê,** https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Yayin, (Dema Gihanê: 09.02.2016).

Anadolu Ajansı, **Civîna Koma TBMMyê ya HDPyê,** 23yê Sibata 2016an,https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Yayin, (Dema Gihanê: 23.02.2016).

Anadolu Ajansı, **DAIŞê 5 hezar û 800 jinên Êzdiyan dîl girtin**, 24ê Sibata 2016an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Yayin, (Dema Gihanê:24.02.2016).

Anadolu Ajansı, **Di mijara YPGê de fikra me û Tirkiyeyê wek hev nîne**, 11yê Sibata 1916an, http://aa.com.tr/kk/tirkiye/di-mijara-ypg%C3%AA-de-fikra-me-%C3%BB-tirkiyey%C3%AA-wek-hev-n%C3%AEne/519433, (Dema xwendinê: 11.02.2016).

Anadolu Ajansı, **Divê di zanîngehan de fakulteyên ragihandinê yên bi Kurdî bên vekirin**, 7ê Xezîrana 2014an, http://aa.com.tr/kk/tirkiye/div%C3%AA-di-zan%C3%AEngehan-de-fakultey%C3%AAn-ragihandin%C3%AA-y%C3%AAn-bi-Kurd%C3%AE-b%C3%AAn-vekirin/153116, (Dema Gihanê: 09.03.2016).

Anadolu Ajansı, **Diyarbekir dê bikeve nav lîsteya mîrateya cîhanê ya UNESCOyê**, 11yê Sibata 2016an,https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Arsiv, (Dema Gihanê:11.02.2016).

Anadolu Ajansı, **Ji bo çareserkirina krîza li Herêma Kurdistanê pêşniyazeke nû**, 26ê Sibata 2016an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Arsiv (Dema Gihanê:26.02.2016).

Anadolu Ajansı, **Ji bo çareserkirina krîza li Herêma Kurdistanê pêşniyazeke nû**, 22yê Sibata 2016an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/ Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Arsiv, (Dema Gihanê: 22.02.2016).

Anadolu Ajansı, **Li Agiriyê berf bû sedema qezayan**, 9ê Qanûna 2015an, http://aa.com.tr/kk/jiyan/li-agiriy%C3%AA-berf-b%C3%BB-sedema-qezayan/ 470745, (Dema Gihanê:11.02.2016).

Anadolu Ajansı, **Li Almanyayê qeza: 8 mirî**, 9ê Sibata 2016an, http://aa.com.tr /kk/dinya/almanyay%C3%AA-qeza-8-mir%C3%AE/518551, (Dema Gihanê: 11.02.2016).

Anadolu Ajansı, **Li Amerîkayê bager: 19 mirî**, 24ê Çileya 2016an, http://aa.com.tr /kk/dinya/li-amer%C3%AEkay%C3%AA-bager-19-mir%C3%AE/509727, (Dema Gihanê:11.02.2016).

Anadolu Ajansı, **Li Dîdîmê keştiya penaberan binav bû: 25 mirî,** 6ê Adara 2016an, http://aa.com.tr/kk/dinya/li-d%C3%AEd%C3%AEm%C3%AA-kestiya-penaberan-binav-b%C3%BB-25-mir%C3%AE/532657, (Dîroka gihandinê: 07.03.2016).

Anadolu Ajansı, **Li Herêma Kurdistana Iraqê xebatên avakirina hikûmetê,** 24ê Çileya 2014an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/ Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Arsiv, (Dema Gihanê: 24.01.2014).

Anadolu Ajansı, **Li Nêzî qeraxê Dîdimê tekna penaberan binav bû: 18 mirî**, 6ê Adara 2016an, http://aa.com.tr/kk/tirkiye/li-n%C3%AAz%C3%AE-qerax%C3%AA-d%C3%AEdim%C3%AA-tekna-penaberan-binav-b%C3%BB-18-mir%C3%AE/ 532534, (Dema Gihanê: 07.03.2016)

Anadolu Ajansı, **Li Sêrtê ji bo jina ku roda çûbû bê dîtin xebat dewam dikin**, 16yê Xezîrana 2015an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/ Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Arsiv, (Dema Gihanê:16.06.2015).

Anadolu Ajansı, **Li Yuksekovayê mirina biguman**, 1ê Çileya 2014an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/Yayin/YayinMenu.aspx?t=Arsiv, (Dema Gihanê: 01.01.2014)

Anadolu Ajansı, **Parlamenter Bîlgen bi karkerên înşaatê re fitar vekir,** 26ê Sibata 2016an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/ Muhabir/ Yayin/YayinMenu.aspx?t=Arsiv (Dema Gihanê:26.02.2016).

Anadolu Ajansı, **Pelsîlvanya neçû serdana Seîdê Nûrsî,** 31ê Tîrmeha 2014an, http://aa.com.tr/kk/tirkiye/pels%C3%AElvanya-nec%C3%BB-serdana-sa%C3%AEd%C3%AA-n%C3%BBrs%C3%AE/135451, (Dema Gihanê 26.02.2016)

Anadolu Ajansı, **Xwestin serdestiyê ji destê gel bigrin û bidin dadgehê**, 4ê Çileya 2014an, https://muhabir.aa.com.tr/Muhabir/Muhabir.aspx?refreshurl=/Muhabir/ Yayin/YayinMenu.aspx?t=Arsiv, (Dema Gihanê: 04.01.2014).

Aslanoğlu, Osman, Ferhenga Çapemeniya Kurdî, İstanbul:Nûbihar Yayınları, 2009.

Aydogan, Mistefa, **Rêbera Rastnivîsînê**, İstanbul:Emre Yayıncılık, 2006.

Azadiya Welat, **Nexweşiya Çolyakê ji çi çêdibe?**, 9ê Sibata 2016an, http://www.azadiyawelat.info/?p=37374, (Dema Gihanê: 11.02.2016).

BasNews, **Baxê Babêmin li dû festîvalên cîhanî de tê pêşkêş kirin,** 11yê Sibata 2016an, http://www.basnews.com/index.php/kr/culture-arts/258311, (Dema Gihanê: 11.02.2016).

BasNews, **Îstîxbarata Îranê gefan li Barzanî dixwe**, 18yê Tîrmeha 2015an, http://www.basnews.com/kr/news/2015/07/18/istixbarata-irane-gefan-li-barzani-dixwe/, (Dema Gihanê: 18.07.2015)

Basnûçe, **Şerê nav YNKê geş dibe**, 28ê Çileya 2016an, file:///C:/Users/abalta/Downloads/BasNu%C3%A7e%2087%20(1).pdf, (Dema Gihanê: (15.02.2013).

Bozarslan, M. Emin, **Kurdistan: Rojnameya Kurdî ya Pêşîn 1898-1902**, Uppsala:Deng, 1991.

Bozdağ, İsmet, **Basın Kurt mu? Kuzu mu?,** İstanbul:Emre Yayınları, 2006.

Çağlayan, E. (2014). "Ji Osmaniyan Heta Roja Me Çapemeniya Kurdî". *Komxebata Pirsgirêkên Nûçegihaniya Kurdî û Pêşniyarên Çareseriyê.* Ankara: 29.05.2014.

Dağtaş, Erdal, **Türkiye'de Magazin Basını,** Ankara:Ütopya Yayınevi, 2006.

Dekak, Maşallah, **Nûçe û Nûçevanî 3Ç 3K**, Ankara:Form Ofset Matbaacılık, 2010.

Dilgeş, Felat, **Rojnamegeriya Kurdî ya Pêşîn**, İstanbul:Enstituya Kurdî, 1998.

Farqînî, Zana, **Ferhenga Mezin a Tirkî-Kurdî,** Stenbol:Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, 2000.

Girgin, Atilla û Seçil Özay, **Haber Yazmak**, İstanbul:Der Yayınları, 2003

Gönenç, Özgür, **Medya Dünyası,** İstanbul:Truva Yayınları, 2010.

Hawarnet, **Cilên Kurdî Êdî Dê Bi Govendê Bijîn**, 14yê Tîrmeha 2015an, http://candname.hawarnet.org/2015/09/cilen-Kurdi-edi-de-bi-govende-bijin.html, (Dîroka gihandinê:19.02.2016).

Kaya, Fethullah, **Kürt Basını**, İstanbul:Hîvda, 2009.

Kurdistan 24, **Serokerkanê Pêşmergeyan hişyarî da tevgera Goran**, 26ê Tebaxa 2015an, http://www.Kurdistan24.net/ku/news/f02bf3ec-38d9-4068-abfb-60fed430eed2/Serokerkan%C3%AA-P%C3%AA%C5%9Fmergeyan-hi%C5%9Fyar%C3%AE-da-Tevgera-Goran, (Dema Gihanê: 26.02.2016).

Malmîsanij û Mahmûd Lewendî, **Li Kurdistana Bakur û li Tirkiyê Rojnamegeriya Kurdî [1908-1981],** Uppsala:Weşanên Jina Nû, 1989.

Milli Eğitim Bakanlığı, **Gazetecilik Radyo Televîzyon Tarihi,** Ankara: 2011.

Oğuz, Cemil, **Rojnamegerî û Pîvanên wê yên Sereke**, İstanbul:Weşanên Perî, 2002.

Pukmedia, **Tirkiyê Wezîrê Parastinê yê nû destnîşan Kir**, 3yê Tîrmeha 2015an, http://www.pukmedia.com/EN/KK_Direje.aspx?Jimare=30017, (Dema Gihanê: 26.02.2015).

Rudaw, **Barcelonayê 4 gol avêtin**, 9ê Sibata 2016an, http://rudaw.net/kurmanci/sports/09012016 (Dema Gihanê: 11.02.2016).

Rudaw, **DAIŞ wiha behsa aloziyên Başûrê Kurdistanê dike**, 11yê Cotmeha 2015an, http://rudaw.net/kurmanci/Kurdistan/111020151, (Dema Gihanê: 11/10.2015).

Rûdaw, **Derhanîna otombîlan ji bo Herêma Kurdistanê kêm bûye**, http://rudaw.net/kurmanci/business/04012017, (Dema Gihanê:06.01.2017).

Rudaw, **Dişa Talebanî: Ez ditirsim Wezareta Pêşmerge bikeve destê Tirkiyê!**, 15yê Qanûna 2015an, http://rudaw.net/kurmanci/Kurdistan/151220154, (Dema Gihanê:15.12.2015).

Rûdaw, **ENKS û YNK derbarê ROJAVA de civiyan**, 13yê Çileya 2016an, http://rudaw.net/kurmanci/Kurdistan/1301201612, (Dema Gihanê:11.02.2016).

Rûdaw, **Erebistan û Venezuela li ser nirxê petrolê biryar didin**, 7ê Sibata 2016an, http://rudaw.net/kurmanci/business/07022016, (Dema Gihanê: 11.02.2016).

Rudaw, **Kurdistanê zêdetirî 18 milyon bermîlên petrolê firot**, 12yê Çileya 2016an, http://rudaw.net/kurmanci/business/110120162 ( Dema Gihanê:11.02.2016).

Rûdaw, **Qijika Reş derket pêşberî temaşevanan,** 27ê Kanûna 2016an, http://rudaw.net/kurmanci/culture/271220161, (Dema Gihanê:29.12.2016).

Rûdaw, **Tîma me Tîma mezin a Ewropayê ketiye pey zarokê Şingalî,** http://rudaw.net/kurmanci/sports/27122016, 27ê Kanûna 2016an, (Dema Gihanê: 29.12.2016).

Spuptinnews, **Li Swisraye xwendekaren Kurd bi bawernameyên Kurdi dilxwes bûn**, 22yê Çileya 2016an, http://krd.sputniknews.com/cihan/20160122/1716967/Li-Swisraye-xwendekaren-Kurd-bi-bawernameyen-Kurdi-dilxwes-bin.htm, (Dema Gihanê:11.02.2016).

Tahan, Ş. (Nûçegihana Ajansa Anadoluyê ya beşa Frensî). 07.05.2015, Hevditîna li ser*"Di nûçeyên Frensî de bikaranîna deme",* Ankara.

Tayfur, M. (2014). "Ji bo Standardîzasyona Kurdî Ferheng û Rastnivîsîn". *Komxebata Pirsgirêkên Nûçegihaniya Kurdî û Pêşniyarên Çareseriyê*. Ankara: 29.05 2014.

Tokgöz, Oya, **Temel Gazetecilik**, Ankara:İmge Kitabevi, 2013

Topuz, Hıfzı, **II. Mahmut'tan Holdinglere Türk Basın Tarihi,** İstanbul:Remzi Kitabevi, Kasım 2012.

TRT NÛÇE, **Rewşa Kurdên Qazakistanê**, 18yê mijdara 2015an, http://www.trtnuce.com/haber/jiyan/rewsa-Kurden-qazakistane-25460.html, (Dema Gihanê:18.11.2015).

Wêje û Zimanê Kurdî **di şaristaniyên Mezopotamyayê de Kurd,** 14yê Mijdara 2014an, http://www.kurtdiliedebiyati.com/haber/198-di-saristaniyn-mezopotamyay-de-Kurd.html, (Dema Gihanê: 26.02.2016).

Yücel, Müslüm, **Tekzib-Kürt Basın Tarihi**, İstanbul:Aram, 1998.

Yüksel, C. (Nûçegihanê Ajansa Anadoluyê ya beşa Îngîlîzî). 06.05.2014, Hevditîna li ser "*Di nûçeyên Îngîlîzî de bikaranîna deme*", Ankara.

## KURTEJIYAN

Adem Balta di 27ê Tîrmeha 1977an de li Tuzlucaya (Qulp) navçeya Îdirê hat dinyayê. Dibistana seretayî, ya navîn û lîse li Qulpê xwend. Di sala 2000an de Zanîngeha Egeyê, Fakulteya Ragihandinê, şaxa Rojnamegeriyê qedand. Di sala 2002yan de dest bi rojnamegeriyê kir û karên xwê yên rojnamegeriyê li Anqerayê di Ajansa Anadoluyê de didomî ne. Di sala 2013an de li Zanîngeha Mûş Alparsanê, Enstîtûya Civakî, Şaxa Makezanista Ziman û Çana Kurdî dest bi Mastirê kir û niha di asta teznivîsînê de ye. Zewicî û du zarokê wî heye.

## ÖZGEÇMİŞ

Adem Balta 27 Temmuz 1977 yılında Iğdır'ın Tuzluca ilçesinde dünyaya geldi. İlk, orta ve lise öğrenimini Tuzluca'da tamamladı. 2000 yılında Ege Üniversitesi İletişim Fakültesi Gazetecilik Bölümü'nden mezun oldu. 2002 yılında gazeteciliğe başladı. Anadolu Ajansı'nda mesleğine devam etmektedir. 2013 yılında Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisansa başladı ve şu an tez yazım aşamasındadır. Evli ve iki çocuk babasıdır.